Zeynelabidîn Zinar

# SIYABEND û XECÊ


Institut kurde de Paris

destan

PENCÎNAR
WEŞANXANEYA ÇANDA KURDÎ

16

Institut kurde de Paris

Bo Enstituya Kurdî
ya Parîsê
Bi şadî û azadî...
15 05 93
Zeynel

Zeynelabidîn Zinar

k.l. (2516)

# Siyabend û Xecê

Institut kurde de Paris

*destan*

Pencînar
Weşanxaneya Çanda Kurdî
Stockholm 1992

Institut kurde de Paris

**Pencînar**
Kurdiska Kulturförlaget
Weşanxaneya Çanda Kurdî
Box 3088, 161 03 Bromma/ Stockholm - SWEDEN

© Zeynelabidîn
Siyabend û Xecê 1992, destan
Wêneyê Berga Pêşî: Kemal

**ISBN** 91 630 1222 7

# AGAHDARÎ

Serpêhatiya Siyabend û Xecê di folklora kurdî de cihekî taybetî girtiye. Ev serpêhatî wisa belav bûye ku îro Kurd hemû pê agahdar in. Lê mixabin heta niha dema jiyana Siyabend û serpêhatiya wî bi awakî sererast nehatine nivîsandin. Îcar min zaew serpêhatî li gor destdayînên xwe, bê ku tarîxa jiyana wî zanibim nivîsî. Her çiqasî min xwest ku ez vê pirtûkê weke roman binivîsim, lê hin biraderên zana gotin ku: "Di pirtûkê de destirana Siyabend û Xecê bi temamî cih girtiye, û ev bûyer destaneke folklorîya Kurdî ye..."

Siyabend jixwe diyar e ku ji Silîva (Farqîn) ye û Xecê jî ji Eşîra Şikakan e. Belam di nav xelkê de ji bo Siyabend çend navên din jî hene ku têne gotin: Wek *Silêmanê Silîvî, Siyamed, Siyah Ehmed, Mendo* û *Siyamend*.

Li gorî gotina kek Reşo Zîlan, navê wî yê rast Siyabend e. Îcar min jî di pirtûkê de her ew nav bi kar aniye.

Institut kurde de Paris

Ji bo bîranîna Şêx Evdilqudûs

Institut kurde de Paris

## - I -

Tiştek heye jê re dibêjin felek, ku lê tu reng û rû nînin. Ew tişt ne mêr e, ne jin e, ne keç e, ne jî bûk e û ne bi giyan e, ne bê giyan e, ne hişk e û ne jî terr e. Lê felek tim û daîm heye û her heye, wê hebe, li her deverê hazir e û dikare xwe têxe şûfê her tiştî. Felek tebayekî wisan bêteşe ye ku hertim dilipike, dinale, dikale, digazine û hin caran dikene, hin caran jî digrî. Çi kesên ku felek bi wan bikene, ew rezîl û riswa dibin; dîn û har dibin û bi dinyayê dikevin. Yekcaran jî felek xwe ji hin kesan re dike dost, dike yar û bira, bi wan re dibe heval û xwe li wan dihesikîne, wan ji xwe re dike doşek û balgîv, piştre jî wan serserkî li nîvê teqanê dixe û di erdê de diçikîne, îcar dest ji wan berdide. Nexwe divê ku mirov li dû felekê bigerre, warê wê binase û xwuyê wê jî rind bizanibe, da mirov karibe xwe jê biparêze. Ekene felata tu kesî ji destên felekê tune, timî dê mirov têkeve bend û zincîrên wê û tê de dîlbeste bibe.

Institut kurde de Paris

Felek niha li asîman e yan li keviya Deryaya Yemenê ye, kes nizane. Lê hinek dibêjin ku felekê dest bi dijminatiya feqîran kiriye û cihê xwe guhaztiye, koça xwe ji deştê bi rê xistiye çûye zozanê bilind û cîwar bûye. Dema ku ew çûye zozên, bo xwe avahiyeke ji bayê ya li ser qeşayê jî çêkiriye û ketiye binî, çavdêrî dike. Wê adek jî li canê xwe daye ku hertim dê kenê xwe bi kesên hêja, camêr, mêrxas û bavegîd bike. Û xwe bixwe gotiye ku, tu caran bi necamêr û pintiyan jî nakene, hergav dê ji wan re bibe alîkar, îşê wan serearst bike û fersendê bide wan.

Herê felekê, xayinê, malikmîratê, porsipîyê, pîreppintê, lihabê. Çewa ku tê zanîn ne bextê te heye, ne soz û peyman bi te re hene û ne jî mirov dikare bi te ewle bibe. Erê! mirov nakeve tu heyrê, lê mirov dikeve wê heyrê ku rojek hat û hin belengazên jirêketî bi te ewle bibin. Hingê kî dizane ku tu dê çi bi serê wan ve bînî? Îcar ewçax mirov gelekî rind û hêsan kare bibîne, ka ew belengaz dê ji kur rabin û herin di kur re derkevin! Di dawî de jî ka çi tê serê wan!

Erê rast e û hêja ye ku mirov hertim bibêje: Mala felekê bişewite, agirê kulê bikevê hemû bişewite bibe qirik, tiştek jê re nemîne. Zarûkên felekê birçî bimînin û li parsê bihesilin. Herwisa agir bi kadîna felekê jî bikeve ka û giyayê wê tev bişewitin, baqûriyên wê birçî bimînin û kes wan xwedî neke. Felek bi xwe jî biterpile herdu nigên wê bişikên û ji herdu çavan kor

bibe, da zarûkên wê bêxwedî bimînin û kes tune be wan xwedî jî bike. Û çi dema zarûkên wê ji xwe re li parsê jî bigerin, hêvî ew e ku kes tiştekî nede wan. Çewa ku felekê ew herdu zarûkên mîna du gilokên zêr bê xwedî û xwedan hiştin, bê bav û dê hiştin, di ser de jî nexweşîneke wisa xirab da birayê mezin, ku pûrta serê wî tev weşiya û çermê serî zelût bû.

Her kes rind dizane ku bela felekê pir zor e û tora wê jî hîn zehmettir e. Lewra çaxê ew li yekî tê xezebê, her tişt jê distîne û ji bin ve xirab dike tiştekî nahêle; malê wêran dike, avecî û wargeyên şên hemû dike kavilê kayê, piştre jî dike ku kundên kor bên li serê ttind bidin û ji xwe re wê derê bikin dibistana helbest û meselokan.

Piştî mirina dê û bavê Siyabend, felekê deva wan jî kuşt û nehişt ku herdu zarûk xêrek jê bibînin. Erê herdu bira piştî mirina deva xwe xêreke hindik jê dîtin û hestiyên herdu çîloqên wê ji xwe re kirin mîna ço û pê şerûdî dikirin. Lê belê felekê ji wan re aveciyeke ku ew tê de bihêwirin, nehiştibû.

Li gorî gotinan, Siyabend hêj di zikê diya xwe de bûye, diya wî bi jîrîtiya barê xwe hisiyaye û jê umîda mirovekî zana, peyakî mêrxasê binavudeng kiriye. Bêguman ew his û umîdên wisa pirê caran rast derdikevin û di jiyanê de xwe didin ramîdan. Lewra gotineke pêşiyan heye: "Çîçika çê, hêj di qalikê hêka xwe de kifş e." Siyabend jî hêj di zikê diya xwe de bûye, pehîn diavêtin, dest û zendên xwe liba dikirin û dix-

west ku zû, rojek berî rojekê derkeve der û were vê diyaya bi teşqele, devera kotekî û zordestiyan, da ku xwe bike keleha derd û belayê û Sîpanê Xelatê jî bi xwîna xwe ya sor bike kîlera dîroka kurdî.

Siyabend hêj zarûk bû, bala mamosteyê taxê ketibû ser wî û hertim ew dibir mala xwe, geh jî li dibistanê tîp nîşanê wî didan û ew fêrî xwendin û nivîsandinê dikir. Mamosteyê dilovan hertim jê re meselok, çîrok û serpêhatiyên kevnare jî digotin. Ji ber ku wî ji lêwik umîdeke mezin dikir, çaxê ku mezin bibe dê mirovekî çê jê derkeve û bibe xwediyê şan û şerefeke mezin.

Siyabend êdî bi firrê ketibû, her tiştî fam dikir, bîra qencî û xirabiyê dibir. Her çiqasî temenê wî di zarûktiyê de bû lê xeysetê wî, rêveçûna wî, tevgera wî mînabûn yên zilamên mezin. Ew hêj di piçûktiya xwe de kurekî jîr, tîjîfehm, bi tiroş û çeknas bû. Wî her roj zarûkên hevalên xwe dicivandin û ew fêrî leyztikê, şerkirinê û fêrî toreyên kevnare dikirin. Hergav ji wan re çîrok û meselok digotin. Di nava wan de wî xwe wek zilamên mezin ên navsere dihesiband. Ji ber ku ew pirê caran bi peyan re, bi mêrxasan re û bi egîd û fêrisan re digeriya, hin caran jî bi wan re diçû nêçîrê.

Li bajêr erdu lawik bê sermiyan mabûn û ji wan re xwedîkirina xelkê jî têr nedihat. Her çiqasî der û cîranên wan, rûniştevanên taxê xwedîtiyeke zêde li wan dikirin û bi şev û rojan guhdarê wan bûn; xwarin didane wan û kincên wan dişûştin jî, lê ji wan re

tenêtî bêxwedîtî pir zor dihat. Herdu bira timî xwe li nava zarûkan kêm didîtin. Erê xasma çaxê ku zarûkên cîranan diçûn xwe diavêtin hemêza dê û bavên xwe, herdu sêwî li wan dinerîn û piştre jî xwe direqifandin hevdu û stuyên xwe bi ser felekê ve xwar dikirin, çavên xwe li wan zer dikirin û xwe bi xwe digotin: Lê eger dê û bavê me nemirina, niha wan jî em didane ber hemêza xwe û bi me şa dibûn.

Her çendî feleka malikxerab gelekî li Siyabend û birayê wî Qeregêtiran kotekî û zordarî kir jî, lê piştre dîsanê hinekî ew şad kirin û xeberê zû gihande herdu apên wan, ew bi hewara wan ve anîn Silîvanê. Herdu apan her yekê sêwiyekî xwe girt û bir cem xwe. Apekî ji xwe re Qeregêtiran bir û bi aliyê çiyan ve çû, ew xiste nava deh zarûkên xwe xwedî kir. Apê din jî Siyaben bir û çû deştê, ew teslîmî jina xwe ya stewr kir, da wî xwedî bike.

Siyabend ji ber ku apê wî lê xwedî derketibû û jiyaneke nû bo wî dest pê dikirbû, pir bi kêf bû. Gundî tev ji wî hisdikirin. Ew li gund bûbû mîna lawê her kesî, pirî ku gundiyan jê hisdikir û lê guhdar bûn. Ji gundiya çi jin çi jî mêr hemûyan ew bi zaruyên xwe nediguhartin. Her sibe kebaniyên mala to datanîn ser pariyek nên û jê re dibirin mala apê wî. Kîjan zilamê ku diçû bajarekî, ji Siyabend re şekir û benîşt, kaxez û qelem dikirrîn û dihanîn didan wî. Lê ji ber wê yekê îcar zarûkên gund hemû ji Siyabend qehirîn, rik jê hildan û çavreşî avêtin wî.



Institut kurde de Paris

Siyabend ji aliyekî ve birayê xwe jî wenda kir, mîna bav û diya xwe. Lê ji aliyê din ve çaxê dihat bîrê ku birayê wî li cem apê wî ye, bihneke xweş berdida dilê wî hêsan dibû û bevzê wî mîna belgên gula xunavgirtî geş û şên dibû. Lê erê dema jinapa wî hin caran pê dijûn dikirin, yan lê dixist û ew bêşîv radizand, neşûştî dihişt, pir li birayê xwe difikirî û her wekî ku bira jî di rewşa wî de be derdmend dibû û gelek diêşiya.

Lê belê dema gundî li Siyabend varqilîn ku jinapa wî xwe jê re ne baş dike, wan hîn zêdetir xwe jê re baş kirin. Lê îcar çiqas ku gundî ji Siyabend re baştir dibûn, jinapa wî jî wisa jê re nebaştir dibû. Ew tewrê jinapê mejiyê Siyabend serobin dikir, vêca ew jî diçû li zarûkên xelkê dixist û pê hinekî bihna xwe berdida.

Siyabend xwe rind fêrî jiyana gundê deştê kiribû. Ew, bara rojê li nava zarûkan bû û bi xar û kap dileyizt û mezinatiya wan dikir. Ji ber ku hertim bi çavên mezinan li xwe dinerî û navê kesî yê rast jî hilnedida, ji wan re digot lawo, kuro, gede... Lê dema ew diçû nava zilaman, wek zilamên mezin yên ji xwe şermkirî dilibitî û bi wan re dipeyivî. Hîç navên kesî yê rast jî hilnedida digot apo, xalo, keko û bi wan re dam û nehberk dileyizt.

Li gund cihê leyztika zarûkan serê banan yan jî şûna bêderan bû. Siyabend di leyztikê de hertim xar û kapên zarûkan tev ji wan dibirin û dixistin kundirekî serşoyê. Lê hin caran çaxê ku zarûkan xar û kap jê di-

birin, wî ew çîloqa devê ji ber xwe dikişand û pê li wan dixist. Ha wisa her roj du-sê zarûk serşikestî, yan milşikestî diçûn malên xwe û bi ser dê û bavên xwe ve digiriyan. Îcar ji ber wê neseqirtiya Siyabend, gundî jê aciz dibûn û diyên zarûkan diçûn bi ap û jinapa wî re qirên dikirin û digazinîn, digotin:

- Çima we vî sêwiyê belakirr aniye gund, ku her roj li zarûkên me dixe, serî û milên wan dişikêne?

Erê her ku rojek dibihurî Siyabend ji mala apê xwe çavreş dibû û nedixwest ku li wir bimîne. Herweha ji ber bêhogirî û birçîbûnê çiqas diçû gurrîtiya wî zêde dikir û xwe ji serê wî berjê berdida, hinbihin pûrta laşê wî jî diweşiya. Demek bihurî wisa lê çê bû ku laşê wî tev rût-zelût bû û çermekî sor derket. Ha ji ber wê gurrîbûna Siyabend, navê wî yê rast hate jibîrkirin û xelkê navê wî danî Gurrî.

Siyabend pir gurrî bûbû, qirêj û gemarê hêj zêdetir ew bêmirêz kiribû. Lê belê pirî ku çavên wî bi hêbet bûn, bi wê gurrîtiyê jî mirov nikaribû rasterast lê binêre hewqasa mexof û bi tirs bû. Awirne wisa tîj lê hebûn ku mîna derba şeşagirê dilê mirov dihingavtin û bê hemd çav ji ser wî diguherîn.

Li wî gundî zilamekî kal hebû. Ne jin û zarûk, ne jî çu pismamine wî hebûn. Ew bi tena serê xwe dima û timî zarûkên gund dibirin mala xwe, xasma Siyabend û xwarin dida wan. Ji wan re meselok û serpêhatî digotin û ew fêrî xwendin û nivîsandinê dikir.

Institut kurde de Paris

Ew kal hem rîspiyê gund bû hem jî aqilmendê gundiyan bû. Herweha ew çîrokvan û dîroknasekî hêja bû jî. Her şev zilam li mala wî diciviyan heta derengiya şevê şewbêrka xwe dibihurandin û hêj radibûn diçûn malên xwe. Gundiyan pir qedr û siyanetê didan Kalê Pîr û guhdarî li pend û peyvên wî dikirin. Wî nedihişt ku dilmanî têkeve navbera du kesan û timî nexweşî û gelşên gundiyan çareser dikir, ew li hev dianîn, heqî û niheqiyan nava wan safî dikir.

Kalê Pîr her şev di civata xwe de ji gundiyan re çîrok, meselok û serpêhatiyên kevnare digotin. Bi piranî wî serpêhatiya Kawayê Hesinker, çîroka Gul û Sînem, şerên di navbera Rostemê Zal û Tûraniyan de, serpêhatiyên Gêyo û çîrokên perî û efrîtan digot. Lê tiştê ku pir li xweşa wî diçû û piraniya şevan jî dubare dikir, serpêhatiyeke Rostemê Zal bû:

*Navê Rostemê Zal li dinyayê belav bûbû û hemû qiral û keyayên dinyê xwe ji şerê bi wî re diparastin. Belam ewçax Turanî û Kurd cîranên hevdu bûne. Û Turanî hertim diçûn diziya Kurrdan, Rostem jî radibû li hespê xwe Rexşê Belek siwar dibû û dida ser pişta wan, ew dibirin heta ji nava aqarê xwe derdixistin der.*

*Hespê Rostemî pir çê bû. Hema nebêje hesp, bêje wek cinawirekî bû. Ew hesp çi dema derdiket derve, wisa fêr bûbû ku hema rast berê xwe dida bi aliyê Tûraniyan ve û diçû. Îcar rojekê hespê Rostem difilite û rast berê xwe dide welatê Tûraniyan û diçe. Rostem*

Institut kurde de Paris

*jî li dû diçe, diçe heta digîje welatê Tûraniyan. Ew şev Qiralê Tûraniyan Rostemî li cem xwe dike mêvan û jê re pir qedr û qîmetê nîşan dide. Îcar Qirêl xwe bi xwe difikire: Ez ê îşev dekekê li Rostemî bikim û keça xwe bişînim ser ciyê wî. Hema belkî jê bi zarû bibe û kurekî bîne. Ez ê torinê xwe mezin bikim, piştre jî wî berdim pêsîra Rostem. Belkî derbekê lê bixe û wî bikuje , me jê rizgar bike. Eger ne wisa be felata me ji destên Rostemî tune.*

*Ew şev dibe çaxê raketinê keça Qirêl diçe dikeve paşila Rostemî û jê avis dibe. Piştî neh mehan kurek jê re çêdibe. Hinbihin torinê Qiralê Tûraniyan mezin dibe û tê çaxê şer.*

*Rojekê Qiral û Rostem şer dikin. Lê Rosrem carekê dibîne ku wa palewanekî xort ket pêşberê wî, heta wê demê jî fêrisekî wisa di Tûraniyan de nedîtiye. Îcar Rostem dike nake keys lê nayine ku wî bikuje. Ew li wir difikire û raman dike, ka ev palewan kî ye û ji kur hatiye nava Tûraniyan? Carek tê bîra wî ku ew şevekê bi keça Qirêl re raketibû û hingê dinase ku ew palewan kurê wî bi xwe ye...*

Kalê Pîr piriya ku zilamekî çê, camêr, çavfireh û dilovan bû, her kesî jê re digot Kalo. Li gorî gotinan Kalo gelekî zana, bîrewer, dûrbîb, çeknas û esnaf bû; mejiyê wî mînabû xizneyekê û tu tişt ji berê nedifilitîn. Dema bûyerek diqewimî, wî pêre-pêre di serê xwe de bi cih dikir û bi stiranî ji xelkê re digot. Kalo hertim ji gundiyan re digot: Divê ku em van bûyeran

jibîr mekin û di hişê xwe de bihêlin, yan jî binivîsin û timî ji hevdu re bibêjin, da ku nifşên nûhatî bi dema me agahdar bibin, da zanibin em kîne û me çi kiriye. Ekene, wê zarûkên me ziman û torreyeke cuda bigrin. Ewçax hebûna me ya li dinyê hîç feyde nade û em dibin mîna dareke sêr ya bêber...

Ew zilamê kal timî li Siyabend çavdêr bû, her roj wî dibir mala xwe û derman dikir, dişûşt û kincên wî diguhartin. Bi wê yekê reng û ruyê Siyabend xweş dibû û hinbihin bi xwe ve dihat, gurrîtiya wî ber bi xweşiyê ve diçû. Siyabend çi bikira Kalê Pîr dinivîsî, piştre jî ew tişt dikirin sitiran û di civatan de digot. Herweha wî di derheqê Siyabend de li civat û şewbêrkên gundiyan timî digot:

- Gelî bira û biraxweyan! Divê ku em tev hay ji Siyabend hebin. Ev lawik çaxê mezin bibe dê peyakî çê, zilamekî bi navudeng û mêrxasekî bêhempa jê derkeve. Hingê ew dibe şerefa me hemuyan. Ne tenê dibe şerefa ap û amojina xwe yan ya Silîvaniyê, dibe ya Badikan, ya Mûsiyan, ya Reşkotiyn, Ya Remiyan, ya Pencînariyan, dibe ya Kurdan hemî...

Apê Siyabend li wî gundê deştê rêncberî dikir. Roja ku ew diçû cot, jina wî jê re taştê dibir. Îcar rojekê jinik ji ber pirbûna kar dereng ket û nikaribû taştiya mêrê xwe bibe, gazî Siyabend kir:

- Gurriyo, belqityo. Ha va min taştiya apê te hazir kiriye, rabe jê re bibe ba cot.

- De bila.

Institut kurde de Paris

Siyabend rahişt elbika şorbê û buxçikek nanê sêlê, çû ku taştiya apê xwe jê re bibe. Lê dema ew giha rasta bênderê, dît ku wa zarûk bi xar û kap dileyizin. Hema li wir elbika şorbê û buxçika nanê sêlê danîn erdê û şûnde vegeriya çû kundirê xwe yê xar û kapan anî û bi zarûkan re ket leyztikê. Êdî Siyabend xwe jibîr kir, di leyztikê de ma heta ku roj giha nîvê asîman.

Kalê Pîr çaxê dît ku Siyabend bi zarûkan re ketiye leyztika xar û kapê û ku çewa ji wan dibe, hema destê xwe xist kerrika guhê xwe û got:

*Hooo*
*Way demo*
*Way demo*
*Way demo*
*Way demo*
*Demo dewran bi dû tê*
*Hooo yoyoyo yoy.*
*Ay dilê min ê dilekî divêwooo*
*Li serê Gurrî kumê qîrê*
*Li nava Gurrî gerandiye tengek ji tenga dolabê*
*Gurrîbûna xelkê heta bi cênîkê*
*De a malmîratê Gûrrî yekheba xwe berdabûn nava pişt*
*derza qolincê*
*Li min, li min*
*Li min, li mêêên*
*Hooo yoyoyo yoy*
*Hêêê*



Institut kurde de Paris

*Dilê min dibê*
*Serê sibê*
*Amojina Gurrî rabû ji xewê*
*D igo:*
*Gurriyo...*
*çepelo...*
*heramo...*
*mirtalo...*
*Apê te ji nêza mir li çolêêê*
*Û dispartî Gurrî pêteka nanê sêlê, elba şorbê*
*Gava ku Gurrî berê xwe da cotê apê*
*Bala xwe dayê ku zarûk bi kapa dilîzin*
*Gurrî digo: "Teeew li min, li min, felekê wooo!*
*De mala min çû mîratê*
*Şîrê sêrojî di bêvila min re davêjê*
*Şeva çûnî kabekî min ji min çûbû*
*Heta li min xistî fecra sibê*
*Nigekî min li hindur bû, yek li hewşê*
*Min go: Kengê li min xê fecra sibê*
*W`ez ê kaba xwe vegêrim li darê dinyêêê."*
*Li wê navê danîbû elba şorbê*
*Bi ser dakirî pêteka nanê sêlê*
*Vegeriya malê*
*Kundirê kaba derxistî ji orta dîwêr û kewarêêê*
*De gava Gurrî bi zarûka re*
*Xwedê! tevda Gurrî biriye*
*Çilo davê kabê, pirî mîr û ker tê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Jinap çaxê bi Siyabend hisiya ku ew li bêderê bi

Institut kurde de Paris

zarûkan re xar û kap dileyize û taştiya apê xwe nebiriye, hema rahişt bistika êgir û çû ku lê bixe. Lê Siyabend çewa çav pê ket, kundirê xwe yê xar û kapan di cih de hişt û rahişt elbika şorbê û pêçeka nanên sêlê berê xwe da riya cotê apê xwe û lezand çû. Jinapa wî jî ew kundirê xar û kapên wî hilda û şûnde vegeriya çû malê.

Tu nabêjî ewçax Kalê Pîr li wan temaşe dikir û kezeba wî ji Siyabend re şewitî, xwe bi xwe got: Divê ku ez vê bûyerê birêsim. Piştre çû xwe da ser hîmekî bilind, destekî xwe da ber guhekî xwe û got:

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Gurrî carekê nerî*
*ku jinapa wî lê dabû darê ber sêlêêê*
*Wê çaxê kundirê kapa spartibû jinapa xwe*
*rahiştî pêteka nanê sêlê, elba şorbê*
*Berê xwe dida cotê apê*
*Dilooo*

Siyabend taştiya apê xwe bir û çû. Lê pirî ku ew birçî bû zikê wî diêşiya û qurequr dikir. Dema ew çû û ji gund nepenî bû, elbika şorbê danî erdê kete ser digel nanên sêlê xwar, xwar heta ew nan û şorbe hemû kuta kirin. Piştre jî rabû bi pehînan kete ser elbikê şikand, textikên wê li ser rê hiştin û hêj rabû çû ba cotê apê xwe.

Institut kurde de Paris

Çaxê Siyabend elbika şorbê hilda û ji ber jinapa xwe reviya çû ku here ba cotê apê xwe, Kalê Pîr bala xwe dayê ku ew ji nêzan nikare li rê here, çokên wî erd nagirin û hema virde wirde dişewişe. Ew jî rabû da pey Siyabend û çû. Lê dema Kalo dît ku wa Siyabend li newalekê ketiye ser taştiya apê xwe û zikê birçî daye ber şorbê, jê dûr sekinî û lê temaşe kir. Piştre çaxê dît ku şorbê tev xwar û elbikê jî şikand, bi kêfeke hêj zêdetir disa xwe bi xwe qêriya û got:

*De Gurrî newalek ketibû ber, bala xwe dayê*
*Ku ji Xwedê pê ve kes jê nexwiyayê*
*Li wê navê danîbû elba şorbê*
*Pêteka nanê sêlê bi carekê diçandê*
*Digo: Teeew! li min, li min felekê!*
*Mala min çû mîratê*
*Gava feleka malikderewîn ez kiribûm ber lepê ap û amojinê*
*Hisreta min bû ez têr bixwim nanê sêlê.*
*W`ez ê îro xelas kim vê elba şorbê.*
*Û bi qutikkevçiya hatibû şorbê*
*Ji ber xwe derxist çîplaqa devê*
*Yek jêrî lê xistibû li binê bêxwediya elbêêê*
*Û Gurrî nola bajariya destê xwe da pişt qûna xwe tena-tena berê xwe da cotê apê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yooo*

Institut kurde de Paris

Apê Siyabend ew roj li ber cotê xwe pir birçî bûbû û çavnêriya hanîna taştiya xwe dikir. Dema taştê bihurîbû hêj taştiya wî nehatibû û çaxê firavînê jî nêz bûbû. Lê carekê wî ji dûr ve dît ku wa Siyabend tê, xwe bi xwe got: Ev gurek li kur miriye, ku îro jinikê taştiya min daye Gurrî û şandiye? De tişt nabe, bila ez hevalê te bim Gurriyo, heta lepê min li te erqilî. . Eger min tu girtîî, jixwe ez bi te dizanim.

Siyabend çû giha nêzî cot. Wî ji murûzê apê xwe pê derxist ku jê re ne xêr e, ji dûr gazî kir:

- Apo, qewet be!

- Qewet xweş. Gurrî! Te xêr e ku wisa îro tu hatî vir?

- Wele amojina min got: Îşev min xewnekê dîtiye, ku min bi zikekî du kur dianîn. Îcar qurbanek li me dikeve. Got, ka em çi serjê bikin?

- Kuro, ka taştiya min?

- Haya min jê tune.

Apê cotarî rasterast riya xwe li girtina Siyabend nedidît. Îcar wî xwest ku bi finazekê wî bigre û lê bixe. Îcar xwe bi xwe fikirî ka bi çi dekê kare wî bigre. Hema destê xwe ji şûrik berda û xwe avêt erdê gevizand, rewşa nexweşînê da xwe, da Siyabend bê nêz û rabe wî bigre.

Siyabend carekê bala xwe dayê ku wa apê wî li erdê digevize, beziya çû li ser sekinî û destê xwe danî ser eniya wî. Hema apê wî yekê nekir didu û

Institut kurde de Paris

xwe çeng kirê ew girt û da ber misasan, ha Goliko soro te çi xwariye? lê xist. Lê Siyabend gelekî cansivik bû, zû xwe ji nava lepên wî filitand û reviya çû.

Wê hingê Kalê Pîr derketibû ser girekî bilind û ji dûr ve li wan temaşe dikir. Dema wî dît ku ap li Siyabend dixe, dilê wî dîsa êşiya, heyfa wî pê hat û destê xwe xist guhê xwe, wê bûyerê kir belgeyekî dîrokî û sparte folklorê, got:

*Hêêê*
*Gurrî di ser apê xwe re sekiniye, digo:*
*Mala min çûye mîratêêê!*
*Gava Gurrî ji apê xwe re dikir vê galgala hanê*
*Apê wî xwe zer kirê*
*Girtibû bi damara qirikêêê*
*Û 25 misas dawişandin Gurrî*
*Weke pêlewana*
*Ji 25 misasa nehişt yek bigihêêê*
*Û ji nav lepê apê xwe filitî*
*Jê dizî gayê sorê çavreş î berbedêlê*
*Berê xwe dabû malê*
*Digo: Bi qerara qesem navê Xwedêêê*
*Û ji îro pê ve heta ku a xerab hebê*
*Gurrî tu carê nema dike a çê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Siyabend reviya çû xwe ji ber çavên apê xwe wenda kir. Wî xwe li paş kevir û deviyan nitirand û li

apê xwe nerî, ka dê ew çi bike. Wî dît ku ji birçiyan weş li apê wî nemaye û hema bi herdu aliyan ve dişewişe û bi halet ve kaşêl dibe, xwe bi xwe got: Îro divê ku ez heyfa xwe jê hilînim.

Apê Siyabend pirî ku birçî bûbû, wisa lê hatibû êdî ruhnî di çavên wî de nemabû û hay ji xwe nebû, ka gîsnê wî mizeqif diçe yan mişefil dibe, ka xeta cot hûr diçe yan firk dibe...

Siyabend ttimê xwe li gayê berbedêlê xweş kir ku ji apê xwe bidize û bibe serjê bike.

Roja ku apê Siyabend diçû cot, sê ga bi xwe re dibirin. Didu timî di bin nîr de bûn û yek jî ji bo bedêlkirinê zêde li cem xwe dihişt. Îcar ji herdu gayên di binê nîr de kîjanê diwestiya, wî ew ga bedêl dikir û yê berbedêlê dixist şûna yê westiyayî. Lê pirî ji birçîna hem jî ji qehran ku Siyabend ji destên wî filitîbû, hay ji gayê xwe yê berbedêlê nema û bêbedêl.

Siyabend dît ku gayê berbedêlê ji cem apê wî dûr bû û ap hay jê nema, çû ew ga da pêşiya xwe ajot bir malê û gazî jinapa xwe kir:

- Ha amojinê. Apê min got: "Îro ez li ber cot qasekê raketim, min xewneke ne ya xêrê dîti. Îcar qurbanek li me dikeve." Got min: "Hêj ku ez sax im û nemirime niha gê bibe malê û gazî çend xortan bike bila bên alikariya te, serjê bikin. Û çaviyeke xanî jî hilweşînin, bi kêran û rewtên wî goştê gê bipijînin, heta êvarkî ez hatim malê, em ê gazî gundiyan bikin bila bên xêra me bixwin!"



Institut kurde de Paris

- Wî lawooo, li min kezîkurrê! Xwedê me bistirîne û deriyê tifaqan rade! Kurê min Gurrî lawo, nexwe tu hêj çi sekinî? De rabe here li nava gund bigere û gazî çend xortan bike, bila bên alî te û gayê sor serjê bikin!

Siyabend di dilê xwe de got: Ha wele îcar mîna ku wê deka min serê xwe bigire û ez ê îro têr goşt jî bixwim. Ka heta êvarê jî ku apê min ji cot hat, Xwedê mezin e! Siyabend rabû çû li nava gund geriya, çend xort berev kirin û ew anîn alî xwe, gayê cot avêtin erdê serjê kirin û gurandin. Hinek xort jî bêr û qazme girtin û çaviyeke xanî hilweşandin, kêran û martek û rewtên wî tev derxistin û xistin binê sîtilên goşt, agir pê xistin.

Belam heçika gundî ne zû bi zû gayên cot, çêlek, mih û bizinên şîr serjê nakin. Lê eger bela û siqûmateke pir giran bê serê wan û bi erzanî jê bifilitin, tiştekî giranbiha dikin gazî û kîjan heywana li ber dilê wan şêrîn be serjê dikin. Ew goşt yan li malan belav dikin yan jî li mala xwe dipijînin digel savarê yan birinc jî çêdikin û êvarkî gundiyan hemû vedixwînin malê û wê xwarinê didin wan. Îcar dema ku heywaneke wisa giranbiha tê serjêkirin, berî ku goşt belav bibe yan li mala xwedî bê pijandin, zilamên gund, bi piranî jin tev diçin wê malê û sersaxî lê didin. Herweha ew sedemê serjêkirina wê heywanê jî dipirsin.

De îcar piştî ku Siyabend gayê apê xwe yê cot da

Institut kurde de Paris

serjêkirin, gundî hemû pê hisiyân û tev çûn li ber derê mala apê wî kom bûn, sersaxî dan jinapa wî û serjêkirina gê ji bo dehfandina çi tor belayê pirsîn.

Ew roj li ber derê mala apê Siyabend bûbû mîna şahiya Newrozê, pirî ku gundî kom bûbûn û ji bo xwarina goşt kêf dikirin. Zarûkan çîrtik didan û ji kêfa goştê gayê sor re direqisîn. Pîrekan tilîlî didan û xilasbûna wan ji "wê bela mezin" pîroz dikirin. Kal û seqet jî ji kêfan re hema di ber xwe de dikeniyan û çavên xwe li sîtilên savar û goşt ziloq dikirin.

Kalê Pîr çaxê ew deka bi gerr û fen ji Siyabendê gurrî dît, dîsanê xwe bera nav şax û newalên dîrokê da û li demepêşa wî fikirî, piştre xwe bi xwe got: Elawekîl, heke ev lawik nekeve rêne xirab, wê di zanînê de şûna Efletûnê Yûnanî bigire û bi mêrantiya xwe jî cihê Rostemê Zal dagire. Çewa ku Tûranî ji destên Rostemî ketibûn emana Xwedê, dê wisa dijminên me jî ji destên vî bikevin qaqa reş û bêeman bimînin. Piştre Kalo rabû rûpelên dîrokê bi ser hevdu ve qelabtin û tê de cihekî vala dît, lê serpêhatiya gayê sor nexişand, piştre dev pê kir û dîsa weke hercar qêriya:

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Gava ku jinapa Gurrî dike vê gaalgala hanêêê*
*Gelkî kêfa Gurrî pê re têêê*
*Û bangî çend serseriyê nola xwe kir*

Institut kurde de Paris

*bi qirika gê girtibûn, danîbûn erdê*
*Lê dan zîlana kêrêêê*
*Û xaniyê piçûk xera kiribûn*
*kiribûn agir, xistin bin goştê gêêê.*
*Gurrî rahiştibû heskê*
*Ketibû ber goştê gê*
*Digo: Şabaş ji Xwedê re!*
*Çiqas xirabûn li bejn û bala min tê!*
*Li min û aaax!*
*Ma ne li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Institut kurde de Paris

Ev yek eşkere ye ku derdê birçîbûnê pir zor e û hêvî ew hêvî ye da birçîbûn bi serê guran ve jî nê. Yê ku bawer nake jî, bila here ji girtiyên Girtîgeha Diyarbekrê bipirse. Birçîbûn nefsê dibe helakê û mirovan dike parsekvanê ber deriyê nemerdan. Dema ku yek birçî dimîne çi bi destan bikeve dixwe. Ew kambax mirovan dehf dide bi bal dizî, şêlandin û xirabiya bi xelkê re jî. Eger ne wisa bûya, çima dê Siyabend gayê cot bidana serjêkirin? Erê rast e jinapê timî Siyabend birçî dihişt û xwarin, nan ji ber wî vedişartin. Xasma ew çend roj bûn pirî ku Siyabendbirçî mabû, birçîbûnê hêlîna xwe di hestiyên wî de çêkiribû.

Ew roj çi cara ku wî pariyek goşt dixwar yan heskek don bera ser nanê hûrkirî dida û dixwar, xwe bi xwe digot: Ax felekê! Xwezil niha birayê min jî li

vir bûna û hinek ji vî goştî, vê avdonka xweş bi nên re bixwarina. Lê ez nizanim gelo ew sax e, yan miriye, li kur e, çi dike û rewşa wî çewa ye? Ma ew amojina me jî niha weke vê bêbavê çewa ku tîne serê min nayine serê birayê min jî?

Mirovên ku pir birçî dimînin, timî çavbirçî ne û dema xwarinek tê ber wan, ew dixwin naxwin têr nabin. Ha wisa gelek dixwin û zikê wan tije dibe jî, lê çavên wan têr nabin û divên ku hêjî bixwin.

Siyabend jî goşt û avdonkê dixwar û dixwar, lê hîç têr nedibû. Lewra wî zanibû ku di wê malê de xwarina wî tenê ew roj ta êvarê ye, heta ku apê wî ji cot bê malê. Piştre îcar ka dê encama wî bibûna çi? Wî bi xwe jî bersîva vê pirsê nizanibû.

Jinapa Siyabend ew roj jê re her tiştî serbest kiribû û destûra wî bi gera li nava malê dabû. Hingê Kalê Pîr ha wisa li dûr rûniştibû û temaşe li xwarina Siyabend dikir. Xasma çaxê Siyabend goşt dixwar û di ser re jî avdonik vedixwar, kêfa Kalo pir dihat. Yekcaran jî dema Siyabend radibû diçû hindur û çend nanên sêlê dianîn bi avdonkê re dixwarin, geh jî li ber sîtilan rûdinişt û yekpariyên goştê nerme bi heskê dertanî û dixist nava nanekî sêlê li hevdu dipêça û dida zarûkên hevalên xwe, hêj zêdetir Kalo kêfxweş dibû. Jixwe çaxê ku agir kêm dibû û Siyabend dar û rewtên xaniyê xirakirî diavêtin binê sîtilan û êgir gurr dikir, kela kêfa Kalo jî bi gurriya êgir re bilindtir dibû. Wê hingê Kalo wek carên berê xwest ku wê

bûyera goşt jî bike stiran:

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Gurrî carna berê xwe dide malê*
*Pêtek ji nanê sêlê tîne diçîne legenê*
*Bi heska avdonka gê berdide ser nanêêê*
*Û de gava Gurrî dixwe, digo: Şikir ji Xwedê re!*
*Ji gava te ez kiribûm ber lepê ap û amojinê*
*Ma ne, hisreta Gurrî bû ku bixwe avdonka gê!*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Ew roj berêvarkî çaxê ku apê Siyabend cotê xwe berda û kir ku here malê, hêj nû gayê berbedêlê ket hişê wî û çavên xwe lê gerand, li wan çol û pasaran geriya negeriya nedît. Piştre herdu gayên di binê nîr de dan pêşiya xwe û berê xwe da riya malê, çû bi hafa gund ket bala xwe dayê ku wa gundî tev li ber mala wî kom bûne; ji zarûkan bigir heta zilaman, ji keçan bigir heta pîreka, kal û sofî hemû li wir in. Pêre pêre tirpînî ji serdila wî rabû û xwe bi xwe got: Eheh! Ev çi li mala me qewimiye? Elawekîl yan jina min miriye, yan jî Gurrî siqûmatek aniye serê zarûkên xelkê. Ekene çima wê hewqas mirov li ber derê me bicivin?.. Gelo Gurrî zarwên hina kuştiye, yan jinapa xwe? Wî herdu ga di cih de hiştin û got gavno ha



Institut kurde de Paris

gavno ez derdê hewe nebînin, beziya çû heta giha ber derê malê. Carekê bala xwe dayê ku wa çend sîtil goşt li ser êgir dikelin û li rex wan çend sîtil jî savar li ser êgir in. Li poxanê jî dît, ku wa çermê gayê sor ê berbedêlê hêj li wir e û serê wî li ser çermê wî ye. Bi dîtina wan tiştan ji xwe re sar bû, şaqiz ma, bevzê wî guherî û gazî jina xwe kir:

- Keçko, ev çi mesele ye?

- Wele min jî eynî mîna te xewnek dîtibû, lê min vê sibehê newêribû ji te re bigota.

- Keçê, ev çi mesele ye ku we gê şerjê kiriye? Çima ev gundî hemû li vir civiyane? Ev çi sîtilên savar û goşt in? Qey daweta diya te ye?

- Wîîî, li min kezîkurrê! Ma ne te gotibû, gê şerjê bikin?

- Nebî Gurrî te xapandiye û gayê cot bi te daye şerjêkirin?

- Pa lê! Vê sibê dema Gurrî taştiya te hanîbû, qasekê şûnde min dît wa hat û ga li pêşiya wî ye, got: "Apê min gotiye, min li ber cot xewneke pir xirab dîtiye, îcar gaziyek li me dikeve. Gayê berbedêlê bibe malê şerjê bikin û goşt bipijînin, savar çêbikin heta êvarê ku ez hatim malê, em ê gazî gundiyan bikin."

- Keçê, taştiya çi, xewna çi?..Ma kesî seh kiriye, mirov gayê cot serjê bike?

Jinapa Siyabend dev bi girînê kir, porê xwe kişand, xwe li erdê gevizand, berê fîstanê xwe

Institut kurde de Paris

çirandin, dêrî ji ser xwe avêt û di şûna xwe de kumişî ser hevdu. Apê wî jî xwe di nava xelkê re bi dizî ber bi Siyabend ve kişand, çû ku wî bigre û lê bixe. Lê Siyabend berî hatina apê xwe karê revê kiribû. Dema ap êrîşê wî kir, hema carekê got "çirp" û li xwe xist reviya çû, ap jî da pey wî. Lê ji birçiya jnuyên apî leq bûbûn û erdê nedigirtin, nikaribû bibeze û qenim toza nigên Siyabend jî hilneda.

Institut kurde de Paris

## - II -

Erê Siyabendo jaro, birçiyo haro, taziyo bêwaro. Te ne bav hebû, ne dê hebû û ne jî te warek hebû ku tê de bisitiriyayî. Te birayê xwe wenda kiribû û jinapê tim û daîm te birçî dihişt. Eger ne wisa bûna, çima dê te gayê cot bidana serjêkirin û kêfa gundiyan jî di qelpika wan de bihişta?

Siyabend çaxê ji ber apê xwe reviya û ji gund derket, adeke mezin li canê xwe da û xwe bi xwe got: Madem felekê şiqameke pîs li min xistiye, ez ê ji niha û şûnde bi xiraban re xirabî û bi qencan re jî qencî bikim. Û ez ê li dinyayê bigerim, kîjan devera ku jiyan lê xweş be, ez ê li wir bijîm.

Erê wek mesela ku dibêjin: Mîr nareve, qey evdal jî nareve? û Siyabend reviya çû. Dema ew ji ber apê xwe reviya, gelekî zû xwe ji ber çavên wî di nava kaş û newalan de wenda kir û xwe ji jiyana li nava xelkê dûr kir, dest bi jiyaneke bi tena serê xwe li çolan kir.

Institut kurde de Paris

Piştî wê revê, îcar wî ji rika ap û jinapa xwe çavre avêt gundiyan tev û dest bi xirabiya bi wan re kir xwe kir eşqiya û li dora gund çû û hat. Ew gundiyê ku hewqas jê re baş bûn, niha êdî neyartiya wa dikir. Ew hîç nesekinî, hem bi şevan hem bi rojan ç û hat. Wî nehişt kesek ji gund derkeve here kare xwe, ne jî kes here gund.

Siyabend rê û dirb betal kirin û nehişt qenin rêwiyek jî here wî gundî, ne jî jê derkeve bi deverek ve here. Û gundî hemû ji tirsa wî ketin malên xwe derî li xwe radan. Îcar piştî ku meriv bi destên Siya bend neketin, wî çi heywana ku li hawîdorê gun didît dikuşt yan nigên wê dişikandin. Kera kî digi herdu guh jê dikirin û bi ser xwedî ve dişeyand. Kîja hesp yan mihîna ku digirt dûvê wan jê dikir. Dem wî kar yan berx digirtin ew çîloqa devê ji ber xw dikişand û li pelegoşa wan dixist di cih de dikuştin. xwe apê Siyabend ji tirsa wî newêribû bîstikek tenê ji deriyê xwe bê radan bihişta. Gundî tev bi şev û roja behs û galgala Siyabend kirin û çêr û dijûn ji apê w re didan, digotin: Siyabend sêwiyek bû û kurê biray wî bû. Çima wî ew torqî kir û heta ku lêwik wisa h û dîn bû û bi çolan ket? Niha îcar em ketine tor û bel wî!

Siyabend li Deşta Silîva nav û dengekî bi sosret d û bû pirzika ser zimanê xelkê. Bi wê eşqiyatiyê w navekî wisan bi xax û xox da ku sawa wî kete ser he kesî. Êdî wisa bû heta ku pîrekan gava zarûkên xwe

dikirin xew, bi tepan li wan dixistin û digotin: Zû rakevin, Siyabendê Gurî hat we. Çaxê behsa Siyabend dihate kirin her kes ditirsiya û diricifî. Ew di çavên xelkê de bûbû nola dêw, efrît û cinawiran. Timî reşê Siyabend dihate ber çavên xelkê û xiştînek ji kur bihata, gumana hatina wî dikirin. Wî bi tirsandina xelkê ya ji xwe, çu nav û rûmet ji Mîrze Mihemedê qehremanê çîrokan re nehiştibû.

Siyabend xortikekî pir cansivik bû, bi beza xwe heywanên kûvî nikaribûn pê re serî derxînin. Ew bi yek bihnekê ji deştê dibeziya heta çiyê nedisekinî û gava ji çiyê jî serejêr dibû dibeziya heta deştê nedisekinî. Ha wisa ew bi rojan li deşta Silîva digeriya, bi şevan jî li çiyayên wê û bi heywanên kûvî re hevaltî dikir. Timî tîr û kevanê wî di destan de bû û ew hestiyê çîloqa devê jî di ber piştê de bû. Dema tiştek lê diqewimî, eger dûr bûna tîr û kevan, eger nêz bûna çîloqa devê bi kar dianî.

Bi wî awayî çend salên Siyabend bihurîn, ku timî li deş û çiyan digeriya. Di wê navê de xezalek jê re bû heval û tim û daîm lê siwar dibû. Çaxê wî dixwest ku biçûna devereke dûr, dificand û xezal dihat li ber wî disekinî, lê siwar dibû û diçû. Dema ew ji siwarbûnê zivêr dibû yan îşê xwe kuta dikir, xezala xwe berdida. Çi dema li xezala xwe siwar dibû, ji xwe re stiranê jî digot:

*Ez Siyabend im, Siyabendê Silîvî me*
*Xwediyê tîr û kevanê zêr û zîvî me*

*Siwarê xezala kûvî me*
*Îro li vir im, sibê li deverek dî me.*

Dibêjin xortek hebû, keçekê ji gundê mala apê Siyabend ji xwe re xwestibû. Îcar xort rojekê li hespê xwe yê rewan siwar bû û çû ku here mala bavê destgirtiya xwe. Ew giha nêzî gund, dît ku wa xortikek li binê siha darekê rûniştiye û kincên xwe seh dike. Lê pa xortik yekî çewan e? Yekî gurrî, keçel û hem jî kose ye. Ew yekcara kenên xwe dixurîne, dixurîne heta ku şûna neynûkên wî xwîn dibe. Siwar çû li ber Siyabend sekinî û deng lê kir:

- Kuro! Tu li vir çi dikî?

- Ma te çi şixul bi min heye? Ez li vir mehkûmtiyê dikin?

- Wê! Îcar tu û mehkûmtî çi tevî hevdu ne?

- Siwaro, têkilî min nebe, hespê xwe bajo û bi riya xwe ve here!

Ew xortê bi destgirtî pir ji nava xwe razî bû û hem jî diçû mala xezûrê xwe, serê wî germ bû û li hember xwe kesî zilam nedihesibandin. Wî hinek tinazên xwe bi Siyabend kir, têra xwe pê keniya û nexwest ku xwe berbayê wî bike, berê hespê xwe vegerand ser rê û ajot çû gund, ew şev li mala xezûrê xwe bû mêvan.

Gundiyan seh kir ku zavê mala filankeso hatiye mêvantiya wî. Piştî şîva gelek zilam rabûn çûn cem

Institut kurde de Paris

xort û li oda xezûrê wî civatê.germiyandin. Ew şev apê Siyabend jî li civatê bû.

Ji xwe Siyabend bûbû pirzika ser zimanê her kesî. Li civatê weke caran dîsa behsa wî hat holê û gundiyan gilî û gazinên xwe bi apê wî ve kirin. Her yekê di derheq Siyabend de gazinekî kir:

- Gurriyê biraziyê te dêla mihîna min jê kiriye.!

- Gurrî guhên kera min jê kirine!

- Gurrî îro bi çîloqa devê berxeke min kuştiye... Em wisa ji te qebûl nakin, divê tu vî heqî safî bikî, yan biraziyê xwe bînî malê. Eger tu wî xwedî nekî jî, em ê wî xwedî bikin, da qenim bela wî ji me vebe.

Xortê bi destgirtî hinekî li civatê guhdarî kir ku her kes behsa Gurrî dike, pirsî:

- Ez bala xwe didim we ku ji êvara Xwedê ve, axaftina we hemûyan hew behsa Gurrî ye. Ev Gurriyê ku hûn behsa wî dikin ki ye, çi tişt e?

Zilamekî ji civatê bersîva wî da:

- Xortikekî me yê biraziyê ha vî camêrê han hebû. Lawekî pir neseqirî bû. Îcar wî li amojina xwe dekekê kir û gayê cot pê da serjêkirin, xaniyekî jî pê da xirabkirin. Îcar apê wî çû ku çend şimaqan lê bixe, ew reviya û ji gund torqî bû çû. Vêca ew niha kê digire li wan dixe, çi heywaneke bê zar û ziman dibîne dûv, guh yan dêla wan jê dike û kar û berxikan jî dikuje. Wele birawoem ji destên wî ketine bela Xwedê...

- Wîîî! Vê êvarê dema ez dihatim vir, li pişt vî qelaçê han xortikekî gurrî li binê darekê rûniştibû û kenên xwe dixurandin. Nebî ew be?

Bi wê gotina xort, bi derbekê civat kerr bû û zilam tev lê hisiyan. Yekî jê pirsî:

- Êêê?

Xortê ji xwe razî, dixwest ku ew şev hunerê xwe nîşanê gundiyan, bi taybetî jî nîşanê xezûrê xwe bide û fort û pesnê xwe zêde kirin, got:

- Hema hiş bin û xwe kerr bikin. Elawekîl ez ê sibehê zû rabin herim gema hespê xwe têxim qirika Gurrî û wî ji we re bînim vir. Îcar hûn çi jê dikin bikin.

Xezûrê wî gotê:

- Lawo, wele heke tu çêyiyeke wisa bi me bikî, em tu carê qenciya te jibîr nakin.

- Hema vî îşî li pawuka min û sibê bihêlin.

Gundî bi wê gotina xortê zavayê sergerm, pir kêfxweş bûn û dîsa axaftina wan bû behsa Siyabend û domandin, heta şev li wan giha derengiyê, civat bi dilekî şad rab û her kes çû mala xwe, kete hindur û wek berê dîsa derî li xwe radan.

Roja din sibe zû gundî ji xew rabûn çûn cem wî xortî:

- Tu xwediyê wê gotina xwe ya êvarê yî?

Institut kurde de Paris

- Erê! Çima?

- Me got, êvarê hema belkî civat li te germ hatibû û te jî wek şêwra roviyan ew gotin got û xwe jibîr kiribe. Lê vê yekê zanibe, şerê bi Gurrî re ne karê henekan e. Herê ew zarûk tê dîtin, lê derbên wî ji yên Rostem û Gêyo xirabtir in. De rabe zavê me yê delal îcar here, em derdê te nebînin.

Xortê dildarê evîndar ê bidestgirtî, ew roj diviya ku pir hunerê xwe nîşanê gundiyan bide. Jixwe serê wî heta ku tu bêjî bes bi wan çend peyvên gundiyan mezin bûbû. Hema rabû li hespê xwe siwar bû, çû ber wê dara ku roja berê Siyabend li bin dîtibû. Wî bala xwe dayê ku wa hêjî Siyabend li wir e, got:

- Gurrî! Rabe bide pêşiya min, em herin gund!

- Siwaro, têkilî min mebe. Jixwe felekê ez hingavtime, çima tu bela xwe li min dixî!

- Binêr, ez ji te re dibêjim rabe bide pêşiya min, em herin gund. Ekene ez ê te bidim ber qamçiyan bi lêdan bibim û li wir jî te riswa bikim.

Siyaben bi wê gotina xort pir hêrs bû û gelek jî êşiya. Hema wî yekê nekir didu û rabû ser nigan, ew çîloqa devê ji ber xwe kişand û li nîvê pişta wî xist, ew ji ser hespê anî xwarê û li erdê jî çend derbên din lê xistin. Xort perpitî, ricifî, rihilî û lerizî. Bîstikekê şûnde Siyabend deng lê kir:

- Xorto! Çima tu hatî bi min re şer dikî?

- Tu zanî! Min keçekê ji vî gundî xwestiye. Ez îşev li mala xezûrê xwe bûm, gundî tev heta nîvê şevê behsa te dikirin. Îcar min jî xwe li pêşberî wan mêrxas da nîşandan û gotim, ku ez ê sibehê herim dest û nigên Gurrî girê bidim û ji we re bînim vir. Gurrî ev car tu bi xatirê xwedanê şev û rojan dikî hema min nekuje, lewra ez hêj nezewicî me û min destgirtiya xwe jî nedîtiye, wekî din tu çi dikî bike!

- Ê de baş e Xorto. Madem tu bi destgirtî yî û te hêj wê nedîtiye, ez te nakujim û riswa jî nakim. Nexwe ji bo xatirê wan fortên te, rab gema hespê xwe têxe qirika min û min li dû xwe kaş bike bibe nava gund. Lê lawo binêr va ez ji te re dibêjim, li wir apekî min heye ji qenciyê fam nake. Eger apê min di wî halî de min bibîne, dê min bikuje. Îcar gava min gazî te kir got "min berde" tu yê min berdî. Lawo binêr heke tu vî sozî didî min, rabe min bibe. Lê min sondek li ber felekê xwariye, heta ku ya çê hebe ez ya neçê nakim. Ewçax ez ê te bikujim û destgirtiya te ji xelkê re bihêlim!

- Bi soz, tu bêjî çi ez ê wilo bikim, tenê tu min li hember gundiyan fedîkar dermexîne.

Tu nabêjî dema ku Siyabend wî xortî ji ser hespê tîne xwarê, ew Kalê Pîr yê çavnêrê dîrokê jî li wan temaşe dikir û weke caran dîsa tiliya xwe xist kerrika guhê xwe û dev bi stirana xwe kir:

*Hêêê*

Institut kurde de Paris

*Dilê min dibê*
*Gurrîkî bi sê denga bang dikir:*
*Law siwaro, dilê min dibê*
*Qey felek bavê te bû*
*çavê min bi çavê te neketiyê*
*Hooo, looo*
*Lo lo dilê min dibê*
*Bi rebê alemê*
*Qey xwîna te ketiye, rijiyaye erdê*
*Ku ez bikşînim çîplaqa devê*
*W` ez ê çîplaqekê li hincika serê te xînim*
*nanê te qut bikim ji dinyê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Siyabend xortê jibizavketî rakir ser nigan û ew li hespê wî siwar kir, gema hespê wî ji serî deranî û xist qirika xwe. Xort hespê xwe ajot, Siyabend jî da dû û herdu çûne gund.

Çaxê gundiyan dît ku wa xortê zave hat û gema hespê xwe xistiye qirika Siyabend û wî li dû xwe kaş dike tîne, bi hûr û giran ve tev çûn pêşiyê. Xort Siyabendî rast bir navrasta bêderan û li wir ji hespê xwe peya bû. Gundî li dora wan civiyan û ji girtina Siyabend re pir kêfxweş bûn. Îcar bila kêfa wan li dera han bimîne, kêfa destgirtiya xort wisa zêde hat ku êdî wê xwe şehzadeya gund hesiband.

Institut kurde de Paris

Ew roj fersenda apê Siyabend jê re hatibû bêderê û xwe bi xwe got: Îro divê ez Gurrî bikujim, xwe û xelkê hemû jê xelas bikim! Rahişt çoyekî şimşadî çû ku li Siyabend bixe û heyfa gayê çavsor jê bistîne. Lê çaxê Siyabend dît ku apê wî hat, gazî xort kir:

- Kuro. Min berde, wa apê min hat.
- Wele îro felek bibe bavê te, nema ez te berdidim!

Siyabend kir û nekir, wî xortî ew berneda. Jê lava kir, hêvî û zarî kirin, lê dîsan jî ew berneda. Bi wê yekê Siyabend êdî pir hêrs bû û bi dengekî bilind got:

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Gurrî digo:*
*Siwaro, min di bextê te û bavê te niyo*
*Ka ew qirara te dabû min li çolê?*
*De bila qerara qesemê li canê Gurrî ketibê*
*Ku ez bihêlim tu îca bi saxî derkevî ji gundê Silîvaniyê*
*Li min...*
*Wê çaxê di bîra Gurrî hatibû zîlana kêrêêê*
*Û kêra xwe kişandibû, dabû rişma mihînê*
*Gurî ketibû qontara çiyê*
*Xortê Silîva li kevirê yeklepa qulabtê*
*Gurrî temam xistibûn nav gundê Silîvaniyê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Siyabend dît ku rewşa wî xirab e, hema hêdîka destê xwe avêt kêrikê ji berîka xwe derxist û qayişa gema hespê ya di qirika xwe de birrî, rabû ser nigan û ew çîloqa devê ji ber xwe kişand êrîşê xort kir. Lê dema xort dît wa Siyabend xwe ji gemê filitand, got "çirp" û bazda çû kete hundirê mala xezûrê xwe û derî rada. Piştre Siyabend li gundiyan vegeriya û bi kevirên yeklepî li wan xist, hemû ji ber wî reviyan û da ser pişta wan. Hemûyan xwe bi beza nigan ji bênderê xilas kirin û çûn ketin malên xwe. Siyabend dîsa vegeriya çû ber deriyê mala xezûrê xort:

- Xorto, siwaro. Bila ad û wahda Xwedê li can û cesedê min ketibin, êdî ez nahêlim ku tu bi saxiya xwe ji vî gundî derkevî.

Siyabend ji gund derket û berê xwe rast bi aliyê çiyan ve da çû. Lê ew şev heta sibê gundî tev ji tirsa wî raneketin û li xwe nobet girtin, bi tirsa ha Siyabend avête ser wan, ha avêt! Heçika xortê zava ew şev ji tirsan raneket û nîvrihî bû, reng avêt zer bû, lêvên wî qermiçîn û ket taya mirinê. Keçika destgirtiya wî jî bi tayê ket û behitî, piştre jî bi atiyê ket. Li nava gund tirseke wisan belav bû, dema ku çîvîkekê jî di kujînekan de xiştînî dikir, digotin qey Siyabend hatiye wan. Çaxê ji derve dengê heywanekê dihat yan pêjna rawilekî bihata hemû diqutifîn, diricifîn û di hev re diçûn, mîna ku taya mirinê ew girtibin.

Siyabend bi wê dîlkirina xwe gelekî zivêr bûbû.



Institut kurde de Paris

Ew çend sal bihurî bûn ku derketibû çiyan û heta wê demê jî hîç neketibû faq û qoçine wisa xirab. Ji ber wê hincê ew pir li ber xwe diket û timî difikirî.

Siyabend bi çiyayekî bilind ê bi dar û devî ve hilkişiya çû jor. Berî ku roj here ava qasekî li Deştê temaşe kir. Piştre li xwe fikirî, li wî xortî fikirî û ramana honandina hin dek û dolabên nûjen kirin. Xwe bi xwe got: Rast e ku dibêjin însan şîrê xîç vexwariye û bextê îsên tune. Min ji bo xatirê fort û zirtên wî gema hespê wî jî xist gewriya xwe, lê hindik mabû ku wî ez bidama kuştin! Ê de baş e...

Li çiyê şev li Siyabend kerr bû û xeweke gemar xwe bera herdu çavên wî dan. Çû kete nava deviyekê û bi dilekî xemgîn serê xwe danî ser kevirekî ku rakeve, lê hêj xirmaş nebûbû mîna ku yek bangê wî bike dengekî bihîzt û veciniqî rabû ser nigan li dora deviya xwe geriya, tiştekî nedît. Careke din ew vegeriya nava deviyê û xwe dirêj kir. Siyabend hêj di xew re neçûbû, dîsa ew dengê berê hat û vê carê mîna ku yek biniçînê çend hinkûz lê ketin. Dîsa rabû li hawîdorê xwe geriya, lê tu tiş nedît. Piştre xwe bi xwe fikirî û got: Ew devera ku li mirov nê, divê ku mirov ji wir here cihekî din. Ev devî jî li min nayê, ez ê herim têkevin nava deviyeke din û ji xwe re rakevim.

Siyabend ji nava wê deviyê rabû çû kete nava deviyeke din û xwe dirêj kir ku rakeve, lê kir û nekir êdî xewa wî nehat. Wî li ber xewê da û xewê li ber wî

Institut Kurde de Paris

da, ha vê gavê ha gaveke din ku ji xwe re bîstikekê rakeve, bi wê kefteleftê hinekî xirmaş bû. Erê hêj di xew re neçûbû, dîsa ew dengê berê hat guhên wî û ji şûna xwe ferqizî, gava kir ku rabe ser nigan, dît ku wa zilamek li ber nigên wî sekinî ye. Siyabend dema ew dît, hinek tirsiya û jê fikar kirin ku ango çilo ew wisa bi bêbextî hatiye girtin û pîsepîs ketiye nava lepên xelkê. Piştre li zilam nerî, lê şev tarî bû û tiştekî ji hev dernexist. Dîsa ji xwe re kete nava fikr û ramanan û li encama xwe û wî zilamê şevê sêwirî, xwe bêpêjn hişt û ji zilam jî çu deng derneket. Di wê navê de qederek bihurî, zilamê şevê got:

- Siyabendê min. Metirse! Ez Xocê Xizir im û qasidê Xwedê me, bo alîkariya te hatime vir. Xwedê ji bi te re sozek daye, ku tu bi destên mirovan nayêtî kuştin.

Zilamê şevê tîrekê û kevanekî dan Siyabend, dîsa li axaftina xwe domand:

- Ha ji te re. Siyabendê min, Xwedê ev tîr û kavan jî bo te diyarî hinartine. Lê rabe ji vî welatê Silîva here! Ev welat êdî ji te re nabe war! Li vir tu kes siyaneta te nizane. Lewra "Giyayê hewşê tal e" û heke ne zêrker qedrê zêr zanibe, kolvan jixwe hîç nizane. Siyabendê min, tenê bilbil qedrê gulê dizane. Qijik çi ji bihna gulê fam dike? Rabe oxira te ya xêrê be, ji xwe re here û hema berê xwe bide bakûr berjor here. Lê bi sedsalan piştre dê zeman bê ku îcar ev deşta

Institut kurde de Paris

han, ev herêma han û ev welatê han hemû bi te bipesinin û bi te serbilind bibin; wê te bikin pencera evînê û tê re li kûrayiya dîrokê binêrin. Ewçax tu yê di binê axa sar de bi wan bikenî û xwe bi xwe bibêjî: "Erê rast e gava mirî dimre, hêj qûnzêrîn dibe."

Piştî wan galgal û şîretên ku zilamê şevê kirin. Siyabend xwest ku rind li serçavê wî binêre û hêj zêde wî bide xeberdan, lê ha ku dît kes li cen wî tune û ew bi tena serê xwe di nava deviyê de ye. Di pey de êdî mîna ku Siyabend hêj nû ji xew şiyar bibe veciniqî, hinbihin hate ser hiş û wextê xwe, bizaveke zêde hat wî; xwe peyayekî mîna fêrisan hesiband, bevzê wî geş bû, zend û bazikên wî qalind bûn, dilê wî gerr veda û di hinavî de wek teqla ritilan cih vegirt. Rabû li hawîdorê deviya xwe geriya heta ku sibe lê ruhn bû. Çaxê roj derket, Siyabend li tîr û kevanê xwe nerî, malikê tu ava bî pirî ku delal û xweşik in hema diçin nava dilê mirov.

Kevanê Siyabend xwerû ji zêr bû û jîya wî ji çermê periyan hatibû çêkirin.Tîra wî xwerû ji zîv û bû û sertîr jî ji kevirê almast hatibû çêkirin. Li ser kevên "Siyabend" û li ser tîrê jî "Silîva" bi kila sibhanî hatibû nexşkirin. Jixwe dema tîrêjên rojê li wan dixistin, wisa çirisîn mîna ku stêra Perwîn daketibe erdê û ketibe nava destên Siyabend. Siyabend îcar tîr û kevanê xwe yê berê avêtin nava deviyekê û yên nû bi xwe re hiştin.

Wek mesela ku dibêjin: Sibê tê, xêr jî pê re. Roja dinyê avêt der, tîrêjên wê xwe reqisandin û mîna bablîsokê bi şax û geliyan ve raperikîn. Lê ew hêj negihabûn hin qûntarên çiyayên bilid, Siyabend rabû haziriya rêwîtiya xwe kir û xwe bi xwe got: Gelo ez bi kur ve herim, bi kur ve neçim? Wele pêşiyên me gotine: "Dema li te bû pêsîrtengî yan pişta xwe bide mêrekî çê, yan jî bide çiyayekî asê." Îcar ev e li vî welatê Silîva mêrê ku karibe barê min ragire tune. Nexwe hema ez ê rast berê xwe bidim bi aliyê çiyan ve û herim, ka heta ez li kur dihêwirim. Helbet wê çiyayekî asê hebe ku min bihêwirîne û ji min re bibe dost!

Siyabend bi xemgînî rabû berê xwe da oxira çiyayên bakûr û pişta xwe jî da deşta Silîva, kete rê û çû. De gidî Siyabend here ku tu naçî! Lê berî ku ew here rukibî erdê û sê caran axa warê xwe maçî kir, xatir ji dar û beran, ji welatê bav û kalan xwest û lezand.

Dema Siyabend bi rê ket dengekî bi sosret ji hawîdor ve hat û pê re jî bû qêrîn, zarîn, girî, mîna ku şîneke mezin çêbûbe loriya. Her tiştî dev bi girînê kir; çivîkên ku serê sibeyan bi zimanên pirtexlît dixwendin hemû giriyan û xebera guhaztina Siyabend ji welatê Silîva dane hevdu. Ji ber tîna wê bûyerê Siyabend ji xwe re şaqiz bû û gelek ma heyirî; dudiliyekê ew hingavt û çokên wî ji çûnê re sist bûn kir ku vegere, lê xewna wî ya nîvê şevê ew dehfand bi bal

Institut kurde de Paris

çûnê ve û destûra vegerê neda wî. Siyabend ha wisa bîstikekê ji xwe re rawestiya û li hawîdorê xwe temaşe kir, li Deşta Silîva û çiyayên li hawîdor nerî, li bajarê Silîva fikirî, çend caran bi aliyê Amed ve nerî û carekê xwe bi xwe got: Erê ez dizanim ku tu tişt ji xerîbiyê zortin nîne. Her çiqasî welatê mirov bihişta mirov e jî, lê divê ku mirov li pey çarenûsa xwe here û ji heqê tengasiyan derkeve. Eger ne wisa be, ger mirov ji xwe re derd û kulan çêbike, yan ku mirov nikaribe barê felekê ragire, hingê mirov zû pûç dibe û dikeve nava jiyaneke taristan. Lê çi dibe bila bibe, ya Xwedanê şev û rojan, tu destûra min bidî da ez bi oxira xwe ve herim û min di binê barê feleka rûreş de çokquraftî nehêle!

Siyabend xatirê dawîn ji Deşta Silîva xwest, gelek hêsirên germ barandin û lezand, rast berê xwe da bi aliyê bakûr ve çû.

Piştî çûna Siyabend ji welatê Silîva ku çend roj bihurîn êdî li gundiyan û terşên wan tu tifaq neqewimîn, û kesî li hawîdorê gund tu pêjneke wî hilneda, bû şaweşaw ku ango Siyabend hatiye kuştin yan ji herêma çûye. Îcar gundî ketin heyr û sêwra Siyabend, tev jê re bûne derdmend. Ha wisa çend heftî bihurîn îcar gundî xwe bi xwe ketin qirika hevdu û ji bo dîtina Siyabend derketin çolê û lê geriyan, bi umîda ku wî bibînin ew qayil bikin û bînin gund. Lê gundî geriyan negeriyan, Siyabend nedîtin. Zilam çûn derketin serê

Institut kurde de Paris

gir û qotikan û li hawîdor nerîn: yekcaran jî li asîman bala xwe didane teyrên qertel yên ku diçin ser kelaxan ka digerin yanena, hema qet nebe belkî laşê wî bibînin. Gundî geriyan, bi wî hawayî heftiyekê, du heftî geriyan, tu bêje mehekê geriyan û negeriyan çu salix ji Siyabend hilnedan. Dû re ew bêumîd bûn û ji wan re bawerî çêbû ku Siyabend ne li van dera ye, yan jî hinekan ew kuştiye û laşê wî wenda kirine. Piştî ku ji telesî ketin, vegeriyan çûne gund û li ser Siyabend dest bi dijminatiyeke pîs kirin.

Berekê ji bo çûna Siyabend ji herêmê di nava xwe de şahî çêkir, berekê jî şîn vegirt. Îcar aliyê şahiyê şahiyeke wisa şaneşîn çêkir ku yekî digot qey Cejna Newrozê ye; her malekê heywanek serjê kir û qurban dan. Ew roj ji feqîrên gund re bû gêta goşt û pîroziya xwarinê dane hevdu. Lê aliyê şînê, şîneke wisa mezin çêkir ku mirov digot qey hêj nû Rostemê Zal serê xwe daniye nava axa sar û pîrekan hemû reş wergirtin, serçavê xwe bi teniya xacirgatan reş kirin, hinekanjî berê fîstanên xwe qelaştin û li serê stiranên şînê honandin.

Dijminatî di navbera gundiyan de domand. Serê pêşî herdu ber bi hevdu re nepeyivîn, silava hev venegirtin û têkiliya xwe ji êkdu birrîn. Dû re wan terşên xwe ji hevdu veqetandin, erdê çêrê li hev pişk kirin û her berekê pez û dewarên xwe di devera kifşkirî de çêrandin.

Îcar wek mesela ku dibêjin: "Çaxê av pingar dide, di cihekî de diteqe." Gundiyan jî rojekê li hev teqandin. Lê îcar çi teqandin û şer û çi lihevxistin! Ew roj



Institut kurde de Paris

bîst û pênc mêrên simbêlsor hatin kuştin, sih û pênc bûkên desbihine jinebî man, çardeh xortên çardesalî bê seruber wenda bûn û heftê û du kal birîndar bûn. Çaxê zilaman şer dikir, pîrekên gund tilîlî didan, stiranên şeran digotin û bevzê zilaman xweş dikirin. Geh jî pîrekan çarikên xwe ji serê xwe dikirin û diavêtin ser serê zilamên qels. Gelek caran dar, ço û kevirên yeklepî ji erdê berhev dikirin û dibirin didane destên zilaman, da rind li hevdu bixin.

Piştî kutabûna şer, çend kesên ku nehatibûn kuştin, malên xwe bar kirin û ji gund derketin çûn. Ha wisa piştî çûna Siyabend, ew gund jî bû kavilê kayê û warê xwedina kundên kor.

Sersebebê wêrankirina gund, apê Siyabend bû. Ji ber ku ew siqûmat li ser ruyê wî û yê biraziyê wî çêbûbû. Ji ber wê yekê ap pir li ber xwe diket. Xasma ji bo wendabûna biraziyê xwe jî pir derd kişand û timî xwe bixwe digot: Ev biraziyê min ha wisan bê serî û berate çû wenda bû, ji min re kêmasiyeke pir mezin e. Û li ser ruyê me ev tofana han jî hate serê gund. Êdî wê xelk tan û niçan bide min, wê bêjin: Malikxirabo, ma te nikaribû sêwiyekî xwe xwedî bikira û di rûçikê te de heta ku ev gundê han ê şên jî wêran bû?

Piştî hewqas bûyer û siqûmatan her ku çû apê Siyabend zêde derd xwarin, kul kişandin, nexweş ket û di nava livîna mirinê de bû fena ta û derzî. Ew êş wisa lê domand, domand heta rojekê bi wan derdan got "zirp" û pepik kirin cot, serî da haziran.

Institut kurde de Paris

## - III -

Erê, ev yek rast e ku dibêjin: "Pêşiyan tiştekî ji paşiyan re nehiştiye." Lê her çiqas nehiştibin jî, pirî ku zahf tişt hebûne, bîra pêşiyan negihaye hin tiştan û jê nepeyivîne. Pêşiyên me ev jî gotine: Piştî tengasiyan firehî ne, piştî birçîbûnê têrî ye, piştî teşqeleyan carna bela carna jî serkeftin hene. Lê hay û gumana Siyabend lawikê Silîvî ji felekê nebû ku eger ew ji Deşta Silîva here, dê serê wî bikeve nava hin teşqelene hêj girantir û destên wî di xwîna gelek camêran, xasma ya 13 peyayên Şikakî de bigemirre. Herweha rê û rêwîtiyên gelek dûr û dirêj têkevin pêşiya wî û bibe kela xwînê, ya bêmirazan û navê wî têkeve nava yên şehîdên evînê.

Erê ew roj sibehê Siyabend rabû berê xwe da bi aliyê çiyayên bilind ve, kete rê lezand û welatê Silîva li dû xwe hişt. Ew çû lê her berjor çû, her berê xwe bi aliyê devera bilind ve da. Wî ji dûr ve kîjan çiyayê

Institut kurde de Paris

bilind didît rast berê xwe didayê û diçû. Ha wisa rojek, didu, sisê çû, dema lê dibû şev ji riya xwe averê dibû û dikete nava deviyekê radiket. Lê belê timî ew li welatê xwe, li heval û hogirên xwe difikirî û mola wan dikir.

Belam çûna ji Silîvayê pir li zora Siyabend diçû, lê ew xewna wî ya nîvê şevê destûra mana wî li wir nedida. Divabû ku wî cihê xwe biguhazta û ji xwe re warekî nû bidîta. Erê hema kîjan war? Çi herêm û çi cûre heval û hogir? Wî bi xwe jî bersîva wan pirsa nizanibû û nedizanî ku dê here kur û li kîjan deverê cîwar bibe! Ha ji ber wan sedeman ew di rê de pir difikirî, gelek raman dikirin û serî di ber de bû.

Siyabend ka çi qeder li rê çû, laqê zilamekî bû ku ji jor ve dihat û ber bi deştê ve diçû. Carekê wî bala xwe da zilamê çiyayî, ku kincine wisa delal lê ne, tenê maqûl dikarin li xwe bikin. Îcar wî li kincên xwe nerî û rind bala xwe da wan ku hemû qetiya ne, qirêj in, tev demikî bûne û ne yên lixwekirinê ne, xwe bi xwe got: Ev zilamê ha wisa ku ji jor ve tê û kincine maqûl li bejna wî ne, berê wî li germiyanê ye. Ez jî diçim zozanan û dê bikevim nava sar û sermayê. Bi navê Xwedê îro ez ê wan kincan tev ji bejna wî bikim û li canê xwe bikim, ez ê van gemarên xwe jî bidim wî. Bila ew jî çend salan bi van kambaxên min îdare bike. Maxwene qey dinya dihedime?

Zilamê rêwî û Siyabend gihane hev, silavê dan hevdu û pirsa rêwîtiya hev kirin. Di wê navê de Siya-

bend jê pirsî:

- Pismam! Tu ji kur ve têyî, bi kur ve diçî?

- Ez ji zozên ve têm, diçim germiyanê!

- Tu ji kura zozên têyî?

- Ji cem Emer Axa!

- Xwedêhebîna, Emer Axa miroveki çewa ye?

- Tew, mala te! Axayekî pir comerd e, malê wî gelek heye, niha 33 gundên çiyê hemû di destên wî de ne.

- Ero, ma tu nayê ez û tu kincên xwe bi hev biguhêrin? Jixwe berê te li deştê ye û tu diçî dikevî nava germê. Ez jî diçim zozên û dê bikevim nava sermê.

Ew "pêşniyarî"ya Siyabend pir li zora zilamê çiyayî çû û ew gelek jî pê hêrs bû:

- Gurriyê heran! Îro tu dîn bûyî?

- Bi xwedanê şev û rojan dikim, heke tu wan kincan bi delalî ji xwe derdixî, derxe. Heke na, ez ê bi zorê ji te derxînim!

- Gurriyê heram! Binêr ez ê niha şiqameke sêrtikî li ruyê te bixim, ku şopa tiliyên min heta salekê jî tê de bimîne. Ma ev gotin e tu ji min re dibêjî?

Ew gotina zilamê rêwî pir li zora Siyabend çû. Hema Siyabend yekê nekir didu û ew çîloqa devê ji ber xwe kişand, bi parestuya wî girt û ji paş ve çend derb lê xistin. Zilam dest hilneda û bi derbekê ji

Institut kurde de Paris

bizav ket, rabû kincên xwe hemû derxistin û dan Siyabend. Siyabend jî ew kincên li xwe derxistin û dan wî, kincên wî li xwe kirin û li riya xwe domand çû.

Siyabend bi rê ve laqê kî bû, jê pirsa gundên Emer Axê kir. Ha wisa pirs û pirs ew çû, heta giha wî gundê ku Emer Axa bi xwe lê rûdine.

Navê birayê Emer Axa yê piçûk Cinan Axa bû. Herdu bira xwediyê sihusê gundan bûn. Aqarê gundên wan tev çiya bû. Piraniya wan dahl û rez, bax û bostan, zevî û daristan bûn. Çavkaniyên sar di ber qurmên tahtan de derdiketin, ku ava wan mînabû çira şîr û di şûfê Hewza Kewserê de bûn. Bayê hênik timî dileqiya û xuşînî bi dahl û rezan dixist, bihna xwezayê ya weke miskê li navrast û baniyan belav dikir. Dema ew bihna xweş li bêvila yekî dixist, pê zengelorik fireh dibû û dilê mirovan mîna ritil giran dibû. Ew gund hemû wilo mînabûn bihiştê pirî ku xweş û şaneşîn bûn, û Kaniya Laleş bi xwe jî bi mizgîniya wan nedihat. Jixwe Gola Ormiyê digel ya Simoqiya û ya Wanê jî li ser ne hêjabûn jiyana rojeke li wan gundan.

Sermiyantiya wan gundan di destên Emer Axa de bû. Cinan Axa jî berpirsyartiya serbazan dikir. Mala Axê mînabû tekya dewletekê û wargeha rêwî û belengazan bû. Li ber deriyê wî hergav feqîr û topal tije bûn. Oda Axê ya mêvanan li ser 25 maxan hatibû avakirin. Aliyekî erda wê bi xaliyên Çînî, aliyek bi

ɔerrên Serhedî û aliyê derî jî bi kulavên koçeranî vegirtî bû. Li ber dîwaran bi rêzê doşek û li ser wan ɔalgî û nazbalgî danînî bûn. Sê taq dîwarên odê hemû ɔi xalîçeyên Wanê, bi bistirên Tetwanê vegirtî bûn. Li ser wan şûrên Serhedî, mertalên Xerzanî û rimên Silîvanî daleqandî bûn. Çend semawer timî dikeliyan û ji hilf û gulfa wan li taqê jor mîna ewrên meha adar û nîsanê timî weke mij û dûmanê xumam vegirtibû. Çend xulamên Axê yên qahwê hebûn, wan hertim qahwe li mêvanan digerandin û titûna Nihê digel ɔelgên xase yên Helebê pêşkêş dikirin. Ji xwe ɔeyayên xwarinê hertim di haziriyê de bûn û çi mêvanê ku derçika derî tarî dikir, piştî vexwarina qahwe yan çayekê sifra nên li berê rast dikirin.

Emer Axa di herêma xwe de mînabû dewleteke xwesebixwe. Her tiştên wî tekûz bû û dibistan û medreseyên wî ji şagirtan dagirtî bûn. Wî mamoste û dersdaran ji kîsê xwe xwedî dikirin û her meh meaş dida wan. Xwarin û raketina şagirt û xizmetkaran jî ji kîsê Axê bû û her meh wî her yekê hinek dirav wek bexşîş dida wan. Lê her sal Axê dehyeka qezenca wan gundên xwe dida baca dewletê.

Heçika Cinan Axa bû, ew ji xeynî serkartiya leşkerî tu kilê tiştekî din nedibû. Timî deh hezar peyayên wî yên şer bi çek hazir bûn û çavrêniya êrîşine biyanî dikirin. Lê esas destûra şerkirinê, di destên Emer Axa de bû. Herweha Axê fermaneke tûj jî dabû birayê xwe ku, heta kes êrîşê wan neke divê ew bi kesî re

nekevin şer û qirênan. Û di şeran de jî divê ku pîrek, zarûk, seqet, kal û kesên bêçek nêne kuştin, tu caran jî agir bermedin malên dijminan.

Çaxê Siyabend kete oda Emer Axa ya mêvanan û rojbaşî da civata hazir, her kes zoq bû lê nerî, çi mêvan çi alecî tev bala xwe danê ku xortikekî gurrî ye, kinekî dadewisî ye, çavgir e, pozberanî ye, awirtûj e û gelekî bi tirs û hêbet e; hema mirin ji nava çavên wî difûre. Ew tev ji Siyabend silikîn, jê pir tirsiyan û deng ji kesî derneket. Ha wisa ew bêdengî demeke dirêj domand û qenim kesî rojbaşiya wî jî venegirt.

Siyabend gava ew hogiriya ku dipa ji civata Axê nedît, ji xwe re sar bû, cemidî û bîstikekê li ser nigan rawestiya, piştre cihekî li nava pêlavan ji xwe re dît û rûnişt, li civatê guhdarî kir.

Siyaben li oda Emer Axa tu rûmet nedît û mîna miirovekî parsek kêmik hate dîtin. Bi wî awayî çend roj bihurîn, tu bêje heftiye didu derbas bûn kesî jê nepirsî ka navê wî çi ye, ji kur ve tê û wê here kur? Lê belê hêj di roja pêşî de çaxê Siyabend giha wir, xulamên suxrê bê ku navê wî zanibin jê re gotin "Gurrî" û piştre her kesî wisa navê wî bi lêv kir.

Dema xwarin dihate oda Emer Axa û sifre li ber mêvanan rast dibû, kesî nedigote Siyabend were xwarin bixwe. Lê piştî ku mêvan ji ser sifrê radibûn û xulaman firaq radikir, hin gep û pariyên hûr û



Institut kurde de Paris

hestiyên rût ku ji ber mêvanan difilitîn, datanine ber Siyabend.

Siyabend li oda Emer Axa birçî dima, roj bi roj qels dibû û ruhniya çavên wî kêm dibû. Ji ber wê yekê di nava du-sê mehan de wisa lê çêbû, ku ji birçiya êdî ji jnuyan ket û nikaribû rabe ser nigan. Dema radibû jî gêj dibû û dewxa wî dihat, dinya di çavên wî de dewran dikir û timî serobin dibû.

Siyabend ji ber sixêf û dijûnên jinapê û lêdana apê xwe filitî bû, lê îcar ketibû binê nîrê birçîbûneke wisa zor, ku tîna xwe li hestiyên wî jî dikir. Ew li oda Axê ji pirçiyan helak dibû, dinya wî serobin dibû, her ku diçû jar û qels dibû û gurra laşê wî jî zêdetir dibû.

Rojekê Siyabend ji xwe re rûnişt û xwe bi xwe fikirî: Ez divê gêtiya han de birçî dimînim. Gelo hema ez gurrî me lê ne mirov im, ku ev xulamên bêbav wisa tînin serê min? Ev nan ne ji kîsî bavên wan e û tu xisarekî wan ji xwarina min jî çênabe. Ya van êdî bêbavî ye, ne tiştekî din e. Li min û xulaman wek mesela ku dibêjin: "Nanê axê diçe, canê xulam diêşe" çêbûye. Heke ez Siyabend bim û lawikê Silîvî bin, ez ê pêşîbir li vê yekê bigrim. Ekene, ji xwe carek felekê şiqama xwe li min xistiye û çûye. Ez bi vê rewşa xwe ya xirab nikarim herim xwe bigehînim aveciyeke din jî. Eger ne wisa bûna, niha ez ji vir çûbûm.

Lawikê Silîvî êdî rind bawer kiribû, ku dê xulamên Emer Axa wî bi birçîbûnê bikujin. Lewra her ku diçû

Institut kurde de Paris

rika xulaman li hemberê wî zêdetir dibû û çavreşî diavêtinê. Rojekê dîsa xulamekî hin nanên şewitî û çend hestiyên bê goşt danîne ber Siyabend. Lê hema Siyabend rabû ser nigan û ew çîloqa devê ji ber xwe kişand, di nîvê textikê eniya wî de lê xist û di cih de kuşt.

Bi kuştina xulêm civata li odê li hev ket û serobin bû, hemû li nava hev qelibîn û bû weke roja reş. Şemateyeke wisa mezin li nava wan çêbû ku dê weledê xwe diavêt. Hinek çûn xeberê gihandin Emer Axa, gotin ku ew xortê gurrî xulamekî te kuşt.

Kuştina xulêm pir li zora Axê çû. Wî çend şerûd hildan û çû odê, Siyabend kişande îfadan:

- Gurrî. Çima te vî xulamê min kuşt?
- Axayê min. Wî kuştina xwe heq kiribû!
- Kuro, çewa heq kiribû?
- Pa lê! Tu dibînî ku timî oda te ji mêvanan mişt e. Her roj sêdan xwarin tê odê. Hewqas mêvan û gundiyên te hene tev dixwin, vedixwin û di nava malê te de digevizin. Ne, heqê min jî mîna yê wan heye ku ez bixwim. Lê ev xulamên te timî min dihêlin piştî sifrê û çi hestiyekî rût ji ber mêvanan dimîne, çi nanekî dorşewitî ku hebe tevî kom dikin û datînin ber min. Ev çendak e ez li vir im, ji birçîna çokquraftî bûme û ruhnî di çavên min de nemaye. Ez divêm ku ji mala te biqeştim jî, lê ji nêzan ez nikarim xwe bigehînim aveciyeke din. Ekene niha ez ji vir çûbûm.

Emer Axa di dilê xwe de heq'da Siyabend û pir jî li ber xwe ket, ji xwe û navê xwe fedî kir. Xasma çaxê ku Siyabend behsa birçîbûna xwe kir, Axê ji xulaman pir hêrs bû. Ha wisa Axê demeke dirêj serê xwe berjêr kir û xwe bi xwe fikirî: Heke îro xelk vê meselê seh bike, dê navê min bi çikûzî belav bibe û rûmeta min namîne. Ewçax mirin ji min re hîn çêtir e. Ne tiştekî din îcar xwarin, heh?.. Piştre got Siyabend:

- Gurrî! Lawê min hîç netirse, ez te di mala xwe nakujim. Ji niha û şûnde tu di vê malê de serbest î; bixwo, vexwo û li kêfa xwe binêre. Eger tu bi sifra odê qayîl nebî jî, here aliyê malê nava pîrekan û çi xwarina ku dilê te diçê tu bi destên xwe rûke firaqan û deyne ber xwe. Gereke ji niha û şûnde tu xwe li pawuka xulaman nehêlî. Kurê min kesê ku tiştekî got te, tu bi wan re dengê xwe dermexîne û qirên jî meke, hema rast were ji min re bêje.

Piştî kuştina wî xulamê xwarinê ku Emer Axa ji Siyabend re tu tiş negot û ew tawanbar nekir, di ser de jî destûra wî li nava malê û li xwarina bi dilê wî da, Siyabend mîna gulekê geş bû. Ew, bû bi kêfa xwe û dilê wî çi dema ku diçû xwarinê berê xwe dida xwarinpêjgehê û diçû bi destên xwe xwarin dixist firaqan û datanî ber xwe dixwar. Lê xulam û qerwaşên di nava mala Axê de bi wê yeka Siyabend pir qehirin û jê bêzî kirin. Lê kesî ji tirsa Axê jî newêribû jê deng bike û têkil bibe.

Institut kurde de Paris

Di wê navê de çend heftî bihurîn, ev car Siyabend ttimê xwe li kuştina xulamekî qahwê xirab kir. Carekê qehwecî fîncana qahwê danî ber wî, hema ew rabû ser nigan û wê çîloqa devê ji ber xwe kişand di peleguşa xulêm de lê xist. Xulamê qehwê di cih de kete erdê û av negiha devê wî, nigên xwe perpitandin û hema di şûna xwe de sar bû.

Çaxê Emer Axa bi kuştina vî xulamê xwe yê qahwê hisiya, xwe bi xwe got: Ji şerefa min re dest nade, ku ez rabim vî gurriyê han di mala xwe de bikujim. Lê ev e ew du xulamên min dikuje. Ez çi jê bikim, çi nekim? Wê ev rojekê belayeke wisa mezin ji min re derxîne, lê ka kengê? Ew bi xwe jî ranabe ji vir naqeşte naçe. Nexwe divê ez wî têxim ber îşekî, da pê ve bilipike û xwe jibîr bike. Ekene ew dê hin teşqelene mezintir jî bike.

Emer Axa rabû çû cem Siyabedn û destê xwe avêt ser stuyê wî, bi nermî got:

- Gurrî! Lawê min, çima te xulamê qahwê kuşt?

- Pa Axayê min! Ha tu dibînî ku meriv di oda te de ji dûmana semaweran difetise. Çi cara ku wî qahwe li civatê digerand, xulamê te tilpa binê fîncanan dixist fîncanekê û ditanî ber min. Ha wele min ji vê bonê ew kuşt. Ma qey ez jî ne mirov im?

- Kurê min. Ne ji bo tiştên wisa kêmbiha, mirov zilaman nakuje. De her çîbe, Gurrî niha çi îş ji te tê ku ez bidim te?

- Her îş.

- Tu dikarî şivantiya qaz û şamiyan bikî?

- Axayê min, wele ez ê ji qîreqîra wan kerr bibin!

- Nexwe çaxê mêvan avekê xwestin, tu nikarî tasek av bidî wan!

- Wele ez nikarim mîna kêlika miriyan timî li ber denê avê çik bisekinim. Rojê hezar kes tên vir û hezar jî diçin.

- Gurrî, nexwe tu dikarî çi karî bikî?

- Tu bêjî çi, ez dikarim bikim!

- Çaxê mêvan tên, hema hespên wan girêbide û êm deyne ber wan!

- Axayê min! Wele ev kar ji min nayê!

- Lê tu nikarî ji aliyê malê xarin bînî û deynî ber mêvanan?

- Xwedê jê razî. Tu dibînî ku ez gurrî me. Ma kîjan mêvan heye ew xwarina ku ez deynim ber, wê bixwe?

- Lê tu nikarî bibî sewerê xulamên hespan?

- Hah! Jixwe ez li karekî wisa digerim!

Siyabendê Silîvî peyayekî pir mêrxas bû, karê ku wî dest pê kirirbû jî bo mêrxastiyê bû. Dest bi serwertiya xwedîkirina du hespên xas kir. Wî umîd dikir ku ew dê ji heq bête der û bi serfirazî wan hespan bide xwedîkirin. Lê belê ew yek jî ne kifş bû, ka dê ew bi serkeve yanena! Ka feleka malikxirab dê wî bipejirîne, yan destên wî di xwîna hinan de dîsa bigemirrîne.

Institut kurde de Paris

Du hespên Emer Axa yên ji bo şerên giran hebûn. Navê yekî "Cengawer" bû û navê yê din "Mêrkuj" bû. Du fêrisên wî jî hebûn û her yekê wan şûrek hebû. Navê şûrê yekî "Pir" û navê yê din "Çem" bû. Ew hesp û herdu şûr tenê di şerên pir giran de dihatin bikaranîn. Dema şerekî wisa mezin li Emer Axa diqewimî, ew fêris her yekê li hespekî siwar dibû, her yekê wan radihişt şûrekî jî û diçûn cengê. Çaxê ew bi siwariya wan hespan û bi herdu şûran diketin kîjan şerî, di bîstikekê de qada şer serobin dikirin û her tiştî safî dikirin, pêre pêre jî vedigeriyane malê. Îcar Emer Axa ji her hespekî xwe re xulamekî taybetî girtibû û ew xisûsî didane xwedîkirin. Axê ji herdu hespan re her sal bi enbaran ce, mewîj, nokên kelandî, ka û nefel hazir dikirin.

Ew herdu hespên Axê, li gor navên xwe gelekî hêja bûn û parastina wan sihusê gundên quntara çiyê li ser pişta wan dibû.

Heçîka Cengawer bû gava siwarekî bi şûr diket pêşberê wî, berî ku siwarê wî şûrê xwe biweşîne, wî ew siwar ji ser pişta hespê dianî xwarê û di binê simên xwe de dikuşt. Rengê Cengawer fîq-reş bû û di eniya wî de nivîştokeke fîq-sipî hebû ku hema leylan dida. Û bijiyên wî hemû di rengê xwînê de sor bûn. Dema ew dikete şeran, bijiyên xwe mîna hesin hişk dikirin û wisa tîk bi jor ve hildidan, ji siwarê xwe dikir mîna sîper da derb lê nekevin.

Mêrkij jî, bi kuştina peyayên di şeran de navê xwe

li xwe rewa dèrabû. Wî, di şeran de hem hespan dikuşt û hem jî siwarên wan... Rengekî fîq-sipî lê bû ku çilka gewratiyê lê nedixuya û deqereke reş jî li ser polê wî yê çepê hebû.

Di wê navê de çend roje bihurîn, Siyabend bala xwe dayê ku xulam êmê hespan didizin û ji xwe re dibin malê. Wî bi gewriya xulamekî girt û jê hesab pirsî. Lê xulam qirfên xwe pê kirin û ew bi gurîtiyê xeysetnav kir. Bi wê peyvê Siyabend gelekî hêrs bû û hema ew çîloqa devê ji ber xwe kişand, heta ku weş di bazuyên wî de hebû derbekê di nîvê tasa serê wî de lê xist û di cih de kuşt.

Çaxê Emer Axa kuştina vî xulamê xwe yê hespan seh kir, pir êşiya û gelekî li ber ket. Piştre ew xwe bi xwe fikirî, ramiya û demepêşa Siyabend anî ber çavên xwe; baweriya wî çêbû ku dê Siyabend teşqelene hîn mezintir jê re derxîne holê. Lê ew ji bo şerefa xwe nikaribû di mala xwe de têkil bibe, yan wî ji cem xwe biqewirîne. Axê îcar ji Siyabend gumana casûstiyê kir û birayê xwe Cinan Axa pê da hisandin ku lê taqîb bike, ka ev xortê gurrî çi tişt e û bo çi hatiye mala wî?

Emer Axa gazî Siyabned kir:

- Gurrî! Ev bûn sê xulam ku tu wan dikujî. Erê yek niheq, didu niheq. Qey evî jî li te niheqî dikir û



Institut kurde de Paris

êm nedida te? Bo çi tu wisan dikujî?

- Emer Axa! Heçîka hûn axa ne, timî ji we re mirovên xirab divê. Lewra hûn bi kesên rast û dirust re nikarin bimeşin. Ha ew herdu xulamên te yên hespan, hewqas êm û alifê ku her sal tu bi enbaran ji hespên xwe re hazir dikî, nêvî jê didizin û dibin malên xwe. Min, viyê kuştî serbiser di diziyê de girt. Îcar wele wijdana min hewl neda, ku ez çavên xwe ji diziyê re bigrim û bi bêdengiyê xwe jî bikim ortaxê diziya wan!

- Kuro, na naaa?

- Erê, bi gora bavê te, Axayê min!

Çaxê Siyabend ew mesela diziyê ji Emer Axa re eşkera kir, îcar Axe hêj bêtir fikirî: Birastî heta niha jî têkiliyeke Gurrî û van xulaman bi hev re çênebûye û berê jî hevdu nedinasîn. Erê bo kuştina yekî Gurrî niheq, bo ya diduyan niheq, ma wê Gurrî ji bo kuştina yê hespan jî niheq be? Nexwe ka ez ê lêkolîneke nihênî bidim kirin, belkî hin dizên din jî di nava xulaman de hebin û haya min ji wan tune ye! Lê eger Gurrî niheq derket, ji xwe wê cezayê xwe bibîne...

Emer Axa rabû çend peyayên parastinê xistin pey xulaman hemû, da wan kontrol bikin û di derheqê wan de rapor binivîsin, bidin wî. Çend zilam dest pê kirin û xulaman tev xistin binê çavdêriyê. Di wê navê

Institut kurde de Paris

de heftiyek bihurî, derket ku ew herdu xulamên hespan casûsên dijmina ne û xwestine ku Cengawer û Mêrkuj bi birçîhiştinê jar bikin, da di şeran de nikaribin çê bişixulin. Di heftiya diduyan de xulamekî qehwê jî casûs derket, ku wî rewşa oda Axê ji dijmin re dida diyarkirin û çiqas hêza wî ya leşkerî hebû tesbît dikir. Herweha di xwarinpêjgehê de jineke casûs jî derket, ku dê jehrî bixista nava xwarina mêvan û ya leşkerên Axê.

Piştî derketina wan casûsan, Axê kêfa xwe pir ji Siyabend re anî, baweriya wî gelek pê hat û wî ji xwe re mirovekî dirust pejirand. Îcar Emer Axa şanetiya her sihusê gundên xwe da Siyabend, û destûra wî da ku ew çi bike çi neke bi kêfa xwe ye. Ha bi wê yekê ji xeynî hêza leşkerî, Siyabend bû mezinê her kesî û dilê wî çi bixwesta dikir, ji xwe re digeriya û hin rojan jî diçû nêçîra xezalan.

Rûniştvanên gundên quntara çiyê, hemû milêbatiya Emer Axa dikirin; erd, cot û tov ji kîsî Axê bûn, şixul jî ji wan bû. Axê her maleke gundiyan çend mih, hewqas bizin û du çêlek jî dabûne wan. Îcar çi qatix bûna çi zad yan fêkî bûna hemû dikirin sê par; du par ji wan re bû û yekê jî didan Axê xwe. Lê Siyabend ew sêr betal kir; qezencê kir çar par, yek ji Axê re û sisê ji gundiyan re. Ha ji ber wê yekê êdî siyaneta Siyabend wisa zêde bû, ku gundiyan ew bi ruhniya çavên xwe nedida.

Hin tişt hene ku gazin jê nayêtin kirin. Ji ber ku ew tişt ne fihêt dikin, ne ditirsin û ne jî pixava teşqeleyan dikin. Belam yek ji wan tiştan jî, ev în e. Herê evîn û ne sosreteke din. Evînê... Malikxirabê... Bêbextê... Çima tu wisa hin kesan dîn û har dikî û piştre wan bera çolan didî, ku ew dibin jar û belengaz, dibin hevalê rawil û tebayên çolê û heta ku xwe ji civata mirovatiyê bi dûr dixin? Ne Memê Alan, Mecnûnê Leylê, Farhadê Şêrînê û gelekên wisa yên din hemû jî bi wê belayê sosretgerandî bûbûn û tu xêrek ji giyana xwe nedîtin, heta ku bi wê belayê gorbihişt bûn.

Evîn tiştekî xweş e, ku bi daxwaza herdu dilan be. Lê eger dilek bivê û yek nevê, ew evîn dibe belareşek û di qelpika mirov de dimîne. Herweha dibe taya sipî jî û dikeve navbera çerm û hestî, geh jî dibe janekêş û dikeve giyan û jiyanê, her tiştî bi xwe re wêran dike. Erê ne beredayî hatiye gotin: Bila dil bi dil be, bila balgîvê ber serê mirov kevir be, bila lihêfa mirov asîmanê bilind be, bila doşeka mirov erda şil be, bila tûrikê parsê li nava mil be û tûrik jî qul be parsa dayîhevî tê re bikeve.

Lawikê Silîvî rabû ev car dest bi evînekê kir. Lê evîndara wî ageh jê nebû û xwe jê re babet nedidît. Evîndara Siyabend ne ku jê zêdetir bû, belkî bavê wê jî jê kêmtir bû. Lê ji ber ku ew nenasê herêmê bû û bi gurrîtiyê hatibû navdarkirin, kesî nizanibû ew kî ye û ji kur e, wilo di nava xelkê de kêmik dihate dîtin û têkiliya pê re jî her wisa çêdibû.

Elîf xatûn, xweş elîf bû. Keça Emer Axa ya piçûk bû. Ew ne tenê delaliya malê, ya sihusê gundan bû. De îcar li gorî gotinan delalî û spehîtiya ku li Elîfê hebû, li tu keç û bûkan nebû: keçeke bejnzirav û noqqevdik, çavzeytûnî, lêvtenik, rûhinaroka giroverok bû. Ew, rasterast li gor navê xwe mîna "elîf"ekê bajnzirav bû. Elîfê keçeke wisa lihevhatî bû, ku havênê bedewtiyê ji zeriyan re nehiştibû. Ha wisa pirî ku gewre û rengqal bû,Zîna Memê Alan jî li ber delaliya wê sik dihate xuyakirin.

Elîfê keçeke pir bedew bû: ruyê wê mînabû şimamokekê. Wisa nazdar bû ku bi yek ramîdanekê dilên xortan dikir du ker. Lêmêzekirina li wê mînabû hênikayiya zebeşan û pê agirê dilan ditefiya. Reng û ruyê wê dişûfiya şanikên hingivê Berwarê û soremortiya wê jî di rengê hinarên Zivzîkê de bû. Kincên li bejna Elîfê timî ji regê kesk û sor û zer bûn. Ji dûr ve çaxê yekî lê dinerî giroveriyeke wek haleya li dora Hîva Çardeşevî ew dixiste nava xwe û jê tîrêjên mîna sertîran li hawîdor belav dibûn.

Siyabend çend caran Elîfê li aliyê malê di nava pîrekên xwarinpêjgehê de dîtibû. Serê pêşî bala wî neketibû ser Elîfê, jê wetirê ku jineke bi mêr e. Lê piştî dît ku temezî li serê wê ye, êdî zanibû ku hêj keç e û nebûye bermaliya hinekan. Ji wê rojê û şûnde êdî bala Siyabend kete ser wê û evîneke tûj dilê wî hingavt.

Siyabend di nava mala Emer Axa de gelekî bi rû û

Institut kurde de Paris

rûmet bûbû. Wî riya xwe li her tiştî didît û dixwest ku xwe bi rûmettir bike û xwe bike zavê malê jî. Îcar ew rabû li dora Elîfê çû, hat û xwest ku bela xwe lê bixe, lê keysa wî çênedibû. Rojekê ji nedî ve Siyabend dît ku wa Elîfê û qerwaşeke xwe bi hevdu re ne û diçin nava xazbaxçeyê li biniya malê, xwe bi xwe fikirî: Di vegerê de ez ê herim ser riya Elîfê û jê ramûsaneke xwe bistînim. Ewçax dê xelk seh bike û nema kes tê Elîfê dixwaze. Hingê Emer Axa wê bêgav bimîne, bimîne paşepaşê bide min!

Siyabend ha bi wê ramanê rabû çû li ser riya baxçe rûnişt û sekinî heta ku Elîfê û Qerwaşa xwe hatin. Çaxê wan dît ku wa Siyabend li ser riya wan rûniştî ye, Elîfê herweku ew nedîtibe, lê Qerwaşê got:

- Xatûna min! Bo çi Gurrî hatiye li ser riya me sekiniye?

- De feqîrê Gurrî, bîra çi dibe? Qey belkî hatiye ji xwe re qutiyek titûn yan çend qirûş pere ji min dixwaze!

Çaxê ew gihane nêzê Siyabend, Elîfê got:

- Ha Gurrî! Tu çi dixwazî?

Siyabend hema necamêrî nekir û rasterast got:

- Elîfê, ez hatime îro dê tu ramûsanekê bidî min!

- De wir ve here, gurriyê heramê şindonek ê ne mîna mirovan! Niha bavê min bi te bihise, her Xwedê dizane wê çi bîne serê te. Belkî herdu guhên te jî ji te bişiqitîne.

Institut kurde de Paris

Siyabend û Elîfê ketin qirika hevdu û nîqaşeke dirêj kirin. Wî, lê doza ramûsanekê kir. Wê jî gelek peyvên xirab jê re gotin. Lê Siyabend riya Elîfê berneda û ji bo ramûsanekê xwe kir qîr û zift, li doza xwe kudand û bela xwe jê venekir. Îcar pirî Siyabend fedî dikir û hem jî gelek peyivîbû, devê wî mîna ku tije sîl bûbe ziwa bû û xwe çengê satila avê ya di destên Qerwaşê de kir, jê sitend û çend qurt av vexwar.

Li gor çîroka Kalê Pîr, ewçax Elîfê hîn zêdetir peyvên şor bi Siyabend kirin û ew bi kûçikan şûfand:

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Elîfê bang dikir:*
*Lo lo Gurriyo, çepelo, heramo, mirdaro,*
*dilê min dibê*
*Ez Elîf im, qîza Emer Axê*
*Xwediyê 33 gundê quntara çiyê*
*Û îro tu li min dikî dawa ramûsanê*
*Gurriyo de wê de here,*
*bi rebê alemê*
*Tu yê diherimînî wê satilê!*

Siyabend gelekî li ber xwe ket û ji hatina ser wê rê poşman bû. Hem jî bi hezaran car poşman bû. Lê tiştê ku çûbû, diviya ku wî nedabûna dû. Siyabend wan peyvên bêrê ji Elîfê nedipa û umîd nedikir ku dê

wisa bêje. Lê wê gotin, hem jî gelek peyvên giran pê kirin û ew şerpeze kir, heta ku wî bi segan şûfand û qeştandin jî dayê.

Sixêfên Elîfê bila li dera han bimînin, yên Qerwaşê zahftir li zora Siyabend çûn. Jixwe Siyabend dizanibû ku çêrên Elîfê halhal in û jê re rewa ne. Lê nizanibû ku derdê Qerwaşê çi ye?

Qerwaşa Elîfê, bi delalî û nazdarî ji xatûna xwe ne kêmtir bû, belkî jê zêdetir û rindtir bû jî. Lê her çi be jî, ew keçeke xizmetkar bû û bavê wê milêbayê Axê bû. Siyabend hinekî derdê wê dizanibû, ku wê dixwest gepa xwe zêdetir bike û dirustiya xwe ji xatûnê re bide eşkerakirin. Ji ber wê yekê îcar wî hîç nexwest ku bersîva Qerwaşê bide û dijûnên wê hemû daqurtandin.

Siyabend gelekî dixwest ku bersîva Elîfê bide, lê dudiliyê ew bêdeng hişt û xwe bi xwe got: Gelo ez bersîv bidim, nedim? Eger ez bersîva wê bidim û ev mesele eşkera bibe, tavil şerek di navbera min û malbata wê de derkeve û hin zilamên gundî bêne koştin. Lê heke ez bersîv nedim, dê gotinên wê li ser dilê min tirş bibin û tu car dernakevin.

Siyabend dana bersîva Elîfê rewa dît û xwe bi xwe got: Kesî tu xisarê xwe ji bizavkirinê nedîtiye û mêrantî ji her kesî jî nayê. Divê ez bersîva wê bidim û heta ku ew sax be jî da jibîr neke. Piştre Siyabend bi dengekî bilind got:

*Gurrî digo, lê lê Elîfê*

*Bejna min zirav e, tak rihana li takî*
*Bira qerara Xwedê li can û cesedê Gurrî neketibê*
*Ji niha û ne dereng*
*wê ramûsanê te bên li cem min ne bi perakî*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Siyabend bi wan dijûnên Elîfê gelekî êşiya û ew sixêf pir li zora wî çûn. Mîna hinek caran dîsa kela dilê wî rabû, muyên laşê wî wek şûjinan hemû tîk bûn, demarên eniya wî werimîn û bijangên wî bi jor ve hilkişiyan. Lê piştre ew rabû xwe ji ser riya Elîfê da alî û rast berê xwe da oda mêvanan çû li hindur rûnişt. Elîfê û Qerwaşa xwe jî rast berê xwe dan serayê û çûn ketin oda xwe.

Institut kurde de Paris

## - IV -

Jiyan pir xweş e, lê eger ne bi koletî be. Serbestî xweştir e, lê ger ne bi bindestî be. Alîkariya bi feqîran re jî hîn xweştir e, lê er ne bi stendina zorê û hiştina bi bêgavî be. Nexwe çaxê ku mirov xwe bi xwe be, mirov ji hevdu re dibe mîna kifletê malekê. Ewçax çi kêmasî û pêdiviya mirov çêbibe hingê bê tirs û bizd mirov dikare ji hev re eşkere bibêje û daxwaza dilê xwe bi cih bîne. Lê dema yekî biyanî ku tiştekî bi zor ji mirov distîne yan hiştina bi bêgavî bi mirov dide kirin, bêlome bî pir ne xweş e û ew kiryar hîç nayê jibîrkirin. Mihemed Beg jî ha yek ji wan sîxuran bû ku ji dewletê re bi zor ji xelkê herêmê dirav distendin, û xelkê bêgav dikir ku ew suxra dewletê bikin, xortên nûgihayî jî bi kotekî ji dê û bavên wan distend û dihinartin leşkeriyê.

Kula Mihemed Begê ketibû ser dilê Siyabend, hîç denediket. Lê Siyabend ji bo xatirê Emer Axa dil ned-

Institut kurde de paris

ikir ku siqûmatekê bîne serê wî Begê rewan.

Mihemed Beg zilamekî pir xerab bû, gelekî bê tîp bû, wisa pintî, nelihevhatî û qutifokî bû ku dilê mirovan ji sînçê wî dixeliya û her kesî jê bêzî dikir. Bejna wî pir kin bû, yekî incûrokî bû, rengê wî çûrik û çavzer bû. Bêvileke sertûj lê hebû, yekî digot qey hema Xwedê li ber wî rûniştiye û dirêşekê pê ve zeliqandiye. Gurçikên ruyê wî wilo qîç bûn, her yekê mînabû karçînekê. Lêva wî ya jor kin, ya jêr dirêj û diranên wî jî mîna yên mişkan hûr û firk bûn. Herdu guhên wî kirr, kin û kurisî bûn. Simbêlê wî eynî di tîpa dûvê mişkan de bû. Werhasil de ez çi bêjim. Begê bejik mirovekî wisa bêteşe bû, ku kes nikare salixê bêteşetiya wî bide!

Beg ji aliyê dewletê ve hatibû vebuhtîkirin, ku bacê ji dewlemend, axa û maqûlan bistîne, herweha xortên malbatên feqîr jî bicivîne û wan bişîne leşkeriyê.

Mihemed Beg di suxra xwe ya ji dewletê re gelekî dirust bû û fedakarîne mezin dikir. Wî çi fermana dewletê ger hebûna herfo herfo bi cih dianî. Ha ji ber wê yekê dewleta biyanî qesreke fiq-sipî jê re çêkiribû, hem jî li ser çiyayekî bilind ava kiribû ku her der jê ve dihate xuyakirin. Hergav dûrebîna wî li ber çavan bû û herêmê bereçav dikir. Dora Begê sîxur tije keleş, tolaz, diz û berdoş bûn. Îcar her sal dema ku payîz kuta dibû, xelkê dexl û debra xwe hiltanîn û pez û dewarên xwe difirotin, her yekê baca ku didan

Institut kurde de Paris

dewletê çi dirav çi jî zêr dibirin teslîmê wî dikirin. Kesên ku di zemanê xwe de bacê nebira û teslîmê wî nekira, Beg ew bi leşker û cendirmeyên dewletê didane rezîlkirin, piştre jî diz û keleşên xwe bera wan dida. Ha îcar ji bo kes bi giliyê wî li cem dewletê nê rezîlkirin, her kesî di zemanê xwe de bacê dibir û teslîmê wî dikirin.

Mihemed Beg çaxê civandina baca dewletê kuta dikir, ew dirav û zêr hemû dixistin têr û xiraran û li hêstiran bar dikir, ew jî li hespê xwe siwar dibû û şûr dixis stuyê xwe, bi çend keleşan ve dibir didane dewletê û vedigeriyan.

Hikûmetê ew hesp û şûr ji Mihemed Begê re diyarî kiribûn. Heçîka şûr bû, jixwe li dinyayê şûrên weke wî şûrî û hespên nola wî hespî peyda nedibûn. Beg navê şûrê xwe danîbû "Lahorê Qetlê" û navê hespê xwe jî danîbû "Deybilqiran".

Ew hesp û ew şûr li herêmê gelekî nav û deng dabûn. Heçîka hesp bû, di şer û oxilmeyên giran de hîç nedihişt ku derb li siwarê wî bikevin û timî siwarê xwe diparast û ew serfiraz derdixist. Lê şûrê wî, jixwe çi tiştê ku wî ew bihingavta jê re felat nedima.

Rojek ji rojên payizekê, Emer Axa rabû baca ku her sal dida dewletê xurcezîneke tije zêr kir û bi çend siwaran ve, çûn ku teslîmê Mihemed Begê bikin. Ew, dema ji gund derketin Siyabend jî rabû li axteyekî qor

Institut kurde de Paris

siwar bû û da pey wan çû. Emer Axa û hevalên xwe carekê dîtin, ku va Siyabend li axtekî siwar e û qûş û gemê ters pê ve girêdane, li pey wan tê. Lê vegeriya:

- Gurrî! Ev tu hatî çi?

- Axayê min! Ez jî divêm bi we re werim.

Emer Axa kir û nekir Siyabend şûnde venegeriya. Hema ew ji mihîna xwe peya bû û çû şiqameke tûj li ruyê Siyabend xist. Lê Siyamend dîsa gotê:

- Axayê min! Bi serê bavê te, heke tu min bikujî jî ez ê bi we re bêm.

Emer Axa hinekî bi tinaz hem jî bi qirf, berê xwe dayê got:

- Ê de baş e, nexwe em naçin. Hema tu vê xurcezîna bacê bibe teslîmî Mihemed Begê bike û vegere were malê.

Siyabend jixwe li Xwedê û li tiştekî wisan digeriya. Lewra ew li benda rojekê bû ku fersendeke wisan têkeva destan û bi Beg re rûqal bibe. Lê Emer Axa ew yek hîç ji Siyabend guman nedikir, ku ew dikare li hemberî Beg bibizive. Siyabend got:

- Bila! Lê nexwe divê tu mihîna xwe û şûrê destên xwe digel rim û mertalê xwe jî bidî min!

Emer Axa yekê nekir didu û mihîna xwe, rim, şûr û mertalê xwe hemû dan Siyamend. Ew û hevalên xwe şûnde vegeriyan çûn malê. Siyamend jî ji axtê

Institut kurde de Paris

qor peya bû, şûrê Emer Axa avêt stuyê xwe, rim û mertalê wî hildan û li mihîna wî siwar bû, berê xwe da qesra Mihemed Begê, çû ku xurcezîna zêran bidê.

Siyabend berî ku bi rê keve, rima hizîranî çend caran li erdê xist û tê de kila. Ew, mîna ku hêj li wir pîkola şerê Mihemed Beg bike û serê mihîna xwe berda, ajot çû. Çû ka ew çiqas rê çû neçû, nêzîkayî da Qesra Sipî. Carekê dît wa serê karwanê Beg derket û baca dewletê ya ku civandiye hemû li hêstiran bar kirine û dibin ku teslîm bikin. Siyamend li pêşiya karwên sekinî, nehiş ku hêstirên wî li rê biçin. Hêstir ji Siyabend tirsiyan, hemû veciniqîn û bi ser hevdu ve kumişîn, barên wan li hev ketin û di nava hev de asê man. Çaxê Mihemed Beg ji paş ve dît ku wa siwarek ketiye pêşiya rê, got keleşekî xwe:

- Kuro! Ca here binêr, wa siwarek di tangava rê de sekiniye û serê karwan bernade. Jê bipirse, ka ew çi divê? Eger ew xwînî bûbe yan keçekê revandibe, bêje Begê min gotiye: Barê hêstira pêşî jê re, bila serê karwanê me berde. Eger ne, ka ew doza çi dike?

Keleşê Beg çû cem Siyabend, got:

- Siwaro! Silavên Begê min ji te re hene. Got: Eger ew xwînî bûbe yan jinekê revandibe, bila barê hêstira pêşî jê re be. Eger na, bila serê karwanê me berde.

- Tiştê wilo nînin! Heta ku ez û wî mîna du biran vî karwanî li hevdu parve nekin, ez riya wî bernadim.

Keleşê Beg şûnde vegeriya çû, got:



Institut kurde de Paris

- Begê min! Ew siwar tiştên ji xwe zêdetir dibêje.

- Kuro, çi dibêje?

- Got Heta ez û wî mîna du biran vî karwanî li hevdu parve nekin, ez rê bernadim.

- Kuro, na naaa?

- Begê min! Welehîn siwarekî gurrî ye, çavên wî mînane yên melkemot û hema kuştin ji rûçikê wî dibare!

- Here bêjè: Bila barê du hêstiran jê re bin!

Keleşê Beg dîsa vegeriya çû cem Siyabend:

- Begê min got: Bila barên du hêstiran jê re be.

- Na, tiştên wisa nabe. Ev dirav û zêrên ku ew dibe dide dewletê, hemû xwîna xelkê ye û tevan jî ew ji tirsa xwe dane wî. Lê yê ku natirse û xwe di çengek av de dixeniqîne, ez im. Ez ji ser vê rê naçim heta ez û wî van baran bi biratî parve nekin.

Keleşê qasid dîsa şûnde vegeriya çû cem Begê xwe û ew peyva Siyabend got wî. Îcar Beg li ser pişta hespê fikirî û serê xwe berjêr kir, lê belê tu rê ji riyekê dernexist.Tu nabêjî heta wê rojê jî ew rastê peyayekî wisa gunritil ê xezebgiran nehatibû. Hinbihin tirs lê zêde bû û di wê navê de her carê qasekî Keleşê xwe şeyand cem Siyamend û gelek bar danê. Barê sê hêstiran, yên çaran, yên pêncan, heta deh bar jî danê. Lê Siyabend qebûl nekir û nîvê hêstiran digel barên wan xwest. Beg bê umîd bû. Vêca ew bi xwe, bi niyeta hêvî û lavlavê çû, bi qederê çend sedan li

Institut kurde de Paris

dûr sekinî û li Siyabend nerî, saweke mezin ew girt û bi dengekî nizm ê ricfokî gazî kir:

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Mihemed Begê bi sê denga bang dikir:*
*Lo lo siwarê li tenga rêêê*
*Lawo, ma îro tu natirsî ji xofa Xwedê?*
*Ji Rebê alemê?*
*Tu herimî yî, ketî ser devê rê*
*Tu rima hizîranî dikilêêê*
*Û paşiya bazirganê min talî bi zengil e*
*pêşiya bazirganê min bi zengil e*
*Ke hêstir li hêstirê bisekine*
*Fermana serê min e*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Gotinek ji Mihemed Begê, yek ji Siyabendê Silîvî û herdu li hev geş bûn. Heçîka Mihemed Beg e, siwarê Deybilqiran e û Lahorê Qetlê di destan de ye. Kambaxê Lahor diçirisîne, eynî wek birûska meha nîsanê tîrêj jê diçin. Hem jî Beg zilamê dewletê ye û ji nava xwe pir razî ye; zilaman li ber pozê xwe mêr nahesibîne.

Mihîna Siyabend ne babeta hespê Beg bû û şûrê wî jî ne di tayê şûrê Beg de bû. Lê kezeba Siyabend bi giraniya xwe mîna ritilekê hebû, dilê wî jî fena lodekê bû û gurçikên wî jixwe mînabûn pola.

Institut kurde de Paris

Siyabend û Mihemed Beg ji hevdu re daketin tirada hespê. Lê hespê Beg her carê qasekî radibû pêdarê û xwe diavête Siyabend, dixwest ku wî ji ser pişta mihînê tera bike. Beg û Siyabend dest bi hejandina şûran kirin; geh Beg şûrê xwe avêt û Siyabend mertalê xwe da ber, geh Siyabend şûrê xwe daweşand û wî mertalê xwe da ber. Ha wisa derbek ji vî yek ji wî, hespê Beg aliyê piştê ji Siyabend sitend û wî Lahorê Qetlê hilda kir ku daweşîne û bi derbekê Siyabend bikuje, lê Siyabend pehînek li hespê wî xist. Hesp terqizî û çû li tûmikekê terpilî, Beg di ser situyê wî re terayî erdê bû. Siyabend li ser pişta mihîna xwe rabû ser zenguyan û rima hizîranî çend caran kila û avêt, li nîvê silsila pişta Beg xist û di textikê singa wî re avêt der.

Çaxê keleşan dît ku Begê wan hate kuştin, karwan di cih de hiştin û hemû reviyan, gavno ha gavno bi aliyê Qesra Sipî ve çûn. Siyabend ji mihîna xwe peya bû, pêşî çû şûrê Beg avêt situyê xwe, li hespê wî siwar bû û da pey keleşan. Keleşên revoke peyane pir sivik û beza bûn. Wan gelekî zû xwe di nava dar û deviyan de ji ber çavên Siyabend wenda kirin. Siyabend li karwan vegeriya, berê hêstirên barkirî hemû dan riya gundê Emer Axa û ew ajotin, tevek ji Axê xwe re birin û çû gund.

Çaxê Siyabend karwanê Mihemed Beg yê baca dewletê gihande nêzî gundê Emer Axa, gundiyan ew dîtin û hemû ji xwe re şaş man. Hinek jî çûn xeberê

Institut kurde de Paris

gihandin Emer Axa, gotin:

- Wa Guriyê me karwanê Mihemed Begê bi carek anî û hat. Niha wî Beg jî kuştiye. Emer Axa, rebeno de rabe îcar karê xwe û şerê dewletê bike.

Emer Axa serê pêşî bawer nekir. Lewra wî carekê bawerî hanîbû ku di dinyê de zilamê pixav bike û dengê xwe li Mihemed Begê hilde nîne. Axê bi xwe rabû çû derkete ser banekî bilind û li Siyabend û karwanê wî nerî. Erê rast e wa Gurrî tê û hêstirên barkirî yên baca dewletê jî hemû dane pêşiya xwe û tîne. Emer Axa dîsa ji çavên xwe bawer nekir, çend caran çavên xwe bi pişta herdu destên xwe firikand û dîsa nerî. Erê guman jê re nema, ewê tê Siyabend e û karwan jî yê Beg e. Axê gelek tirsiya, pêre pêre bevzê wî guherî, jnuyên wî qurifîn, çavên wî zer bûn û hema di cih de rûnişt, xwe bi xwe got: Ev Gurriyê ku tu kes nizane ji kur e, mala min bir mîratê.

Bîstikek bihurî, hinbihin Emer Axa bi xwe ve hat, rabû gazî birayê xwe Cinan Axa kir:

- Eger niha Gurrî bigîje vir, ew şiqama ku vê sibê min lê xistibû hîn jibîr nekiriye û dê min jî bikuje. De rabin, vêca min serqot û pêxwas bikin û qetikekî jî têxin qirika min, min bibin pêşiya wî. Ewçax min hêvê heye belkî li min bibore. Ekene, xwarina min ji dinyayê hatiye birrîn.

Bi wê gotina Axê, bizd kete ser gundiyan tev, hemû tirsiyan û ketin telaşê. Çend peya rabûn hahakê

Institut kurde de Paris

qetikekî anîn xistin situyê Emer Axa, wî serqot û pêxwas kirin û birin pêşiya Siyabend. Lê dema ku Siyabend ji dûr ve Axê xwe bi wî hawayî dît, ji hespê Mihemed Begê peya bû û çû herdu destên wî maçî kirin, got:

- Malikava, çima te xwe xistiye vî halî? Tu apê min î û ez biraziyê te me. Hema te şiqamekê li min xist jî, qey ez ê rabim bi te xirabiyekê bikim?

Siyabend wî qetikê di qirika Axê de vekir, pêlavê xist nigan û kolosê wî da serî, wî da pêşiya xwe û çûn li oda mêvanan rûniştin. Xulaman jî barên hêstiran qelabtin û ew dirav û zêr birin di avahiyekê de vala kirin. Hinan jî hêst birin xistin tewlakê û alif dane wan.

Institut kurde de Paris

Emer Axa, lawikê Silîvî li jora odê di şûna maqûlan de dabû rûniştandin, ew jî li bindestê wî li ser çokan rûniştibû û herdu destên xwe danîbûn ser hevdu. Piştre hemû kesên li wir, çi mêvan çi jî gundî tev ketin dûvik û yeko yeko çûn destê Siyabend maçî kirin û li eniya xwe xistin, paşpaşkî zivirîn çûn, çûn û li ber derî sernig sekinîn, li pawuka dana destûra xwe man ku Siyabend bêje wan rûnin.

Di wê navê de Emer Axa li xwe difikirî, li Siyabend dinerî, geh serê xwe ditewande erdê li ber xwe dinerî û xwe bi tiliyên xwe ve mijûl dikir. Civat jî bêdeng mabû û devê kesî qul nedibû, tev li pawuka

Siyabend sekinî bûn ku ew serpêhatiya xwe û Mihemed Begê ji wan re bibêje. Erê ew bêdengî li Siyabend jî xweş hatibû û nedipeyivî. Lê hema carek ji nedî ve Emer Axa wê bêdengiya civatê şikand û berê xwe da Siyabend:

- Lawê min, Gurrî! Ev çend sal in ku tu li cem me yî, hîn jî me te nas nekiriye. Niha navê te çi ye, tu ji kur î, ji kîjan eşîrê yî û bo çi hatibûyî vir?

- Apo! Hema nepirse çêtir e!

- Tu bi serê xwe kî, lawê min?

- Navê min Siyabend e.

Tu nabêjî ew tev hêj ji zû ve bû ku nav û dengê Siyabend bihîztibûn. Lê heta wê rojê jî tu kes lê varneqilîbû ku ev Gurrî, Siyabend bi xwe ye. Îcar dema wî navê xwe got, hemû ji xwe re şaş man û ziloq bûn lê nerîn. Hinekan jî tiliyên xwe xistin devê xwe û yektel meyizandin, lê nerîn heta ku avşûtik ji devê wan herikî û pinepina "heee!", "birraaa!" û "waaa!" ji gelekan hilat. Jixwe Emer Axa di şûna xwe de wisa werimî, ku êdî bask pê ve nebûn da bifire:

- Ew Siyabendê menşûr ê Silîvî?

- Erê, apo!

Emer Axa mîna ku ji xewê bivecinige, hema ji şûna xwe hilfiriya û xwe avête Siyabend, ew hemêz kir û bi ber dilê xwe ve şidand. Axê geh giriya gah keniya û gahî jî hêsirên şahiyê barandin:

Institut Kurde de Paris

- Nexwe Siyabend tu yî, heh? Lawê min, wele êdî kuştina Mihemed Begê û anîna karwanê wî ji min re ecêb nayê dîtin!

Ji wê rojê û şûnde êdî navê Gurrî ji devê xelkê derneket, hemûyan jê re got Siyabend. Ne tenê Siyabend jî, vêca ew bû kek Siyabend. Herweha ew bû qehreman, bû fêris, bû palewan û bi mêrxastiyeke zêde nav û deng da.

Ew roj Emer Axa rabû colek pêz anî û hemû qurban da serjêkirin û gundiyên her sihusê gundên xwe vexwendin malê, li ber wan sifra goşt û birinca Qerejdaxê raxist. Piştî xwarinê gundî yeko yeko rabûn serçavê Siyamend maçî kirin, her yekê peruyek pê ve kir û ew bi diyariyên bi nirx xelat kirin. Ha wisa di nava çend rojan de nav û dengê Siyabend li tevayiya wê herêmê belav bû. Îcar çiqas axa, beg, maqûl û kesên xuyanî hebûn hemû rabûn çûn mala Emer Axa ew pîroz kirin û Siyabend jî bi tiving, şûr, rim, mertal û tiştên şerîne xelat kirin. Herweha ji bo ku Siyabend Begê hevalbendê dewletê kuştibû û xelkê ji bela wî xelas kiribû, kêfeke pir mezin jî kete nava xelkê herêmê.

Piştî hanîna karwanê Mihemed Beg bi çend rojan, Emer Axa encumana xwe civand û got:

- Gelî hevalan. Çaxê Siyabend nû hatibû vir, ji me wetirê ku ew trûdiyekî bi serê xwe ye û nanê gerrê

Institut kurde de Paris

ketiye zikê wî, ji mala xwe torqî bûye û bi van deran ve hatiye. Lê hewe gişan bi çavên xwe dît, ku Siyabendê me çi mêrxastiyeke mezin kir û bi saya wî em bûn xwediyê şerefeke bêhempa. Ez bi bawer im ku ji niha û şûnde êdî bi saya wî dê hemwelatiyên me qedrekî mezin nîşanî me bidin. Îcar ez difikirim nafikirim, ez nizanim ka ez ê çi qencî pê bikim? Gelo raya hewe çi ye?

Endamekî encumana Axê got:

- Axayê min. Ev peyvên ku niha te gotin, hemû rast in û di cihê xwe de ne. Siyabend peyayekî bêhempa ye, gelekî heyf e, xweşmêr e, mêrxas e û dilovan e. Divê ku em wî biparêzin û ji destên xwe bermedin. Ha te dît ku rojeke girantir li me qewimî. Ew, dê me ji tengasiyan felat bike. Hema ez bim, tu yê wî bi keça xwe Elîfê xelat bikî û bila mîna kurekî te di nava malê de bimîne.

Institut kurde de Paris

Endamên encumana Emer Axa hemûyan ew pêşniyar bê ku nîqaş bikin bi yekdengî pejirandin. Piştre Axê rabû çû gazî Siyabend kir, ew anî civatê:

- Kurê min! Ez divêm te bi keça xwe Elîfê xelat bikim. Tu ji vê yekê re çi dibêjî?

- Tu dizanî, apo!

Emer Axa ji Siyabend re qesereke vala kir û ji nû ve xemiland; bi xalî û xalîçeyên curbicur da raxistin, livîn û firaq û lazimatiyên malê hemû nû kirrîn û birin

tê de bi cih kirin. Piştre daweta Siyamend û Elîfê lidar xist. Gelek daholvan, bilûrvan û tenbûrvan civandin. Govendgêriyên bi nav û deng hatin, berbûriyên dawetê ew gundiyên wan sihusê gundan tev hazir bûn. Wek jimara rojên salekê beran û hogiç serjê kirin. Şahiya dawetê çil roj û çil şevan domand û di şeva dawîn de mehra Siyamend û Elîfê birrîn.

Êvarê dereng Siyabend çû qesra xwe, li oda raketinê çû li ser ciyê xwe rûnişt û xwe bi xwe fikirî, ramiya û got: Hey dinyayê... Felekê... Xayînê... Diruyê... Lihabê!.. Şelaqê... Melaqê... Te çi bi me kir û niha jî tu çi dikî? Te bavê me bir, te diya me kuşt û te em sêwî hiştin. Piştre te deva me kuşt û te birayê min Qeregêtiran ji ber çavên min wenda kir. Te ez kirim peyayê kesên nenas û te qirfên Elîfa keça Emer Axa jî bi min da kirin. Lê îşev niha tu ji min re dibêjî "berxê" û min hemêz dikî, didî ber dilê xwe û bi min re dikenî: tu vê qesrê dikî mala min, Elîfa keça Emer Axa jî dikî bermalya min! Ev çima tu wisa bê ser û ber î? Herê felekê, eger tu bi destên min bikevî bila ad li canê min şikestibin, ez ê te jî mîna Mihemed Begê peyayê dewletê ji ruyê dinyê paqij bikim. Ha tu vê jî jibîr meke; ez Siyabend im, Siyabendê Silîvî me, xwediyê tîr û kevanê zêr û zîvî me, siwarê xezala kûvî me, îro li vir im û sibê li devereke dî me.

Siyabend hêj di nava wê ava Firatê Bêlecûka wan xewn û ramanên xwe de noqavî dibû, ha ku dît derê

Institut kurde de Paris

oda wî vebû û jinekê Elîfe xatûn anî xiste hindur û şûnde vegeriya çû. Elîfê li ber derî şipya sekinî û li pawuka Siyabend ma, ku ew here bi milê wê bigire û bibe ser nivînan cem xwe bide rûniştandin. Lê belê Siyabend ne li Elîfê nerî, ne pê re peyivî û ne jî tu peyv gotê. Ha wisa dîsanê ew li xewn û ramanên xwe zivirî û xwe di kûrahiya dinê re bera nava pergar û xazên wê da. Yekcaran jî wî ew roja ku Elîfê ji nava baxçe dihat malê û ku çûbû pêşiyê da jê ramûsaneke şîranî bistîne, lê peyvên bêmirêz pê kiribûn anîn bîra xwe. Bi wî awayî Siyabend li ramanên xwe domand û Elîfe jî li ser nigan ma sekinî û li pawuka wî ma.

Di wê hingê de tarîtiya şevê giraniyeke tewş daxiste odê û her ku çû kevsa xwe li wan ne xweş kir. Heta wisa demeke dirêj bihurî, êdî bû nêzî sibehê û dîkên nîvê şevê li herduya xulxulandin.

Sibe êdî nêz bûbû, ne hisek û ne jî pisek ji Siyabend derdiket. Elîfe xatûn xwe bi xwe fikirî: Ez li ser nigan qerimîm, ava reş bi jinuyên min ve hat. Ev zilam nabêje min were rûne, ne bi min re dipeyive û ne jî li min dinêre. Ez ê niha tiştekî jê re bêjim. Heke bû, ji xwe rind e. Heke na, wî ez di ber xwînê de neanîme, ez ê vegerim herim malê û têkevim nava ciyê xwe rakevim.

Kalê Pîr zana û serwextê bi dîroka Siyabend bû û wî ew hîç ji çav nedikir. Ewçax wî temaşe li Siyabend û Elîfê dikir, her çiqasî dizanibû ku dê encam bibe çi

jî, lê dîsa li pawuka pêlên bûyerê dima sekinî. Ha ku dît carek ji nedî ve Elîfa keça Emer Axa kîsikê şermê ji ruyê xwe çirand, meşka ku werpixî bû dirrand, fihêtiya xwe wenda kir, geh ji qehran gahî ji agirê evîna Siyabend pûşiya li ser ruyê xwe bilind kir û berê xwe da lawikê Silîvî:

*Hêêê*

*Elîfê digo:*

*Lo lo lo lo lo lo lo Siyabendooo*

*Ay lo lo Siyabendo dilê min divêêê*

*Şev ê li min û te hatiye nivê şevêêê*

*Ez î Elîfê me*

*Qîza Emer Axê xwediyê 33 gundê quntara çiyê*

*Tu bala xwe bidê*

*Bejn û bala min zirav e, nola sipîndareke ji Çemê Hewrêêê*

*Û tu li zendê min ê kanî gewrî bozî teze dinerî nola xiyarê Edenê?*

*Tu li singa min dinerî*

*Nola perçê cemedê, qeşêêê?*

*Û tu li diranên min dinerî*

*sipî ne, nola birinca Qerejdaxê*

*ku 24 saeta meriv bavêje ber mîrata dingêêê*

*Û şeve li min û te hatiye nivê şevê!*

*Tu ji min nakî tu pirs û tu gotinê*

*W`ez im, w`ez im, w`ez im, w`ez im, hoyoyoyo yoooy!*

*Siyabendo wîîî.*



Institut kurde de Paris

Elîfe xatûn bi wan gotin û galgalên xwe, Siyabendê Silîvî ji xewna raman û xeyalan veciniqand û bi hêviya bersîvekê ziloq bû lê nerî. Lê Siyabend dîsa wê roja ku çûbû ser riya Elîfê da ramûsanekê jê bistîne û wê gotibû "gurriyo, ew satila ku tu av jê vedixwî diherime" anî bîra xwe û li hemberî wê zêdetir xezeba dilê wî rabûn. Lê diviya ku Siyabend bersîva Elîfê bida û hunerê xwe jê re eşkere bikira. Eger ne wisa bûya, wî ew yek ji xwe re kêmasiyeke mezin didît.

Kalê Pîr dîsa şahidê wan bû û timî li Siyabend guhdarî dikir. Lewra wî her serpêhatiyeke Siyabend li rûpelên dîrokê dinivîsand û dikir malê gelê xwe. Li gorî gotina dîrokzanê Kal, Siyabend bi qêrîneke şewat berê xwe da Elîfê:

*Siyabend digo:*
*Lê lê Elîfêêê*
*Ez ne Siyabend im, ez Gurrî me*
*Gurriyê wê dera hanêêê!*
*Û tê bîra te, gava te digo:*
*"Gurriyo, çepelo, heramo, mirtaro*
*tu yê biherimînî satila min î avê!"*
*Min ji te re digo:*
*"Bejna min zirav e, tak rihana li takî*
*Û şîn dibe daîm li hawakî*
*Qerara qesema Xwedê li can û cesedê min ketibê*
*Ji niha û ne dereng*

Institut kurde de Paris

*wê ramîsanê te li cem min bên ne bi perakî!"*
*Ma ne Elîfê*
*de here malê*
*tu dê û xwehê min bî*
*Min tu navê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Siyabend ew şev bê ku têkilî Elîfê bibe, di cih de wê berda û mehra xwe ji ser wê averê kir. Elîfe xatûn piştî ku berdana xwe ji devê Siyabend bihîzt, hema di şûna xwe de rûnişt û dev bi girînê kir, geh jî bi Siyabend ve ket hêvî û zariyan da ku hersê kevirên xwe bi paşva bikşîne. Lê belê wê kir û nekir Siyabend ne destûr da ku ew here ser nivîna wî rûne û ne jî hersê kevirên xwe şûnde girtin. Li ser wê yekê herduyan li ber hev da, niqaş kirin, Elîfê hêvî û zariyên xwe zêdetir kirin. Lê êdî Siyabend wê tifa ku avêtibû erdê, nema karibû şûnde dalêse. Elîfa Axê dema ji bawerî ket ku Siyabend nema êdî wê dike bermalya xwe, bi dengekî kelogirî got:

- Siyabend. Heçî Kurd in, heta ku xirabiyeke mezin ji jinên xwe nebînin, zû bi zû wan bernadin. Û jinên ku têne berdan jî, her kes dizane ku wan xirabî kiriye. Îcar te çu xirabiyeke min nedîtiye ku tu niha min berdidî. Tenê ew roja ku tu hatibûyî pêşiya min, min ew peyv ji te re gotibûn. Ew jî pir normal e,

Institut kurde de Paris

lewra hingê ez hêj qîz bûm û nebûbûm namûsa tu kesî. Heke ne ez bûma, kîjan qîz bûna jî wê hêj zêdetir ji te re bigota. Lê ez hêvî dikim...

- Elîfê. Çu hêvê, mêvî ji min neke. Gotineke pêşiyan heye: "Jin û mêr, tevr û bêr!" Îcar hirmet eger tu bibî jina min, çi cara ku tevr û bêr bêne cem hevdu, dê ew "satila heram" têkeve ortê û wê demarên mêrantiyê di laşê min de bibin potik. Elîfê şûna birînan sax dibe, lê ya gotinan sax nabe! Hirmet rabe here mala bavê xwe, tu bi xêr û ez bi silamet.

Elîfe rabû sernigan û derî vekir ku derkeve, bi umîda "belkî" Siyabend gazî wê bike li paş xwe vegeriya, lê vegera wê lihaş çû, tu feydê neda. Wê, mîna ku xatirê dawîn ji Siyabend bixwaze sê caran serê xwe rakir-daxist û ji odê derket çû. Bi derketinê re tayekê ew girt û ricifî, laşê wê giran bû, mîna nexweşekî ku heft salan li erdê bimîne ji serî heta nigan tevizî û bi zorê xwe gihand malê, çû kete nac ciyê xwe. Ew şev dimya Elîfê wêran bû û asîman bi ser serê wê ve hilweşiya. Ji ber ku ew çil roj bûn wê hewqas ji xwe re dinyayeke nû ava kiribû û tê de hêlîneke nû çêkiribû, şûyekî bêhempa bi dest xistibû, tev rûxiyan û ew bû nola jinebiyekê.

Bêguman ji berdana jinan re jî hin destûr û pêbestene rizî hene ku jin xwe pê heqdêr bikin. Lê berdana jinekê di şeva pêşî de, bi xwe re rûreşîne mezin jî tînin holê. Ew jinên wisa di nava xelkê de

Institut kurde de Paris

rezîl û riswa dibin, heta mirinê jî xwe di nava xelkê de kêmik dibînin û serê wan hîç ranabe.

Tu nabêjî, Emer Axa ew şev ji kêfa ku Siyabend bûbû zavê wî, heta sibehê ranakeve û di fikr û xeyalên xwe de geh kelehekê xirab dike, gahî yekê ava dike û hin caran jî li hember zordestan haziriya şer û cengên giran dike. Yekcaran jî ew di civat û caxiyên maqûlan de bi zavê xwe dipesine û pê xwe serbilind dike, fortên xwe dide û qurmên simbêla badide. Hêj sibe zû Axe ji nava ciyê xwe derket û çû ku here derve, dît wa keça wî Elîfê di nava ciyê xwe de ye, mîna ku cêrek ava cemidî pê ve bê rijandin ji xwe re sar bû û şaqiz ma lê nerî. Îcar piştî ku dinya wê şevê bi ser serê Axê ve hilweşiya, hêdîka gazî kir:

- Keça min. Elîf, lawo te xêr e? Çima tu hatî?

Elîfê ji şerma ruyê xwe hema digot erdê biqelişe û ez di te re biçim xwarê, bersîva bavê xwe neda. Lê bav wê bêgav hişt ku bipeyive. Îcar bi dengekî nizm ê ricfokî got:

- Zavê te hîç guh nedan min û di cih de jî ez berdam!

- Keçê, na naaa? Sedem çi bû?

Piştre êdî Emer Axa kir û nekir devê keça wî qul nebû û xeberdan tê re derneketin. Lê Axe xwe bi xwe peyivî û geh jî berê xwe da keça xwe: Ev Siyabendê



Institut kurde de Paris

gurrî peşkek ava reş e û li min hatiye hesikandin. Bi xwedanê şev û rojan dikim, ew qerdê min e û wê taliya talî serê min di av ra jî bike. Îcar ka ez ê çewa xwe jê xelas bikim? De lawo Siyabendo, hey bêmirado, çi heqê te hebû ku te bextê keça min reş kir?

Emer Axa derket derve, çû ku here cem Siyabend û sedemê berdana keça xwe bipirse. Lê dît ku wa Siyabend karê xwe û çûnê dike; Lahorê Qetlê avêtiye situyê xwe û teng û berê Deybilqiran dişidîne. Axê heçweku bi berdana keça xwe nehisiyabe, bang kir:

- Kurê min! Siyabend, ev tu hêj nû şevek e zewicî yî. Ma vê siba zû wisa tu rabûyî dê bi kur ve herî?

- Emer Axa! Xwe li xişîmti dameyne! Ez ne zavê te me û ji cem te jî diçim!

- Wê, wêh! Kurê min, ev çi gotin e?

Siyabend ji çûnê re amade bû û dê bi temamî ji cem Emer Axa biçûna devereke din. Lê wê biçûna kur? Wî bi xwe jî bersîva wê pirsê nizanibû.

Emer Axa bi Siyabend ve ket hêvî û zariyan, da ku wî ji çûnê vekişîne. Lê her çiqas bi devê xwe digot "Siyabend meçe" jî, erê bi dilê xwe digot: Ma rojek heye ku ez ji torra viyê gurrê bifilitim? Ew hêvî û zariyên Axê yên ne ji dil çu tîn li Siyabend nekirin. Hema rabû li hespê xwe siwar bû, xatir ji Axê xwest û ji ber kêmasî û şaşiyên xwe ve jî lêborîna li xwe jê

hêvî kir. Axê got:

- Kurê min. Madem tu yê çûnê yî, qenim bisekine heta ji te re hin xwarin û tişt hazir dikim.

Emer Axa rabû ji Siyabend re nan, penîr, nanê kade, mewîj, bastêq, helîl, şaran û hinek jî dims xist eyarşîrkekî. Ew tişt hemû xistin têrrekê û avête ser pişta mihîna xwe, gema wê da destê Siyabend û kîsikek jî tije zêr danê, got:

- Lawo, min nediva ku tu herî. Nexwe bila ev mihîna min jî diyariya te be.

Siyabend hespê xwe ajot, mihînê li dû xwe destkêş kir û berê xwe da rê ber bi bakûrê rojhilatê ve çû. Ew çû ka çiqas em nizanin, ji dûr ve çavên wî bi çiyayekî bilind ketin ku êdî jê bilindtir çiya nebûn, xwe bi xwe got: Hebe tune be ew çiya Sipanê Xelatê ye! Û rast berê xwe pê ve da û ajot...

Di wê navê de çend roj bihurîn, êdî ku pêjna Siyabend li gundê Emer Axa nehat û ew li oda mêvanan nehate dîtin, di buwara wî de pir tiştên bêxwê hatin gotin.. Hinekan got: Qey Siyabend nû zewicî ye û destên wî ji Elîfê nabin, lewra dernakeve der. Hinekan jî digot: Siyabend ne zilamê wê yekê ye ku xwe bike dîlê jinekê û di hinduru de bimîne! Ha wisa ew galegal li nava xelkê belav bû û her kes pê axivî. Lê piştî ku Elîfê li mala bavê xwe hat dîtin, êdî mesele

Institut kurde de Paris

eşkere bû û hate zanîn, ku Siyabend wê berdaye û ji cem Axê jî çûye. Îcar piştre hîn bêtir tişt di buwara Elîfê de hatin gotin û di buwara wê de duezmanî hate kirin. Hinekan got: Qey Axa bi zorê keça xwe dabû Siyabend, keçikê ew nediva! Hinekan digot: Na, wele hicraneke Elîfê hebûye û Siyabend jî wê berdaye. Ekene tu kes wisa beredayî jina xwe di şeva pêşî de bernade! Werhasil Elîfa keça Emer Axa bû lêpoka ser zimanê xelkê û mîna qajikê bittmikan di devê her kesî de hate cûtin.

Belam çaxê Elîfê ew peyv û galgal di buwara xwe de dibihîztin, êşa evîna reş roj ji rojê zêde lê girantir dibû. Jixwe kula berdanê bûbû mîna girêkekê û ketibû ser nîvê kevçika dilê wê. Ha wisa her ku çû, Elîfê bû nexweşekî raht û di nava livîna mirinê de pîkol kir.

De îcar wek msela ku dibêjin: Çû zeman hat zeman serê Emer Axa hê ji nû ve kete nava xax û torên giran. Piştî çûna Siyabend, rûmeta Emer Axa hinbihin di nava xelkê de kêm bû. Ew wisa bêaverû bû heta ku axa û maqûlên herêmê silava xwe jê birrî û çûn û hatina mêvanan ji mala wî kêm bû. Jixwe gundiyên wî tev jê dan sitû û li pawuka hilanîna dexl û debrên xwe man ku ji cem wî herin. Di paşiya payizê de her rojê çend mal koça xwe bi rê xistin û rabûn ji gundên Axê çûn. Di nava çend mehan de Emer Axa ma bi tena serê xwe û birayê wî Cinan Axa. Bi wê bûyerê

Institut kurde de Paris

peya û mêrxasên Cinan Axa jî bê moral bûn û teko-teko dest ji serbaztiya xwe berdan û çûn malên xwe. Jixwe Elîfa keça Axê bû mîna roviya ristê û heliya, zermihî û di nava livîna xwe de bû mîna rewtekî hişk û ji rengê mirovan derket. Ew êş wisa lê domand, doman heta ku rojekê ji nişka ve serî da haziran û xwe gihande nava refên bêmiraza.

Piştî çûna Siyabend serê Emer Axa roj ji rojê pirtir kete nava teşqele û gelşên giran. Her ku diçû sosretên girantir dest pê dikirin. Lewra ew tiştên heta wê demê tev "lêlê" bûn û dora "lolo" jî hêj nû hatibû. Lewra dewletê ew jibîr nekiribû, lê piştî çûna Siyabend ji wir, li pawuka kêmtirketina Axê nitirî bû, heta ku roja wî bihata, fena masiyê li bejê biperpitiya û di nava xelkê de rind bêrûmet biba, da hêj leşkerên xwe bişîne ser wî.

Roja dewletê êdî hatibû serbiserê, ku tola baca xwe û ya kuştina peyayê xwe Mihemed Beg ji Emer Axa bistîne. Şevekê leşkerekî giran rabû û kişiya ser Emer Axa. Axê û birayê xwe dest hilnedan û di eynî şevê de hatin dîlkirin; her yekê destên wî xistin kelemçê, nigên wan xistin qeydê û situyê wan jî xistin lelê, ew birin dadgeha leşkerî. Di bîstikekê de Emer Axa û birayê wî Cinan Axa bi sêpiyê ve daleqandin. Piştre jî dewletê dest danî ser mal û gundên wan û hemû dûbelgêr kirin.

Institut kurde de Paris

## - V -

Rê pir hene û rêwî jî gelek in. Çi dema rêwiyek bi riyeke nenas ve diçe û li duriyanekê yan li sêriyanekê rast tê, ji xwe re şaş dimîne ka dê bi kîjan riyê ve here. Ha wisa ew rêwî dudil dibe û ji rêwîtiya xwe disilike. Lê pirê caran kîjan riya ku pir zêde hatiye şixulandin, ji mirov re bê teşqele tê xuyakirin û hêsatir dixuyê.

Rê eger rê be bila qe dûr be, bila hemû bi fetl û gerr, kaş û newal û gelî û zinar be. Eger mirov tê re here, dê mirov bigîje amaca xwe û li aveciyekê bihêwire. Û eger rêwî jî li rêwîtiya xwe bi ad be hem jî eger bi xwe bawer be, bila hîç rê ne tu rê be û bila tev çol û çiya be, bila tije daristan û newal û zinar bin. Hingê rêwî diçe û li pey amaca xwe dikudîne, heta ku digîje devereke ku lê bi cih dibe û karê xwe sererast dike.

Siyabend ji rêwîtiya xwe re gelekî dilgerm bû û ba-

Institut kurde de Paris

weriya wî jî pir pê dihat. Ew, siwarê hespekî wisa xweşbez bû ku tu rê xwe li ber wî nedigirtin. Lê mihîna li dû, carna ew naçar dihişt û riya wî dubare dikir. Çaxê ku berê xwe dabû rê û ber bi bakûrê rojhilatê ve diçû, nizanibû ku dê here kur. Lê tenê wî navê Sîpanê Xelatê bihîztibû, ku çiyayekî pir asê ye û xwe ji mêrxasan re dike wargeha xwînê. Wî jî îcar dixwest ku here xwe bavêje hemêza Sîpên da karibe jiyaneke hîn xweştir bibîne.

Siyabend di rêwîtiya xwe de pir çiya didîtin, lê hemû jê re piçûk dihatin xuyakirin û wî qîma xwe bi wan nedianî. Lê gava çavên wî li çiyayekî bilindtir ê qirasetir ketin ku serê wî mîna hêkekê fîq-sipî dike û ji hemû çiyayên li herêmê bilindtir e, rast berê xwe da bi aliyê wî ve û hespê xwe ajot.

Sîpanê Xelatê, ew çiyayê bi navudeg ê wargeha bêmirazan, taca xwe ji berfa sipî gerrandibû û li hawîdorê xwe mîna qilçik û serbelgên zêrîn di kaş û newalên xwe de deqerên reşayiyê berjêr daxistibûn. Wî bi wê taca xwe ya gewherî hunera xwe li çiyayên hawîdor dikir û wan ji xwe re hempa û babet nedidîtin. Lê belê çiyayê Nemrûd bêvila xwe jê re danedixist. Ji ber ku ew xwe wargeha dîroka Kurdan dizane û xwe bi Nemrûdê Navdar payedar dike. Ji ber wê dîtinê, Çiyayê Nemrûd her roj sê-çar caran gazî çiyayê Tendûrekê, yê Agiriyê Mezin û yê Piçûk,

Institut kurde de Paris

yê Makuyê, yê Qotirê, yê Başetê, yê Mengeneyê, yê Artosê, yê Meretoyê û yê Xaçereşê dikir ku ew jî li hember Sîpên hebûna xwe bidin diyarkirin û xwe keleha mêrxasan bidin nasîn. Lê çu deng ji wan dernediket û bizav nedikirin, lewra dizanibûn ku dê Sîpanê Xelatê bi xwîna Siyabendê Silîvî û ya Xecêya Şikakî ji nû ve şan û şerefa xwe ya dîrokî bivejîne û xwe keleha bêmirazan bide penîkirin. Ha wisa hêj ew çiya bi stuyên hev ve rapeçikî bûn, Siyabendê Silîvî rojbaşî da Sîpanê Xelatê û xwe avêt tor û bextê wî.

Lawikê Silîvî ji gihandina Sîpên re, pir bi kêf bû. Wî, di gelek civatan de jî seh kiribû çaxê ku li mirov dibe pêsîrtengî, mirov xwe davêje çiyayekî asê. Îcar jê re tenê ew çiya mabû ku wî biparasta. Ekene cihekî ku wî bisitirandina jê re nemabû. Lê encama wê baweriyê jê re ne diyar bû, ka Sîpan jî dê wî biparêze yan serê wî di ava sar da bike.

Siyabend çaxê giha quntara Sipanê Xelatê, pê ve hilkişiya û çû. Lê her ku berjor çû berf zêde dibû, qalindtir dibû û serma jî pirtir dibû. Berfê li bilindahiyê kurşe girtibû û nigên hespê wî, yên mihîna bi bar tê re nediçûn xwarê.

Carek ji nedî ve Siyabend bala xwe dayê, ku wa ji dûr ve reşayiyek dixwiyê. Rast berê xwe pê ve kir û hespê xwe ajot çû nêz, dît ku yekî li ser berfê zibil reşandiye û di navê de dav vegirtine, da çûk û kotir werin ser reşayiyê û têkevine davan. Çaxê Siyabend

Institut kurde de Paris

ew tişt dît, xwe bi xwe keniya: Elawekîl ewê ku dav vedane, mîna min ê caran kiriye, ku min jî di zarûktiya xwe de pîşkên wisa dikirin!

Xwediyê davikan çend sed ji davên xwe dûr, kozikek ji berfê çêkiribû û xwe tê de veşartibû, li davikên xwe temaşe dikir. Dema wî dît ku wa siwarek hate ser davikên wî, lê deng kir:

- Siwarooo! Ji davên min dûr here. Lawo, qey xwîna te ketiye çavên te? Ma tu ji Xwedê jî natirsî? Min hewqas zibil reşandiye da çûk bêne ser, tu dikî wan bidî firandin.

Siyabend dengê zilamê davvanî hîç nebir xwe û hespê xwe ajot. Lê bi gazîkirina wî pir qehirî, hêrsa wî rabû û Lahorê Qetlê ji situyê xwe anî xwar û xwe bi xwe got: Yekî mîna Mihemed Begê hevalbendê dewletê û mezinê keleşan nikaribû dengê xwe li min hilde û li ber min bipeyive, îcar ev sertûrkê hanê gefan li min dixwo? Zilamê davvanî hey di kozika xwe de qêriya, çêr û dijûn bi Siyabend kirin, lê Siyabend hîç derng nekir û bersîva wî neda. Wî, dixwest ku ew ji kozikê derkeve bê nêz.

Kalê Pîr ê çavdêrê dîrokê ewçax li jora Sîpên li wan temaşe dikir û dixwest ku encama wê bûyerê jî bike malê gel û bizanibe ka dê çi biqewime çi neqewime. Li gor agahdariya Kalê Pîr, zilamê davvanî ji kozika xwe derket û êrîşê Siyabend kir:

Institut kurde de Paris

*Hêêê*
*Dilê min dibê*
*Qeregêtiran bi sê denga bang dikî:*
*Lo lo siwaro, dilê min dibê*
*Ma tu natirsî ji xewfa Xwedêêê*
*Bi Xwedê*
*Min çûkên xwe ji dora heft gundan anîne ser xefikê*
*Ku bifirin herin Yemenê*
*Ji Yemenê tu yê bînî ser hebikê*
*Li min, li min*
*Li min, li min*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Siyabend guhên xwe neda zilamê davvanî, qenim bi aliyê wî ve jî xwar nebû, hema hespê xwe ajot çû ser zibla belavkirî ya li ser berfê û çivîk ji berê hemû firiyan.

Zilamê davvanî bi firandina çivîkên xwe pir qehirî, hêrs bû û ji kerba muyên laşê wî tîk bûn û di kincên wî re derketin der. Wî yekê nekir didu hema hestiyekî dirêj ji ber pişta xwe kişand û çû li ber Siyabend sekinî çend derb lê xistin. Siyabend pê keniya:

- Lawo ji xwe re bisekne, tu nikarî şerê min bikî. Îcar wî hestî deyne erdê, ez ê jî şûrê xwe deynim, were ez û tu bi navê. Ewçax kî ji me kî danî erdê, bila ew serê yê din bi şûrê min jê bike.

Bi wî awayî herduyan raya xwe kirin yek û li ser



Institut kurde de Paris

wê berfê bi nava hev girtin, hevdu birin û anîn. Lê Siyabend bala xwe dayê ku teqla wî giran e, peyayekî têr jêhatî ye û bi navê zor dikare pê. Lê hev birin û anîn. Hema carekê Siyabend ew hilda û serpişt li erdê xist. Siyabend destê xwe avêt Lahor ku serê wî jê bike, zilam jê pirsî:

- Ero, tu ne Siyabendê Silîvî yî?

Bi wê pirsê, Siyabend ji xwe re sar bû û teqlên wî sist bûn, ziloq bû û lê nerî. Jixwe hêj pêşî jî dema ku wî ew hestî ji ber pişta xwe kişandibû û pê çend derb li Siyabend xistibûn, lê ketibû gumanê. Çimkî dema ew û birayê xwe hêj zarûk bûn, wan herdu çîloqên deva xwe ji xwe re kiribûn mîna ço û timî dixistin ber pişta xwe. Dema wan bi zarûkan re şer dikir, ew çîloq ji ber pişta xwe dikişandin û pê li zarûkan dixistin. Siyabend xwe bi xwe got: Gelo ev zilam wê ne birayê min Qeregêtiran be û ev hestî jî ne ew çiloqa deva me be ku heta niha li cem wî mabe? Ha bi wê gumanê Siyabend şûr ji destên xwe avêt, dîsa li serçavê wî nerî û xwîna wî jê re keliya, rind bala xwe dayê ku dirûfet eynî mînaye yê wî, got:

- Kuro, ma tu jî ne Qeregêtiran î?

- Erê!

- Weyla pepûk û dîl ez im. Niha min dikir serê birayê xwe jê bikira!

Li wê bilindayiya Sîpanê Xelatê, Siyabend û birayê

Institut kurde de Paris

xwe Qeregêtiran hevdu nas kirin. Hem jî di çi rewşê de? Herdu bira dikirin ku yek ê din bikuje. Lê felekê ewçax xwe pîroz kir û zû deriyê tifaqan li ber wan rada, nehişt ku siqûmatek bê serê wan. Piştre rabûn xwe avêtin hemêza hevdu û bi ser hev ve giriyan, kirin îskeîsk, zarûktiya xwe anîn ber çavên xwe; li şerpezetiya xwe fikirîn û ji bo kula wendabûna ji hev bi demeke dirêj gelek ponijîn û geh jî hêstirên şahiyê barandin. Wan, ew şerên ku bi zarûkan re kiribûn û wê belengaztiya ku ji destên ap û jinapan dîtibûn li ber çavên xwe kirin mîna jîndariyeke nû û hê bêtir ponijîn. Lê tişta ku zêde li zora herduyan jî diçû; li wî welatê xerîb û li ser wê berfa Sîpên heke yekî yê din bikuşta!.. Erê, ewçax felekê bi wan re alîkarîyeke hindik kir û herduyan zû bi hev da hisandin, deriyê hesinî li ber kuştina wan rada. Piştre Siyabend rabû bi destên birayê xwe girt ew rakir ser nigan û ruyê wî, eniya wî maçî kirin, geh jî bira ruyê wî maçî kir. Piştî şahiyeke zêde û kurt Siyabend jê pirsî:

- Birayê min! Halê te, rewşa te, karê te? Hey malikmîrat, ev çi bi te hat hema tu wisa bê ser û ber bi yek derbê wenda bû û çûyî?

- Ma çi halê min e, keko? Ez nanoziko ji ap û jinapê re dişixulim!

- Niha tu li kur dimînî?

- Ez li Elcewazê, qaşo li nik apê xwe dimînim. Lê jinapeke min heye Xwedê guran jê biparêze, deh tene zarûkên wê hene. Ha ew her roj xirarek tije zibil dike

û dide pişta min, min dişîne vir. Ez wê ziblê li ser berfê direşînim û di nav de dav vedidim , diçim jê dûr xwe dixim kozikê û disekinim heta êvarê. Eger çûk, yan kotir riya xwe şaş bikin werin ser ziblê têkevin davan, ez wan ji zarûkên jinapê re dibim malê. Lê roja ku ez tiştekî negirim, êvarê şîv nade min.

- Qeregêtiran, ez û tu birayên hevdu ne û ji berê darekê çêbûne. Êdî ez te bernadim, em ê bi hev re bigerin û li jiyaneke xwe bidomînin. Em herin kur, em ji hev naqetin, em ê bi hev re bikin û bi hev re bixwin. Birayê min, eger mirov bi dest û pê be û ne nexweş yan seqet be, divê ku mirov ji heqê xwe bête der. Te dît demekê ez û tu zarûk bûn, lê niha em bûne zilam. Wek mesela ku dibêjin: "Devî zû dibin dar, xwelî li merivê bêwar." Îcar ji me re warek divê , da em tê de bisitirin.

Institut kurde de Paris

Dilê Siyabend pir bi birayê wî êşiya, rabû heke nan heke pêxwarina ku di têrra li ser pişta mihîna Emer Axa de mabûn hemû derxistin û danî ber birayê xwe Qeregêtiran. Piştî xwarinê Siyabend got:

- Birayê min, êdî em ne zarûk in, em mezin in. Ez ê niha te bibim bajêr, ji te re kincine nû bikirrim, ji te re şûrekî, rimekê û mertalekî jî bikirrim. Jixwe va mihîneke zêde bi min re heye, ew ya te ye. Em ê li dinyayê bigerrin, devereka xweş ku me dît em ê lê rûnin û ji xwe re debarekê bikin, bizewicin jî.

Siyabend rabû ew davikên ku birayê wî ji bo çûkan vegirtibûn, hemû qetandin. Piştre li hespê xwe siwar bû, birayê xwe jî li mihînê siwar kir û ajotin, herdu çûn, rast berê xwe dan bajarê Elcewazê. Li bajêr Siyamend pêşî çû ji birayê xwe re kincine nû kirrîn û lê kirin. Piştre jî çû jê re şûrekî, rimekê û mertalekî kirrîn. Herdu siwar bûn ji bajêr derketin çûn li deverekê peya bûn û li hev rûniştin, şêwr û mişawretên xwe kirin. Siyabend got:

- Birayê min. Divê ji niha û şûnde em bi rêk û pêk bilibitin û timî bi tevdîr bin. Ekene, em ê zû bitterpilin. Mêzek, ez bi temenê xwe ji te mezintir im û gelek siqûmat bi serê min ve hatine. Heke mirov nexwendibe jî, lê eger mirov pir geriya be û tecrubeyên mirov çêbûbin, mirov pir şareza dibe. Gotineke pêşiyan heye: "Roviyekî geriyayî, çêtir e ji şêrekî negeriyayî." Niha tu yê soz bidî min, ku tu çu tişt bê xebera min nakî.

Qeregêtiran, ew gotin û şîretên kekê xwe hemû pejirandin. Piştî wê yekê kêfa Siyabend pir hat, wisa kêfxweş bû ku kêfa wî kêfê diafirand; pişta wî zexm bûbû û şûrkêşekî wî yê nû çêbûbû. Ji wê rojê û şûnde êdî Siyabend pixavê ji kesî nedikir, riya xwe li her kesî didît û baweriya wî pê gelek zêde çêbû. Lê dîsa jî wek mesal ku dibêjin: Mirovê xerîb kor e, nizanibû ku dê ew û birayê xwe bi kur ve herin. Hema kîjan riya ku hespê wî Deybilqiran berê xwe pê ve dikir,

Institut kurde de Paris

gema wî berdida û birayê wî jî li dû mihîna xwe diajot.

Birayê Siyabend zilamekî gir ê qirase yê bi destupê û edilî bû; gelekî li hevhatî bû û çavreş, birûkevan û pozberanî bû. Zend û bazuyên wî mînabûn mîrkutan û tiliyên wî her yekê bihostek dirêj bûn. Eniya wî pir fireh bû û timî du demarên şîn tê de xwe hildiavêtin. Awirên çavên wî mînabûn şûrekî tûj û zû mirovan ji bizavê dixistin. Simbêlekî reş ê qeytanî lê bû, ku her palikek mîna rêsiyekî gir û qalind bû. Dengekî berz lê bû çaxê ku ew diqêriya, fêrisan jê saw digirt û ji tirsa wî kesekî xwe li ser nigan ranedigirt.

Siyabend û birayê xwe li welatê Serhedê geriyan, bi qederê salek, didu çûn û hatin, ha li vir ha li wir geşt û seyran kirin û li kêfa xwe nerîn. Wan bi wî hawayî hinek ewêziya wê şerpezetiya ku di zarûktiya xwe de dîtibûn vegerandin. Ew li nava eşîra Cibran, Hesenan û Heyderan pir geriyan; li çiyayên bilind û zozanên hênik bûn mêvan. Dema ew diçûne kur, xelkê pir qedr û qîmetê dida wan û ew bi xwarinên xweş diezimandin; ji wan re kar û berx serjê dikirin. Ha bi wê xwedîkirina rind Siyamend û Qeregêtiran rengê xwe zû guhartin; gelek spehî bûn, rû û bevzekî xweş hate wan û hinek mû jî di serê Siyamend de şîn bûn.

Lê belê îcar Siyabend timî li zewaca xwe û ya birayê xwe difikirî. Diviya ku ew bibûna xwedîmal, xwedîjin û bavê zarûkan, dest bi jiyaneke nû bikirna.

Institut kurde de Paris

Lewra timî xwe bi xwe digot: Divê ez û birayê xwe bizewicin û jinên me hebin, mala me hebe. Em jî mîna her kesî bibin xwediyê malê û bavê zarûkan. Heke em nezewicin, kes çu bawerî bi me nayine û rûmeta me jî di nava xelkê de kêm dibe...

Ji wê rojê û şûnde êdê raman û sêwirandina Siyabend tev bûn zewac û avakirina malekê ji xwe û birayê xwe re. Herdu rabûn û berê hespên xwe dan rê, qesda Zozanê Şerefdînê kirin. Ew çûn gihane Zozên, li wir bûn mêvanê zilamekî ku du heb dubaneyiyên wî hebûn. Ew şev mazûrvanî ji wan re berxekê gurand, şîva wan qelîsêl çêkir û sîrmastkê bera ser da. Piştî şîvê şewbêrka xwe gihandin dawî û herdu bira li binê konê mêvanan serê xwe danîn û raketin.

Ew şev ka çi qeder Siyabend raket raneket, wî xewnekê dît û ji kêfa re şiyar bû, nema êdî xewa wî hat, heta sibehê şiyar ma. Bi kazima sibê re Siyabend birayê xwe ji xewê şiyar kir, ku rabin herin û hem jî mizgîniya dîtina xewneke pir xweş dayê. Lê mazûrvanê wan nehişt, ku bê xurînî ji binê konê wî derkevin rê. Û ji wan re rûnê nivişk, hingivê Berwarê, şoyek penîrê teze, duwazdeh hêkên kelandî digel dêzek nanê sêlê anîn û danî ber wan. Piştî xwarinê jî têra çend rojan xwarin û pêxwarin da wan û herdu bira rabûn xatir ji mazûrvanê xwe xwestin, li hespên xwe siwar bûn û ketin rê ajotin.

Ew xewna Siyabend ji Qeregêtiran re bûbû kulek û



Institut Kurde de Paris

ketibû ser dilê wî, tebat nedikir:

- Keko, te ew xewna xwe negot!

- Ha birayê min, Qeregêtiran. Îşev min keçekê di xewna xwe de didît. Lê ya xaliqo, pirî ku ew keç delal û nazdar bû, mirov jê re hişmetheyran dima! Îcar ez bi navê wî Xwedanê şev û rojan dikim, heke ez li kur wê keçê bibînim, ez ê wê nas bikim û ez navê wê jî dizanim. Îcar birayê min ji wê keçê pê ve li dinyayê jin li min heram bin. dê û xwehên min bin ku ez bi yeke din re bizewicim.

- Keko, xwedêhebîna navê jinbira min çi bû?

- Va ez ji te re dibêjim, min wê dît û navê wî jî "Xecê" ye. Îcar ad li canê min ketibe, heke ez sed û bîst û yek salan jî bêjin bimînim, heta ez wê keçikê nebînim, ez li tu deverê qûnçûçkî nabim. Lê heke min wê dît eger bi xirabî be wer bi zorê be, ez ê wê ji xwe re bînim.

- Ma mirov dikare li gorî xewnan bilibite?

- Birayê min. Hema bêje, min navnîşana wê jî di xewna xwe de dîtiye. Keçik li Rojhilata Kurdistanê ye. Lê welat bi xwedî be; ji xelîca Faris hetanî Behra Xezerê Rojhilata Kurdistanê ye. Îcar jixwe va em bi riya xwe ve diçin. Em ê herin û pirsa keçên di wî dirûfî de jî bikin. Hey wê xortekî evîndarê keçên bedew li me rast bê, ku dizane keçên rind li kîjan herêma welêt hene!

Siyabend û Qeregêtiran berê hespên xwe rast bi

aliyê Rojhilata Kurdistanê ve dan û ajotin. Di rê de ew laqê kîjan xortekî dibûn, pêşî Siyabend jê pirsa keçên delal dikir, ka li kur hene? Îcar rojekê ew di riya xwe de pêrgê xortekî dilikî bûn. Siyabend jê pirsa keçên delal kir. Xort gotê:

- Bira. Heke tu li keçên delal digerî, hema li tu deverê nesekine û rast here nava eşîra Şikakan. Dibêjin keçên Şikakiyan, malxiraba pirî ku delal î gewre ne, horiyên bihişta sofiyan jî li ber wan fedîkar dimînin.

Institut kurde de Paris

# - VI -

Erê rast e ku mirov bi pirsê diçe Qudsê, belkî digîje qursa rojê jî, û hin caran dibe mêvanê wargeha Mûsa Pêxember. Ne, Mûsa jî pêxemberekî Xwedê bû û gelek teşqele hatibûn serê wî. Xasma çaxê ku diçû ser Çiyayê Tûresînayê û bi Xwedayê xwe re civan dikir, jê gihandina mexsed û mirazên xwe dikir û guh didan pend û şîretên wî. Belam gelek serpêhatiyên wî jî mîna yên Siyabendê Silîvî hebûn. Wek meselan golikê, ya çêlekê, ya feqîrok û mêrikê dewlemend ku li wan bûbû şahid... Lê şemala êgir ew sergêj kiribû û evîna wî ne mînabû ya Siyabend. Ew bûbû evîndarê delaliyê, xweşiyê, biratiyê û wekhevîtiyê...

Lê mixabin Mûsa jî nola Siyabend nizanibû ku dê torinên wî jî fena malbavanê Siyabend têkevin binê destan û stûxwar û belengaz li ber dîwarên xelkê bimînin û li ser axa xwe qenim nikaribin ku bistirin jî.

Erê ev jî rastiyek e ku dibêjin: Bayê evînê pir germ

Institut kurde de Paris

e û evîn derdekî bê derman e. Kesê ku bawer nake jî bi kerema xwe fermo bila here Cizîrê ser goran Mem û Zînê, ji wê diriya ku ji gora Beko derketiye û di navbera wan de bûye sênc bipirse. Hingê ew dê xweş fêr bibe ku evîn derdekî bê derman e. Ha ji ber wê evîna di xewnê de Siyabend û birayê xwe bi pirs û pirs çûn, da bigehin Qudsa xwe ya pîroz. Ew her ku çûn ji xelkê pirsîn û berê hespên xwe berjor dan, qesda eşîra Şikakan kirin. Pirsek ji vî, yek ji wî, çend heftî, du-sê mehan li herêm û deverên cihê geriyan, carna riya xwe şaş dikirin û dîsa vedigeriyan ser riya rast, heta ku xwe gihandin nava aqarê Eşîrê. Li wir ew gihan ber konekî ku li ser deh stûnan hatibû vegirtin. Carekê Siyabend bala xwe dayê, wa keçek li ber deriyê wî konê ku mîna Xana Duxanan sekiniye, lê malikxirabê pirî ku delal û bedew e, mirov jê re lal dimîne û serxweş dibe. Siyabend hêdîka di ber xwe de got Qeregêtiran:

- Berê mihîna xwe vegerîne, rast bajo here ber wî konê han. Hebe tune be ew keça ku min di xewna xwe de dîtibû, ewa han e.

- Kuro. Na , wer mebêj?

- Bi Xwedanê şev rojan kim, eynî dirûfên wê li vê diketin. Hebe tune be ev keç, ew bi xwe bû. Ka pêşî tu here bêje hûn mêvanan nahewînin? Û bi hawakî navê wê jî bipirse. Eger navê wê Xecê be, jixwe em mêvanê wir in.

Qeregêtiran berê mihîna xwe vegerand û ajot çû ber

kon li ber keçikê sekinî:

- Rojbaş.
- Rojbaş, bi xêr bê.
- Xwişka min, hûn mêvanan nahewînin?
- Mêvan, mêvanê Xwedê ne. Fermo, gazî hevalê xwe jî bike, werin peyabin.
- Xwişka min, navê te bixêr?
- Xecê.

Çaxê Siyabend ji dûr ve seh kir ku keçikê navê xwe bi Xecê hilda, tirpîniyek ji serdila wî rabû û gelek kêfa wî hat. Piştre li xwe fikirî, li Xecê niherê, bala xwe da ser û sînçê xwe û gurrîtiya xwe anî ber çavan, piştre dîsa bala xwe da gewretiya Xecê û xwe bi xwe got: Ya Xwedanê şev û rojan. Ji te ve xuyan e ku ez bi delaliya xwe ne babetê vê keça bedew im. Lê tu girê mirazan î û mexseda mirazxwazan bi cih tînî. Îcar ez hêvî dikim, tu sîncê min xweş bikî, da ez hewqa sik nême xuyakirin!

Siyabend hêj wê peyva xwe kuta nekiribû, di yek derbekê de porekî reş serê wî yê zelût vegirt, birû û simbêlên wî yên reş xwe nîşan dan, û bi temamî ji şûfê xwe yê berê derket kete şûfekî din yê pir delal. Îcar dema birayê wî Qeregêtiran ji cem Xecê vegeriya ku gazî wî bike, ew nenasî. Lê Siyabend bangê wî kir û xwe pê da naskirin. Herdu bira çûn li ber deriyê kon peya bûn. Xecê pêşî hespên wan birin li sing girêdan û ew bi alif kirin. Piştre çû hindur ji mêvanan

Institut kurde de Paris

re doşen, balîf û nazbalîf raxistin û gazî wan kir, herdu çûn hindur û li binê kon rûniştin. Pêşî Xecê qahweyeke nîvtahl keland û da wan, dû re jî rabû ji wan re xwarin çêkir, sifre danî ber wan. Ew jî rûnişt digel mêvanên xwe xwarin xwar. Piştî xwarin kuta bû, Xecê amanên xwe rakirin û dîsa çû li cem wan rûnişt, pirsa hal û rewşa wan, ya rêwîtiya wan kir û sedemê gera wan pirsî. Ha wisa xweş û bêş di navbera wan de domand heta ku bû êvar û her heft birayên Xecê ji nêçîrê hatin malê.

Siyabend Di wê navê de hey li Xecê dinerî û bala xwe dida serçavê wê. Lê dema ku çavên Xecê diketin aliyê Siyabend yan pê re dipeyivî û tiştekî jê dipirsî, pêre pêre wî serê xwe nişîv dikir û fihêtkirina xwe dianî holê. Xecê hertim bi çavên mêvanan li Siyabend dinerî û bîra tiştekî nedibir. Lê Siyabend di wê navê de yekcaran xwe jibîr dikir û dikete nava xewn û ramanan; dîtina Xecê ya di xewna xwe de dianî ber çavên xwe. Çi dema ku Xecê radibû ji cem diçû, wî ji paş ve li bejna wê dinerî, ka ew keça ku di xewnê de dîtibû ev e yanena? Erê jê re baweriyeke bêguman çêbû, ku ew keça wî di xewna xwe de dîtibû, ev bi xwe ye.

Xecê keçeke pir delal bû û xwişka heft biran bû. Ew, gula malê û şênîka êlê bû. Ne tenê gula malê herweha ya eşîrê bû jî. Xecê gelekî rind, bi delalî û nazdarî hatibû xwedîkirin. Xweşikbûn û gewretiya ku

li Xecê hebû, li tu keç û bûkan nebûbû mêvan. Ew zeriyek bû; perî û horiyên bihiştê hemû li ber siha wêneyê wê hatibûne çêkirin. Bejneke ne dirêj û ne jî kin li Xecê bû; wisa orte bû, navtenga wê mîna qevdika baqên gula zirav bû û serçavê wê grover, soresipî bû û hinarokên ruyê wê mînabûn du hinarên radîşo, ku yekî biguvaştina wê meywaveke mîna ava Kewserê ji wan derbiketa. Erçena wê di şûfê xaran de mîna xwençeyeke nûpişkiftî bû û kortikeke piçûk jî ya di şûfê Berê Reş lê hebû. Du heb lêvên tenik li Xecê bûn û diranên wê mînabûn şanikên hingiv û timî devliken bû. Porekî kej li serê Xecê bû ku tayên wî di tarîtiya şevê de jî diçirisîn û mîna ku bi avzêrê hatibin gûnzêrkirin wisa şewq didan. Çaxê yekî li kêlsima wê dinerî, ji ber delalî û spehîtiya wê dilê wî dixewirî, xwe bi xwe digot: Mîna ku Yezdanê dilovan hunerên xwe hemû di Xecê de dabin nîşandan û ji delaliyê tu par nedaye kesine din. Ha wisa mirov qêmîş nedikir ku li bejn û bala Xecê binêre, xasma li çavên wê yên kesper î dilwêne...

Xecê piştî ku sifra xwarinê rakir, dîsa çû li cem mêvanên xwe rûnişt û bi Siyabend re ket xeberdanê. Îcar dema wê ferq kir ku Siyabend ne bi çavên mêvanan lê dinêre, wê jî bi çavine din lê nerî. Erê ewçax zêdetir bala Xecê Siyabend kişand û tîneke bi evîndarî ya wek agirê dojehê ew serobin kir. Hinbihin wan, mîna ku wê xerîbiya di navbera xwe de bavêjin geh Xecê li Siyabend nerî û Siyabend serê

xwe tewand, gahî Siyabend li Xecê nerî û Xecê serê xwe tewand. Ha bi wî awayî Siyabend û Xecê mîna gul û bilbil ji mêzekirina li hevdu hêj têr nebûbûn, dengê birayên wê ji derve hat û Xecê rabû çû pêşiya wan, got

- Birano. Du mêvanên me hatine, wa li hinduru rûniştî ne. Lê her yekê ji wan mînaye fêrisekî. Jixwe yek jê hema mirin ji nava çavên wî difûre! Min xwarin daye wan û hespên wan jî bi êm kirine.

Birayên Xecê çûne hindur û xêrhatin li mêvanên xwe dan, pirsa hal û rewşa wan kirin, bi hevdu re ketin galgal û xweşbêjan heta ku bû derengiya şevê û her yekê rabû çû kete nava livîna xwe raketin.

Siyabend û Qeregêtiran li binê konê mêvanan di xewa şêrîn de bûn û dîsa rewneqa delaliya Xecê tîrêjên xwe li rûpelên dîrokê belav kirin: Hinek dibêjin Xecê delal bû, hinek dibêjin Xecê delaltir bû û gelek jî dibêjin ew delatirîna delaltira delalan bû. Xecê, pa tu çi xec î! Eger mirov bêje, Xecê horî û periya bihiştê bû, bi xwedanê şev û rojan horî û perî li ber wê dibûn mîna polekî reş. Eger mirov bêje, Manî bi xwe rûniştibû û bi firça xwe lê regn û şemal kişandibû, bi Zerdeşt kim ji Manî zêde ye. Lê eger mirov bêje, Xecê beybûna zozanê Qulingo bû, bi Mishefa Reş dê Qulingo bêje ji min jî û ji zozanê Şerefdînê jî zêde ye ku em karibin beybûnên wisa delal derxînin ser ruyê erdê. Lê heke mirov bêje ew stêrka Zehra bû û

Institut Kurde de Paris

xwişka hîvê bû, dê herdû jî fedîkar bimînin û ji şerman ruhniya xwe nadin erdê. Nexwe niha eger Gola Wanê bibe mîdad, ger dar û berên Kurdistanê bibin pênûs, er ruyê deh dinyayên ji vê mezintir bibin kaxez û defter û li ber mirov hazir bibin, heke temenê mirov jî mîna yê Nûh Pêxemberê Botî dirêj bibe, herweha ku mirov şev û rojan yekere bike û tim û daîm xeysetê delaliya Xecê binivîse, wê hingê belkî mirov karibe hinek salixê delaliya wê daxîne nivîsê. Ekene delaliya Xecê ji birî û hişê mirovan der e. Heta ku behsa delaliya Xecê li nava kurdan wilo belav bûye, ku ji bo dana mizgînan jî navê mêşeke rindik danîne "Xecxecok". Îcar gava dengê "vizîn"a wê mêşê tê yekî, ew kes bawer dike ku wê bi tiştekî pir hêja bête mizgînîkirin û pê gelekî şad bibe herwekî Xeca Şikakî dîtibe.

Em ê niha delaliya Xecê bi pîroziyeke çak jê re bihêlin û vegerin ser birayên wê û nêçîra wan. Dema ku her heft birayên Xecê ji nêçîrê hatin, bi xwe re şeş xezal, çar pezkûvî, duwazdeh kîvroşik û sê heb kurîbeşk anîbûn. Wan ew nêçîra xwe hemû post kirin, kelaşên wan biraştin û hinek kirin parêv, hinek jî kirin kebab, danîn ber mêvanên xwe û şîva êvarê xwarin. Goştê mayî jî li der û cîranên xwe belav kirin.

Bavê Xecê Resûl Axa, mezinê Eşîra Şikakan bû. Ew, zilamekî pir bi nav û deng, mêrxas û comerd bû.

Institut kurde de Paris

Wî ji zaruyên xwe û yên Eşîrê pir hes dikir û tu ferq nedixist navbera yekî nas û yê nenas. Ji ber wan xeysetên Axê, piştî mirina wî, Eşîrê kurên wî kiribûn berpirsyarê xwe û yê mezin jî kiribûn serok.

Birayên Xecê berpirsyarên eşîra xwe bûn û birayê mezin serok bû. Karê wan her heft bira, kirina serweriya Eşîrê û çareserkirina gelşên xelkê bû. Civat û şewbêrka xelkê hergav li mala wan bû, timî semawer dikeliyan û qahwe li xelkê belav dikirin. Lê her heft bira bêzewac bûn û xwişka xwe Xecê jî hêj nedabûn mêr.

Şeş pismamên wan yên nêz hebûn, xwe li ber Xecê xistibûn dorê û nedihiştin ku ew mêr bike. Birayên wê jî şertine zor danîbûne ber pismaman û ji bedêla Xecê ve heft keç dixwestin. Lê pism nikaribûn xwe di binê wî barê giran de ragirin û ne jî xwe ji riya wê vedikişandin, ku hin kesên din bên wê bixwaze. Ji ber wan sedeman hem Xecê û hem jî her heft birayên wê heta wê gavê jî bêzewac mabûn.

Birayên Xecê bi reng û ruyên xwe, tev dişûfiyane hev. Qey yekî digot ew tev bi yek derbê ji zikekî derketine; hemû zilamine kej ên çavkesper, peyane gir, stûr û qalind, pozberanî û kêrr, enîfireh û rûteşt bûn, ku ji biyaniyan re naskirina wan ji hevdu gelekî zor dihat.

Siyabend û birayê xwe li mala birayên Xecê heftiyek, didu man. Ji xwe Siyabend ji kêfa şewq û şemala Xecê re nedidît ku çewa roj dibihurin, çewa şev

Institut kurde de Paris

derbas dibin û dixwest ku tim û daîm li wir bimîne. Birayên Xecê hîç karê ku mêvanên wan pê ve hatine nedipirsîn, yan ji kur ve tên, dê bi kur ve herin? Ne jî mêvanan îşê xwe yê ku ji bonê çûbûn ji mazûrvanên xwe re digotin. Ha wisa gelek roj bihurîn, şevekê şewbêrka wan peşkilî û bîstikekê Siyabend û Qeregêtiran bi tenê man. Qeregêtiran got Siyabend:

- Keko! Qey em hatine vir zikçêrê? De li wan biteqîne, êdî bes e!

Li ser wê gotinê, Siyabend gazî birayekî Xecê kir, jê pirsî, got:

- Pismam. Pirs bê eyb e, em xerîb in û mezinê we nas nakin. Ma birayê mezin kî ji we ye?

Tu nabêjî birayê mezin ew bi xwe bûye, got:

- Ez im, fermo!

- Ez divêm niha tiştekî ji te re bêjim, ne fihêt e û ne jî ji tora me der e!

- Fermo, bêje!

- Em hatine merivatiya we!

- Hûn Xecê ji kî ji we re dixwazin?

- Ji min re!

- Bira, navê te bi xêr?

- Siyabend.

- Ew Siyabendê Silîvî yê menşûr?

- Erê!

Birayê Xecê dev pê kir û çîroka Xecê got:

Institut kurde de Paris

- Birayê Siyabend. Xwedê zane pir kêfa min ji te re hat. Lê niha şeş pismamên me hene hemûyan xwe li ber Xecê xweş kiriye. Ew dibêje Xecê ji min re, yê din dibêje ji min re, yê dîtirkê dibêje ji min re... Lê me şertekî giran daniye ber wan; em heft birayên wê hene û em her heft jî ezep in. Me gotiye, di bedêla Xecê de dê hûn ji me re heft jinan bînin. Îcar ew nikarin wî barî jî ragirin. Ha wisa em û wan mîna mişk û pisîkê li ber hev teliyane. Ez bigorî îcar heke tû karibî wî barê me ragirî, em ê xwe bi xwe bifikirin û bersîvekê bidin te.

- Eger hûn dayox bin, min vî barî qebûl e.

- Na. Pêşî divê ez ji Xecê û birayên xwe jî bipirsim. Ka gotina wan çi ye!

Birayê Xecê rabû çû aliyê malê, cem Xecê û her şeş birayên xwe, meselê ji wan re got. Hemûyan ew mesele pejirandin û bi yek devî razîbûna xwe bi dana Xecê ji Siyabend re eşkera kirin. Piştre ew vegeriya çû cem Siyabend, got:

- Keka can, ew îş temam e, Xecê li te pîroz be.

Siyabend berê xwe da birayê xwe Qeregêtiran, got:

- Rabe here destê kekê xwe maçî bike.

Qeregêtiran rabû destê birayê Xecê maçî kir û piştre got:

- De ka îcar em şîraniya xwe biwin.

Institut kurde de Paris

Ew şev Xecê rabû şerbetek ji gezo çêkir, şîranî û tiştine din hanîn, tev rûniştin bi-hev re xwarin, vexwarin û di nava xwe de merivatiyê germ kirin; ketin behsa cihêz û kirrîna tiştan, heta ku dîkên sibê li wan xulxulandin. Piştî wê mirovatiya germ birayên Xecê rabûn çûn ketin nava ciyên xwe û raketin. Siyabend û birayên xwe jî karê razanê kirin, lê Qeregêtiran got:

- Siyabend! Ma te dîtiye kesî heft jinan daye bi jinekê? Em ê ji kur bo wan heft heb jin bînin?

- Birayê min, tu hişbe! Ez û tu em ê herin deverine dûr û serê riyan bigirin. Çi jin yan keç dema hatin, em ê bi çeplên wan bigirin û ji wan re bînin werin. Piştre em ê ya xwe bibin û herin, îcar îşê me ji van û xelkê tune.

Roja din Siyabend û Qeregêtiran rabûn li hespên xwe siwar bûn û çûn, li ser riyeke mezin ya karwaniya sekinîn. Çi karwanî, çi arvanî, yan li wan çol û pasaran çi qirşikvanî û ardûvanî dîtin heft keç û bûk ji nava wan niqandin û dan pêşiya xwe ji birayên Xecê re anîn. Piştre birayên Xecê doza cihêz kirin. Lê tirsa Siyabend ew bû, ku heke dereng bikeve tavil xelk li dû şopa keç û bûkên xwe ve bê û wan bibin, ewçax Xecê jî ji dest diçe. Got:

- Ne hewcê kirrîna cihêz û mihêzan e. Hema ez ê destgirtiya xwe bibim û piştre jê re cihêz bikirrim.

- Ma qey Xecê jinebî ye, ku bê cihêz ji malê derkeve? Ne, va Elcewazê di binê bêvila me de ye. Em ê



Institut kurde de Paris

niha siwar bibin herin jê re cihêz bikirrin û çend saet şûnde vegerin werin malê. Piştre îcar oxira hewe ya xêrê be.

Siyabend, Qeregêtiran û her heft birayên Xecê tev li hespên xwe siwar bûn û berê xwe dan bajarê Elcewazê, çûn ku cihêzê Xecê bikirrin. Lê ew hêj venegeriyabûn, xelk kete ser şopa keç û bûkên xwe û gelek zilam hatin bi ser konê birayên Xecê ve girtin. Xecê xwe veşart, da kes têkilî wê nebe û her yekê yê ku bi milê jina xwe girt, yê bi destê keça xwe girt ew tev birin û çûn. Çaxê Siyabend û bûrayên xwe ji Elcewazê vegeriyane malê, bala xwe danê ku malikê tu mîrat bî; ne jin hene û mal jî tev hatiye wêrankirin. Wê hingê ew şeş pismamên ku xwe li ber Xecê xweş kiribûn, bala xwe danê ku Xecê nadin Siyabend, li pêşberî Siyabend derketin. Lê Siyabend ew nekirin tiştek, got birayê Xecê:

- Ê de bi kerema xwe destûra me bidin, êdî bila Xecê jî xwe kar bike da em herin.

Birayê Xecê yê mezin got:

- Pismam. Hewe em xapandin. Ez nizanim ne hûn gerdûn in, yan me belîd dihesibînin?

- Çima?

- Lê, hûn çûn, hewe keç û bûkên xelkê ji me re hanîbûn!

- Bi Xwedanê şev û rojan kim heta ku hûn ev torr

zilam bin, ez her yekê we gurciyeke Rewanê jî ji we re bînim, dê xelk bê ji we bistîne! Îcar ez ê niha rabim Xecê siwar bikim û wê bibim herim. Fermo eger hûn mêr bin destgirtiya min nedin!

Li ser wê yekê di navbera Siyabend û birayê Xecê yê mezin de galegal zêde bû: zirtek ji Siyabend, fortek ji kekê Xecê û herdu rapiçikîn hevdu. Ew her şeş pismamên Xecê jî hatin alî birayên Xecê kirin û bi Siyabend re ketin şer. Siyabend li Deybilqiranê xwe siwar bû û Lahorê Qetlê li wan kişand; di bîstikekê de her heft birayên Xecê û ew şeş pismamên wê hemû kuştin û Xecê li paş xwe siwar kir, wî û birayê xwe bi yek colanekê berjêr ajotin çûn, heta ku ji nava axa Eşîra Şikakan derketin.

Piştî ku Siyabend û birayê xwe ji herêma talûke ya şer derketin, Siyabend got:

- Qeregêtiran. Birayê min, ev e ez bi serî bûm, ma tu. Heke Xwedanê li banî ji min re got herê, ez ê te jî mîna xwe bizewicînim, hem jî bi keçeke ji Xecê ne kêmtir re. Lê divê em jibîr nekin ku me sêzdeh peya ji eşîra Şikakan kuştiye, Şikakî jî mêrxasine bi nav û nîşan in, mêrên roja giran in û tola xwe ji kesî re nahêlin! Birayê min, dijminê me yê herî mezin felek e, ne Şikakî ne. Îcar ew feleka ku hewqas bi me xirabî kiriye; em xistibûn ber destên ap û jinapan, em rezîl û riswa kiribûn û me bi dertûlan xistibû, divê ez wê sax bernedin. Îcar min seh kiriye ku felek li Qur-



Institut kurde de Paris

miza Yemenê ye. Divê em ji vir rast berê xwe bidin Yemenê û herin, wê jî bikujin û xwe bi temamî jê rizgar bikin.

- Keko. Ew feleka tu behs dikî ne li Yemenê ye, li asîman e. Çewa em ê karibin herin felekê bikujin? Yeke din jî, tu di karê dijminatiyê de pir helebez dikî. Divê mirov hêdî, hêdî bilibite. Wek mesela ku dibêjin:"Mirovatî germ û germ, neyartî nerm û nerm."

Piştî kuştina wan sêzdeh zilaman, hewar li Eşîra Şikakan ket û bi hezaran kesê ku destên wan şûr digirtin li hespên xwe siwar bûn û li dû Siyabend û birayê wî çûn. Wan rêçê bir û çûn heta gihan çola Erebistanê. Lê êdî ew diketin nava aqarekî biyanî û rê li wan cûmucela bû. Siwarên Eşîrê li wir mat man û şûnde vegeriyan, berê xwe rast dan bi çiyayê Şengalê ve, çûn li wir cîwar bûn û çavrêniya vegera Siyabend kirin, ka wê kengê bi ser wan ve bê!

Institut kurde de Paris

# - VII -

Rê gelekî dûr, dirêj û nenas bû. Lê belê lawikê Silîvî ji çûnê re amade bû û xwe hazir kiribû ku here, da tola xwe ji feleka malikxirab bistîne û wê jî bikuje.

Herdu bira ji bo wê riya dûr a dirêj xwarin, vexwarin hazir kirin û pilûrkeke kon jî peyda kirin. Rojekê sibe zû rabû û berê xwe dan çola sîlekan a Erebistanê û qamçî li hespên xwe hejandin. De rojek, didu, sisê, na bêje heftiyek, didu û sisê bi siwarî çûn, pa ne rê ji ber wan diçû û ne jî riya rast dizanibûn. Çaxê di rê de li wan dibû şev, çadira xwe vedigirtin. Siyabend û Xecê di binî de radiketin, Qeregêtiran jî li derveyî çadirê xwe di nava kulavekî de vedizeland û radiket. Sibekiyan çaxê ji xew radibûn, didîtin ku bayê şevê çokek sîl li çadira wan daye hev û kulavê Qeregêtiran jî di binê xwe de nixumandiye.

Institut kurde de Paris

Di wê rêwîtiyê de şevek ji şevan Siyabend û malxweya xwe di binê kon de raketî bûn, bi xirepişkekê hisiyan. Siyabend rabû destên xwe avêt Lahorê Qetlê û derket derve. Çi bibîne baş e? Ku wa çend zilamên bi çeffegal yên bi kirasên sipî ketine ser birayê wî û dikin ku bifetisînin, qîrekê da wan û Lagor hejand, çend caran rima hizîranî di erdê de kila û êrîşê wan kir. Bi qêrîna wî re Xecê jî ji xew şiyar bû û derket derve. Dema Xecê dît wa bi sedan zilamên çeffegalkirî û şûr di destên wan de li navrastê digel karwanekî devan sekinî ne û pîkoliya şerê Siyabend dikin, hema wê jî şûrê xwe kişand û êrîşê wan kir.

Siyabend li hespê xwe siwar bû û li wan xist, her carê ku colanek ji vî serê meydanê dida Deybilqiran heta diçû seriyê din serê çar-pênc zilaman dipekand. Bi wî awayî rev li kirasdirêjan ket û ji tirsa Siyabend ji hevdu peşkilîn, lê Xecê û Qeregêtiran pêşîbir li wan girtin û gelek kelax li erdê dirêj kirin. Ew roj Siyabend pirê wan zilamên çeffegalkirî kuştin û gelekan jî mil yan çîpên wan jê kirin. Lê liblibên ku ji ber şûrê Siyabend filitîn, wan xwe di çola nenas de xistin binê sîlê û zû veşartin, ji ber çavên wî wenda kirin. Îcar Siyabend, birayê xwe û Xecê li karwanê deva vegeriyan, dîtin ku barên wan hemû tiştên xwarinê ne; penîr, şorî, çortan, hingiv, mewîj, bastêq, şaran, gûz û gwd.Tu nabêjî ew karwan çûbû ji Diyarbekir mal kirrîbû û dibir Hîcazê. Wan têra xwe ji wan baran xwarin hildan û li riya Yemenê ajotin çûn.

Her ku diçûn li pêşiya wan rê dibû sîla safî ya hûr a nerm û rêveçûna hespan zortir dibû, simên wan tê re diçûn xwarê. Ha wisa riya wan dubare dibû. Îcar ew mecbûn man ku ji hespên xwe peya bibin û bi peyatî herin. Lê bi çûna nigan jî rê ji ber wan nediçû. Siyabend rabû ji şivikên terr mîna lakanên berfê çend xarûk çêkirin û xistin nigên xwe, da nigên wan disîlê re neçîn xwarê. Lê îcar hesp nikaribûn biçûna. Wî ji wan re jî çend lakan ji çerm û textikan çêkirin û bi binê simên wan ve girêdan. Piştî wê yekê îcar rêveçûna di sîlê re hêsan bû û karibûn zû biçûna. Bi wî awayî çûn heta xwe gihandin nêzî aqarê Yemenê. Çola sîlekan êdî kuta bû û erda hişk derket. Ew li hespên xwe siwar bûn û ajotin rast berê xwe dan bi aliyê deryayê ve.

Siyabend carekê nerîn ku wa konekî reş li keviya deryayê vegirtiye, xwe bi xwe got: Hebe tune be, ew kon yê felekê ye! Erê! Felek niha li asîman e, yan li keviya deryaya Yemenê ye, kes nizane. Lê hinek dibêjin ku felekê dest bi dijminatiya feqîran kiriye û warê xwe guhartiye... Siyabend dizanibû ew konê reş ê li keviya Deryayê yê felekê ye. Diviya ku wî ew kon birûxandina û jê tola xwe bistanda. Lê dîsa jî ew bi guman bû, ka felek di binê konê xwe de ye yanena? Ew konê reş ne yê felekê bû, ne yê sihûdê û şansê bû jî, yê keçekê bû. Îcar çi keç? Erê rast e keç hene û keçkok jî hene, jin hene û jinkok jî hene. Ew,

keçeke wisan bû ku mirovan jê saw digirt û zilaman li hemberî wê bizav nedikirin ku dengê xwe derxînin.

Ew keça wisa mêrane, kî bû gelo? Çi tişt bû û ji kur bû? Kesî bersîva wan pirsa nikaribû bide. Ji ber ku wê keçê bi zimanê kurdî, yê erebî, farisî, bêlûcû, urdûkî û yûnanî tev dizanibû.

Li gorî agahdariya xêrxwazekî dilxwaz ê dilnaz; ew keç keleşek bû, yeke wisa ji vanên mêrane bû ku zilaman li pêşberê xwe mêr nedihesibandin û tu zilamî jî riya xwe lê nedidît. Wê keçê adek li xwe dabû, heta ku ew zilamekî ji xwe mêrtir nebîne, bi tu kesî re nazewice û yê ku pişta wê deyne erdê jî wê pê re bizewice.

Keçik bi tena serê xwe dijiya û konê xwe li keviya Deryayê vegirtibû. Ew mînabû efrîtan û dikaribû xwe têxista wêneyê her tiştî. Qada gera wê ji Yemenê heta Deryaya Xezerê, ji Deryaya Hindê heta Deryaya Reş bû. Lê piranî hêwirga wê ya di havînan de, Sîpanê Xelatê bû. Keçê ew herêma fireh û pahn rind dinasî û her deverê qul bi qul dizanibû, mîna kefa destê xwe tev dîtibûn û lê geriyabû.

Çiqas mêrxas û fêrisên di wan welatan de hebûn, wê ew tev dinasîn û dizanibû ku kî çiqas bizava wî heye û ya kî wilo nîne. Lê tu carî wê bela xwe li kesî nedixist, heta ku hinekan bela xwe lê bixista ewçax wê ew dikirin mîna hevîr û bera erdê didan.

Dema Siyabend ji dûr ve ew kon bereçav kir, got Qeregêtiran:

Institut kurde de Paris

- Birayê min, here li binê wî konê li keviya Deryê binêre, ka di bin de çi heye çi tune ye? Û zû vegere were xeberê bide min!

Qeregêtiran mihîna xwe ajor û berê xwe da konê reş, çû li ber sekinî. Carekê dît tebayek ji binê kon derket, lê bi yek derbê demarên wî yên mêrantiyê vemirîn û devê wî negeriya ku bipeyive. Wî tebayî jê çi pirsî, Qeregêtiran bersîv neda. Hema carekê teba bi pêsîra wî girt û şiqamekê di rû de lê xist. Bi wê şiqamê heft diranên Qeregêtiran ji şûna xwe fiştiqîn û ketin nava devê wî. Mihîna Geregêtiran jî ji wî tebayî silikî û baz da, rast berê xwe da bi aliyê Siyabend û Xecê ve û bi xaranî çû. Qeregêtiran çaxê giha cem wan, hema ew heft diranên xwe xistin kefa destê xwe û nîşanê Siyabend dan, got:

- Ha keko, ev diranên min in. Hewqas min digot felek li asîman e ne li erdê ye, te digot na li Yemenê ye. De îcar rabe here felekê bikuje! Ez bi Xwedê kim tebayek di binê wî konî de ye, ji xwe mirov nizane ka çi tişt e û çi xulyaqet e! Wî şiqamek tenê li min xist, ev sosret anî serê min. Lê eger pir li min bixista, dê min bikuşta û goştê laşê min jî bixwarina.

Dema Siyabend ew diranên birayê xwe dîtin, weke caran dîsa hêrsa dilê wî rabû û demarên eniya wî qalind bûn, hêşîn bûn û werimî. Lahorê Qetlê hejand, rima hizîranî di erdê de kila, li Deybilqiran siwar bû û

Institut kurde de Paris

çend caran gema wî şidand, sist kir û serê wî berda ajor, çû li ber konê reş sekinî:

- Ya tebayê ku te heft diranên birayê min şikandine, ji min re derkev der! Ka Xwedê îro ji min û te dide kî!

Tebayê li binê kon xwe bi xwe fikirî: Hewqas min kir û nekir, ew zilamê berê ku hate vir hîç nepeyivî û min tiştekî jê fam nekir. De ka ez ê vî jî biceribînim. Heke ev ji wan zilamên ku ez divêm be, ez li qismetê xwe rast hatim. Ekene, bila ev jî di riya yê din re biçe.

Tebayê pirreng vê carê xwe xist şûfê zilamekî ji vanên qirase yê girs û simbêlpalik, kolosekî Serhedî da serê xwe û derket derve, çû li ber Siyabend senikî. Siyabend çaxê dît zilamek ji binê kon derket, ji xwe re şaş bû û xwe bi xwe got: Qeregêtiran got min, tebayek e. Ev e zilamek derket. Ev çi mesele ye? Mîna ku nihêniyek di vî îşî de heye, lê ka ez binêrim!

Siyabend li zilam nerî, zilam li Siyabend nerî. Piştre zilam devê xwe vekir û ji Siyabend pirsî:

- Ha siwarê Kurd, te xêr e hatî vir?

Siyabend bi wê gotinê hêj zêdetir fikirî û xwe bi xwe got: Ma evî navika min birriye, ku dizane ez Kurd im? Ev çi mesele ye? Piştre got:

- Tu yî, ê ku diranên birayê min şikandine?

- Hema bila ez bim! Qey tu dixwazî ez baskên te jî

Institut kurde de Paris

biqusînim?

- De tu jî siwa bibe, şûrê xwe bigre û ji min re derkeve vê Berriya Şehwarê, da em çend xir li hevdu bixin!

- Xwe ragire, heta ez hespê xwe hazir dikim û şûrê xwe tînim!

Zilam şûnde vegeriya binê kon. Bistikekê şûnde derket li hespekî siwar bû, şûrekî Misrî avêtibû situyê xwe, mertalekî Serhedî û rimeke Xerzanî jî di destan de bûn. Ew û Siyabend xwe bera rastekê dan û hilperikîne hevdu; geh wî derba xwe avêt û geh vî şûr weşandê. Bi wî hawayî herduyan li ber hev da û şer û qirên kirin; bû çingeçinga şûran, bû hîrehîra hespan û bû hewtehewta dengan. Şerekî wisa giran kirin ku yekî digot leşkerên asîmanî daketine erdê û dixwazin dinyê xirab bikin. Ew şer di navbera wan de domand heta ku sê roj kuta bûn, lê yekî keysê li yekî nanî ku bikuje. Piştre Siyabend bala xwe dayê ku wisa nameşe, got:

- Ev sê roj in ez û tu şer dikin û me çu tavil bi hev nekiriye. Îcar me van hespên xwe jî behdilandin û em jî ji çingeçinga şûran kerr bûn. De ka were ez û tu bi navê; kî ji me kî avêt erdê bila yê din serê wî jê bike!

- Bilabe, fermo em dakevin!

Siyabend û zilamê Yemenî ji hespên xwe peyabûn û bi nava hev girtin, hevdu teqilandin û zorî dan hev.

Institut kurde de Paris

Lê Siyabend bala xwe dayê ku ew jê bi hêztir e, pêre pêre hêrsekê ew girt û xwe şidand, nav lê guvaşt, ew bilind kir û serpişt li nîvê erdê xist. Û şûrê xwe danî ser situyê wî ku serî jê bike, hema wî singa xwe vekir û du memikên mîna du sêvên Xelatê nîşanî Siyabend da, got:

- Hêdî be. Siyabend, kes pîreka nakuje.

Siyabend hêdîka di ber xwe de got eeehw! ev ji kur navê min dizane? Jixwe çaxê ku wî ew memik dîtin, mîna ku cêrek ava sar pê ve bê rijandin ji xwe re cemidî û rabû piyan, xwe bi xwe got: Wey qeda heft gundan li min û li şan û şerefa min bikeve ku ez Siyabendê Silîvî me, siwarê Deybilqiran im û xwediyê Lahorê Qetlê me, ev sê roj in ez bi jinekê re şer dikim û min pê nikaribû!

Piştî wan peyv û gazinên Siyabend ên ji xwe, jinikê got:

- Kuro fortê xwe nede, fort û zirt ji zilaman re kêmasî ne. Min ê te çokşikandî bikira, lê min adek li ber Xwedê dabû, "ew zilamê heta ku pişta min dameyne erdê, ez pê re nazewicim." Îcar ez ji te re me. Lê tu bi xwedanê şev û rojan dikî, tu ne Siyabendê Silîvî yî?

- Erê!

- Ewê ku pêşî hatibû vir jî ne birayê te Qeregêtiran e?

Institut kurde de Paris

- Erê!
- Siyabend. Ez divêm ku tu bi mir re bizewicî!
- Ez bi Xecê re zewicî me.
- Qey gur bi du pariyan dimre?
- Na, lê ez naxwazim bi du jinan re bizewicim.
- Ê de baş e nexwe!
- Lê ka tu pêşî mesela xwe, serpêhatiya xwe û navê xwe ji min re bêje. Tu wisa ne vala yî, hemin hicranek di te de heye! Çimkî dema birayê min hat vir, ewçax tu wek tebayekî bûyî. Lê dema ez hatim, tu zilamek bûyî. Niha jî tu derketî jinek, hem jî mînayî periyeke bihiştê. Ev çi mesela te ye?
- Siyabend, ez keçek im û li şiklan serdest im, navê min jî Perîzade ye. Çi dema ez bivêm, dikarim xwe têxim wêneyê her tiştî. Lê min sondek xwariye û adek jî li canê xwe daye, heta ew zilamê ku pişta min dameyne erdê, ez pê re nazewicim. Îcar di vê Erebistana me de zilamê ku pişta min danîbe tune, ev e tenê te pişta min danî erdê. Madem tu dibêjî ez bi jin im û bi min re nazewicî, nexwe ez ê bi birayê te re bizewicim. Ew kaniya ku tu jê hatî, birayê te jî jê hatiye. Fermo de rabe li hespê xwe siwar bibe, em herim cem birayê te û Xecê.

Siyabend li hespê xwe siwar bû, Perîzadeya sêrbaz jî rabû hin tişt û miştine sivik civandin, avêt pişta zînê xwe û li hespê xwe siwar bû, herdu çûn cem Xecê û Qeregêtiran. Dema ew gihane nêzî wan, Siyabend gazî birayê xwe kir:
- Qeregêtira. Birayê min, binêr ev jinek bû, tu nika-

Institut Kurde de Paris

ribûyî pê. De îcar madem wê heft diranên te şikandine, tu yê ewêziya wan vegerînî û pê re bizewice.

Bi dîtina Perîzadeyê re, pêre pêre bayê evîneke li Qeregêtiran xist û jê re evîneke mîna ya Memo çêbû. Îcar nebêje bi dilekî bi heft dilan dil ketê û mîna ku ji mêj ve bo wê bûbe evîndar ha wisa ji delaliya wê re lal ma û bêtebat bû. Jinik jî mîna bilbilê ku li belgên gulê dinêre li bejn û bala Qeregêtiran nerî û herduyan hinbihin perda xerîbiyê ji navbera xwe dirrandin û xwe avêtin hemêza hevdu. Piştre her çar rabûn çûn, li keviya deryayê ji xwe re ew konê berê jî vegirtin. Siyabend û Xecê ketin binê konê xwe. Yê berê jî Qeregêtiran û Perîzadeyê ketin binî. Îcar tiştê herî balkêş, ew şev bi zewacê re sihrbaziya Perîzadeyê jê çû û hemû tiştên xwe yên nihênî wenda kirin, tenê bû mîna jineke malan û bi xwedîkirina xwe û şûyê xwe ve lipikî.

Siyabend, Xecê û Qeregêtiran bi qederê salekê li ser keviya Deryaya Yemenê man, lê êdî hew tebat kirin. Ji aliyekî ve jana xerîbiyê ew bêgav hiştin, ji aliyekî ve tîna hilf û gulfa werpixî bihn li wan çikand, ji aliyekî ve jî hiskirina welêt ew nerihet kirin. Ji ber ku ew mirovên welatekî xweş, zozanên hênik yên bi avên sar bûn, li wir debara wan nehat. Diviya ku ew timî wek masiyan yan di nava avê de bûna, yan jî li binê sihekê rûniştî bûna. Lê destûra jiyanê ne di avê de ne jî li binê sihê ji wan re nebû û ew hawa wisa ji wan re nedihate domandin. Rojekê Siyabend got Qeregêtiran:

- Birayê min, em hînî jiyana vî welatê germiya nebûne. Em li vê çola sîlekan semax nakin û li vê derê tu kes nizane em kî ne û çi kes in. Divê em herim welatê xwe, li şûna warê bav û bapîran li jiyanê bidomînin. Ekene em li vî welatê biyanî bimînin û dola me zêde bibe, wê demek bê ku zaruyên me jî bi çefîegal bigerin û bê derpî başewal bin. Wê hingê yek rabe heft sondan bixwo jî, kes nizane ew zarûk zixrên Ariya ne.

Siyabend û birayê xwe rabûn haziriya rêwîtiya Kurdistanê kirin. Ew û jinên xwe li hespan siwar bûn û berê xwe dan bakûr, ha gidî Kurdistanê tu li kû yî, ketin rê û çûn. Dema ew ji keviya deryayê dûr bûn, ketin çoleke sîlekan a bê seruber û firtoneyek li wan rabû, dev û çav û bêvilên wan tije sîl bûn, riya xwe şaş kirin û ji rêveçûnê ketin. Ew çol ne diqediya. Lewra ne firtonê dihişt ku ew zû bimeşin, ne jî hespên wan dikaribûn di nava sîlê re biçûna. Îcar ew ji hespên xwe peya bûn û destkêş kirin, Perîzadeyê jî wek rêber ket pêşiya wan û rast berê xwe dan Rojava, çûn xwe gihandin ser keviya Deryaya Sor. Li keviya Deryê erd êdî hişk bû û li hin deveran taht û zinar jî hebûn. Li wir ew dîsa li hespên xwe siwar bûn, kevî û kevî ajotin, di nava axa Cihûstanê re xwe gihandin tixûbê Kurdistanê. Ji wir jî rast ber bi bakûr ve çûn, heta xwe gihandin Çiyayê Sîpanê Xelatê. Çaxê ew gihan quntara Sîpên, Siyabend ji hespê xwe daket û xûzî erdê bû sê caran ew der maçî kir û hêj bi çiyê ve hilkişiyan çûn jor li ser kaniyekê herdu konên xwe vegirtin û dest bi jiyaneke nû a li zozên kirin.

Institut kurde de Paris

# - VIII -

Li sertara Sîpên berfeke fîq-sipî hebû, li nişûviya sertarê hindik baran bû, hem mij bû û hergav dûman bû. Lê çaxê karwanê lawikê Silîvî ji riya Yemenê hat û giha Çiyê, du demsal hebûn. Yek, li jorê zivistan bû; her der berf û moran bû, û qeşem bû, fîq sipî dikir. Berfê mîna taceke narîn xwe lê gerandibû ku ew ji her deverê dihate xuyakirin. Demsala din jî li quntarên wî bihara rengîn, meha gulanê bû. Lê gulanokê hazirî dikir ku xatirê xwe ji Sîpên bixwaze û şûna xwe ji hezîranokê re bihêle. Reng û ruyê Sîpên pirî ku ji çîçek û giyayên pirtexlît xemilî bû, hema ji mirov re dikeniya û dilan bi ser xwe ve dikişand. Ewçax teyr û trûdên Sîpên têjikên xwe derxistibûn û wan li nava gil û giyayên rengîn digerandin, bi zarên curbicur gazî hev dikirin û timî dixwendin. Bihneke wisa xweş ji Sîpên dihilat ku hestiyên rizî pê jîndar dibûn û miriyên sedsale ji goran radikire ser nigan. Di

Institut kurde de Paris

şax û newalan de xulxula avên zelal î mîna çira şîr bû û hertim berjêr diherikîn. Li keviyên ava darên karçîn, bitim û tihokan xwe bi belgên kesk û bi berên sor û zer xemilandibûn. Ji qîvaran bigir heta rimbêzan, tirşo û karî, bendik û tûzik, xerdel û pêqilaçik, rihan û peybûn, sîsin û sosin hemû cûre giyayên xwarinê û yên bihnxweşiyê bejna xwe dirêj kiribûn û kofîkên xwe ber bi rojê ve hewl dabûn, mîna ku dixwestin ew taca serê Sîpên bibînin. Lê xwezayê destûr nedida wan.

Karwanê Siyabend bi çiyê ve hilkişiya û çû giha bilindayiyê, li ser kaniyeke şêrîn danî. Li wir wan ew herdu kon ji xwe re vegirtin. Yek Siyabend û Xecê ketin binî, yê din jî Qeregêtiran û Perîzadeyê... Lê belê mala wan yek bû û xwarina wan di yek dîzikê de dihate çêkirin. Çaxê xwarin çêdibû, her çar bi hev re diçûn li ber kaniyê rûdiniştin û xwarina xwe dixwarin.

Institut kurde de Paris

Ji Siyabend re jiyaneke nû dest pê kiribû. Ew ramana ku wî hertim dikir, êdî gihabûyê û evîna xwe bi Xecê re domand. Îcar çi tor evîn! Çi hawa hiskirin! Devereke mîna Sîpên evîna xweş bi mirovan dike nola şîr û hingiv, dike mîna gezo û ji hinarên Zivzîkê xweştir dike. Timî ew sorgul û ew mêrxasê Silîvî diçûn xwe li nava çîçek û beybûnan dirêj dikirin û ji ber xweşiya ramûsanan nedidîtin ku çewa roj dibihurin. Ha wisa yekcaran jî herduyan destên xwe dixistin

nava hev û radibûn li terazinan digeriyan çîçekên pirtexlît berev dikirin û dikirin baq. Êvarkî çaxê vedigeriyan malê bi xwe re dianîn û li binê kon Xecê ew dixistin guldankan û avê bera ser wan dida. Îcar bihna wan kon dikir nola Baxçê Îremê.

Siyabend û birayê xwe Qeregêtiran êdî herdu jî bi jin bûn û her yekê bûbû sermiyanek, êdî çavên wan li çêkirina zarûkan bû ku bibin bav, bibin xwedîzuryet û nifşeke nû bigehînin civata xwe. Lê ew dem hêj bo wan destpêk bû ku ketibûn wê jiyana xweş a rindik. Lewra ji bo wê ramana dawî ku dixwestin bigîjinê, hêj demeke dirêj li pêşiya wan hebû, diviya ew bi jiyanê re timî şer bikin û xwe li hember tewrên zor ên hişk biparêzin.

Herdu şêreçêlên Silîvî di piraniya zemanê xwe de li Sipanê Xelatê nêçîr dikirin û wan ew herdu çavxezalên xwe bi goştê karxezalan xwedî dikirin. Ha wisa ew di rojên vala de sibehê radibûn qahweke tahl vedixwarin û li hespên xwe siwar dibûn diçûn nêçîrê, heta bi danê nîvro vedigeriyan dihatin malê. Dema ew ji nêçîrê dihatin Xecê û Perîzadeyê diçûn pêşiya herdu şêrên xwe û wan hemêz dikirin, nêçîra ku girtibûn ji destên wan digirtin û diçûn li binê konê xwe rûdiniştin. Di vegera ji nêçîrê de Perîzadeyê dîsa ji wan re qahweke tahl çêdikir, piştre jî wê û Xecê goşt dibiraştin, hin caran tenik dibirrîn û li ser sêlê diqelandin, datanîn ber malxweyên xwe. Yekcara jî Xecê ji wan re qelîsêl çêdikir, sîrmastikê bera ser dida û her

Institut kurde de Paris

çar li ber wê kaniya şêrîn rûdiniştin û diketin ser bi nanê sêlê re dixwarin. Çiqas xwarin dixwarin, çaxê tasek ava Kanîşêrînê di ser re vedixwarin, pêre pêre ew xwarin difirrikî û mîna ku hîç tiştekî nexwaribin dîsa birçî dibûn.

Lawikê Silîvî û birayê xwe bi wî awayî demeke dirêj jiyana li Sîpên bihurandin. Lê êdî hew tebata wan hat û xwestin ku di zivistanan de vegerin welatê xwe yê Silîva û di havînan de jî dîsa herin Sîpanê Xelatê. Ha ew fikr û raman ji Siyabend re bû mîna kulekê û kete ser dilê wî.

Sibeyekê zû herdu bira ji xewê rabûn û dîsa karê nêçîrê kirin. Pêşî wan qahwe vexwarin, hêj rabûn li hespên xwe siwar bûn ku herin. Perîzadeyê got:

- Siyabend. Guhên xwe rind bide min, îro ez ê şîretekê li te bikim!

- Fermo, bêje!

- Ev çiyayê Sîpên devereke pir asê ye û gelek jî bi teşqele ye; hem xweş e hem ne xweş e, hem bi bext e hem jî bê bext e. Binêr, min ji te pirtir li vi çiyayî keleştî kiriye û lê geriyame. Ez qul bi qul Sîpên dinasim. Ha ew riya ku di wî berwarê li jêr re dibihure, gelekî sik e û bêyom e. Îcar tu hîç nekeve ser wê rê û bi wî alî ve neçe nêçîrê. Wekî din tu bi kîjan alî ve, bi kîjan devera çiyê ve diçî here. Lewra tiştên min bi çavên xwe dîtine, kîjan peyayê ku bi wê riya reş ve çûye siqûmatek hatiye serî û xwe jê nefilitandiye, yan jî nîvmirî vegeriyaye mala xwe.

Siyabend û Qeregêtiran hespên xwe ajotin û çûn nêçîrê. Lê ew şîreta Perîzadeyê mîna ku pir li zora Siyabend çûbû û lê bû qormatî. Îcar Siyabend birayê xwe bi devereke din ve hinart nêçîrê û wî jî berê hespê xwe berjêr da, çû ser wê "Riya Reş" û ajot ku here saxtî bike, ka çi di wê rê de heye. Ew çû, çû û çû ha ku dît serbiser giha ser firîneka zinarekî bilind ku li binê wî deryayeke bê ser û ber heye, li raserê wî jî zinar pir asê ye û tu rê û şeverê pê ve hilnakişin. Siyabend li wir asê ma. Wî ne li xwe datanî ku şûnde vegere û ne jî dikaribû bi pêş ve here. Çavên xwe hey li nêçîrê gerand, lê ji xeynê çivîk û teyrikên avê û teyrên zinaran tiştekî nedît. Piştre ew ket tavila ku ew roj bê nêçîr venegere malê. Dîsa çavên xwe li hawîdor gerand, ha ku dît wa li raserê wî jinek li serê lateke bilind sekinîye û xwe çîp-tazî kiriye, li wî dinêre. Lê ya xaliqo! pirî ku jinik delal û rind e, roja li qatê çaran ji wê pir fihêt dike û hinbihin ruhniya xwe dimiçiqîne ser hevdu. Bi dîtina jinikê re hiş û aqil ji serê Siyabend firiyan, hema ziloq bû û lê nerî, xwe bi xwe got: Ez pepûk û evdalê dinyê me. Ev ji Xecê delaltir jî hîna li dinê jin hene? Îcar ka ez ê çewa karibim xwe bigehînim cem wê?

Tu nabêjî ew roj Têlîzeyneba pismama Mistoyê mezinê Xanê Lewenda bi tena serê xwe derketibû seyranê û bi zinaran ve hilkişiyabû, xwe gihandibû ser wê lata bilind û li ruyê Gola Wanê temaşe dikir.

Institut kurde de Paris

Îcar dema ku Siyabend ji jor ve berjêr dibû, wê ew dîtibû û çavên xwe lê nitirandibûn. Ji bo ku Siyabend jî sing û berê gewre bibîne, xwe tazî kiribû û qaşo xwe dida ber tavê.

Siyabend xwest ku here cem keçikê, lê geriya negeriya bi ser riyekê ve nebû û nikaribû hespê xwe li wir bêxwedî jî bihêle û bi zinarana ve hilkişe here jor. Ha wisa Siyabend li keçikê nerî, keçikê li Siyabend nerî. Ji kul û kovana wê re dilê Siyabend serobin bû. Ewçax pêre pêre bayê evîneke nû li Siyabend xist, kela dilê wî rabû, Gola Wanê li ber wî bû mîna tasek av, çiyayê Sîpên li ber çavên wî bû mîna golikekî, û di nava xwe de şewitî. Piştî demeke ne dirêj ku ew ji dîtina riyeke bo çûna cem keçikê bêhêvî ma, gazî kir:

- Haaa keçika li ser wî zinarî! Navê te çi ye, lêêê?

- Têlîzeyneb.

Erê Têlîzeynebê û ne keçeke din. Êdî Siyabend ji xeberdanê ket, jê hew tişt pirsîn û çavên xwe dîsa gerandin da şeveriyekê bibîne here cem wê. Lê di wan zinaran de tu rê nebûn, tenê pêplûkên şûna simên asik û xezalan hebûn. Yan jî ew xerîbê wir bû û tu rê nedinasîn. Her ku çû evîna Siyabend keliya, dilê wî şewitî û hew xwe ragirt, diviya ku biçûna cem keçikê. Wê hingê eger çi dibû bila bibûna, hîç ne xem û kedera Siyabend bû. Wî tu pixav jî nedikir, navê tirsê lê nebûbû mêvan û xwediyê hespekî bêhempa û şûrekî navdar bû.

Kalê Pîr li kelekela evîna Siyabend a ji Têlîzeynebê re guhdarî dikir; didît ku wa dîsa moçkên Siyabend rabûne, demarên eniya wî hêşîn bûne, bijangên wî tîk hilbûn û xwîn daweribiye herdu çavên wî. Ji Siyabend re tirada hespê nebû, qada şûr hîç nebû; di ser re zinar bûn û di bin re jî Gola Wanê bû. Wî rind dizanibû ku qada evînê ne ya şer û şûr e. Îcar çaxê ku ew ji çûna cem Têlîzeynebê bêhêvî ma, heta ku jê hat dengê xwe bilind kir û qêriya:

*Hêêê*
*Siyabend ba dikê*
*Lê lê Têlîzeyneba li nîvê wî zinarîîî*
*Way Xwedê hebîna, wî ezo*
*Ezî li Deybilqiran siwar im*
*Di bin min re bûye deryayêêê*
*Lê tu rabe qirara devê xwe bi min de*
*W`ez ê te li qerpûzê zînê Deybilqiran bişidînim*
*W`ez ê vê sibê te bibim ji nefsa canê xwe re*
*Hooo yoyoyo yoy.*

Erê rast e Têlîzeynebê bi destgirtî bû û bûbû nîvmehrbirya xelkê. Lê destgirtiyê wê ne bi dilê wê bû û bi darê zorê dest danîbû ser. Ji ber ku keçik ne bav, ne dê û ne jî pismamekî din yê nêz hebûn.Tenê Delû Mistoyê pismamê wê yê mezinê keleşan hebû û wî ji xwe re wê dihefidan, ta ku mezin bibe û were ber nîr.

Institut kurde de Paris

Delû Misto peyayekî ji nava xwe razî, fêrisekî bi nav û deng û mezinê çil keleşan bû. Li herêmê her kesî xwe jê diparast ku ew xirabiyekê bi wan neke û kesî riya xwe lê nedidît. Karê Misto tim xirabî, şêlandin û talan bû. Ew hertim diçû nava Faris û Ereban û li ser riyan digeriya, hem diziya wan dikir hem jî di riyan de xelkê dişêland. Lê belê xeyseta wî ya rind ew bû, ku wî bi hemwelatiyên xwe xirabî nedikir. Ha ji ber wê yekê axa û maqûlên herêmê jî zêde bi ser sênca wî ve nediçûn û ew riswa nedikirin.

Ew keça delal a ku bejna wê mînabû tayek rihana li ber devê kaniyan, herçiqasî bi zewaca bi Mistoyê pismamê xwe re razî nedibû jî, lê hin toreyên kevnare wê bêçar hiştibûn ku bi wê yekê razî bibe û situyê xwe li ber çarenûsê dirêj bike. Çimkî çaxê yekî pismam li keçekê dibû vînok, êdî tu kesê din ew keç nedixwestin. Di rastiya meselê de, Têlîzeynebê pir hêvî dikir ku peyayekî bavegîd wê ji xwe re birevîne, lê heta wê rojê jî zilamekî nola Siyabend lê rast nehatibû. Îcar Têlîzeynebê heta wê gavê jî Siyabendê Silîvî nedinasî, nizanibû ew siwar kî ye û ji kur e, tenê dizanibû nêçîrvanek e û ji xwe re li nêçîrê digere, bi şaşî hatiye nava wan lat û zinaran. De îcar ji bo ku tu teşqele bi serê wê ve neyên û ew di nava xelkê de rezîl û riswa nebe, nerazîbûna xwe ji siwarê xerîb re diyar kir û bersîv da, got:

*Keçikê digo:*

*Lo lo siwaro, lawo*
*Tu dengê xwe gelekî bilind meke pir hilneyneee.*
*Tu pismamê min î Misto bi çil keleşa*
*Li Xanê Lewenda îro bi me nehesîneee.*

Ew gotina Têlîzeynebê pir li zora Siyamend çû, gelek pê qehirî û xwe bi xwe got: Li dinê mêr hene ku ez ji wan bitirsim? Ez hisabê zilaman û mêşekê nakim. Ev Misto çi ye û çil keleşên wî bûne çi? Yekî mîna Mihemed Begê ku dewletek li pişta wî bû min ew binerd kir, îcar Mistiko dê rabe tiştekî bi min bike?

Kalê Pîr Siyabend tenê nedihişt, ew ji çav nedikir û timî lê notirvan bû. Lê ew ji Siyabend zêdetir li Xecê difikirî, li kêlikên bira û pismamên wê difikirî û nedixwest ku Siyabend here cem Têlîzeynebê, da hêlîna Xecê wêran nebe û dîrok bi serpêhatiya wî û Xecê şêntir bibe, hem Sîpanê Xelatê jî ewçax di dîrokê de ji xwe re cihekî taybetî digire. Lê dema ku dît agirê evîneke nû Siyabend qermitand, êdî têkil nebû, ew serbest hişt û li pawuka encama meselê ma, ka dê Siyabendê Silîvî çi bike û çi neke. Hingê Siyabend bersîva Têlîzeynebê da:
*Way Siyabend ba dikirê:*
*Lê lê lê lê Têlîzeyneba li nîvê wî zinarî*
*W`ezî Siyabend im*
*Siwarê Deybilqiran im*
*Birê Qeregêtiran im*

*W`ez ê "teht-el terîq"î bêîman im*
*Tu qerara devê xwe bi min de*
*W`ez ê îro te li qerpûzê zînê Deybilqiran bişidînim*
*W`ez ê te bibim ber deriyê Xanê Lewenda*
*Li ber deriyê pismamê te yê Delû Misto bisekinînim*
*Sê denga ba pismamê xwe ke, bê:*
*De rabe pismamo, de rabe*
*Bera ew ne navê li te be*
*Ne seyraniya min î nîvê Sîpên be.*
*Siwarê berriyek din Şehwarê Îro li min derketiye*
*Wele tu çarekê dikî, bike*
*Tu çarakê nakî*
*Taximê sing û berê min ên tevdanê*
*Wê îro min bibî ji nefsa canê xwe re*
*Hooo yooo yooo yo yoy.*

Çaxê Siyabend navê xwe hilda, çewa ku gurmînî bi qeşema Mûradê dikeve wisa gurmîniyek bi qeşema dilê Têlîzeynebê jî ket û bi derbekê tirsa wê ya ji Misto firrikî çû û bevzê wê vebû, dilê wê fireh bû.

Têlîzeynebê hêj di zarûktiya xwe de nav û dengê Siyabend seh kiribû, ku ew palewanekî di ser xwe re ye û peyayên ku li hemberê wî karibin şer bikin hêj ji diya xwe re çênebûne. Îcar piştî ku Siyabend bawerî jî da ku birastî dê wê ji xwe re bibe bike bermalî, kêfa wê pir hat û ttimê xwe gelekî li Siyabend xweş kir. Hem jî wê jidil bawerî anî ku êdî bi hêsanî dê Siyabend karibe wê ji destên Misto xelas bike, rê nîşan da

Institut Kurde de Paris

ku di kur re dikare here cem wê. Siyabend hespê xwe ajot û çû derkete ser wê lata bilind, bi çeplê Têlîzeynebê girtin ew avêt paş xwe û ajot çû, rast berê xwe da Xanê Lewenda. Siyabend çû li ber şkefta Delû Misto sekinî û Têlîzeynebê gazî kir:

- Delû Misto, rabe ser xwe, îro ne roja rûniştinê ye. Ez sêwî bûm, te ez bi zorê kiribûm destgirtiya xwe. Va min ji xwe re mêrekî ji te çêtir dît û pê re dizewicim.

Delû Misto çaxê destgirtiya xwe li paş siwarekî biyanî dît, dinya di çavên wî de tarî bû, hêrsê ew girt û xwîn daweribî herdu çavên wî. Jixwe pirî ku ew ji nava xwe razî bû, pêwîstiya ku ew bi xwe êrêşê bibe Siyabend û Têlîzeyneba xwe jê bistîne nedîr, gazî keleşekî xwe kir:

- Kuro, rabe here şûrekî bavêje stuyê wî siwarê han û dotmama min bîne vir, da ez jî serê wê jê bikim.

Keleşê Delû Misto rabû şûr û mertalê xwe hildan û çû li nêzê Siyabend sekinî. Lê dema Keleşî bala xwe dayê ka çewa kare bi derbekê wî ji ser hespê bîne xwarê, Siyabend awirekî tûj dayê. Bi wê awurê Keleşê gewr mîna ku çav bi rihistîn ketibe tirsiya û bê hemd serê xwe berjêr kir li erdê nerî û çavên wî merisîn, bevzê wî guherî û şûnde reviya çû cem Delû Misto, got:

- Axayê min. Ev siwar, ne ji wan peya ye ku ez

Institut kurde de Paris

şûrekî bavêjim patika stuyê wî. Mirov dibêje, hema qey rihistîn e û hatiye vir. Eger melkemot hebe ev zilam bi xwe ye.

- Kuro, peyakî çewa ye?

- Zilamekî esmer e, kinekî dadewisî ye, hinek jî kose ye; çavgir e, pozberaniyekî kêrr e. Eniya wî mîna ferşekî mezin pehn e û damara mirinê xwe tê de hildavêje. Herdu lêvên wî mîna erdeke bej ji xwînê re qermiçî ne. Hinek wisa mîna ku berê gurrî jî bûbe, kenik di serçavê wî de hene. Navmileke pehn lê ye, ku herdu destên mirov nagehin herdu girmilkên wî. Şûrek di destan de ye, mirov newêre lê binere û jixwe hespê wî hêj jê bi sawtir e jî...

- Bi xwedanê şev û rojan kim ew Siyabendê Silîvî ye û hatiye şerê me. De ka îcar em ê îro çewa xwe ji destên wî xelas bikin?

Delû Misto rabû şûr û mertalê xwe hildan û derket derve, ji dûr ve gazî Siyabend kir:

- Ha siwaro. Xwedêhebîna tu ne Siyabendê Silîvî yî?

- Erê!

- Lawo, şûna Xanê Lewenda bi kevir e û ne cihê şer û qirênan e. Hema bila keçik jî li paş te be û xwe ji min re berde rastê, devera ku hesp lê nelitimin. Ez û tu îro em ê şerekî pir giran bikin. Piştre ka Xwedê dide diya kî ji me.

Institut kurde de Paris

Siyabend siwarê Deybilqiran bû û Têlîzeynebê jî li paş wî bû, hespê xwe berjêr ajot çû li rastekê sekinî. Delû Misto jî li hespê xwe siwar bû û çû şerê wî. Ew herdu palewan bi siwariya hespan çengê hevdu bûn. Qada şer erdeke rast bû û tirada hespan lê xweş dibû. Geh Misto şûr avêt Siyabend, geh jî Siyabend avêt wî. Lê şûrê Misto hey bi aliyê pişta Siyabend ve diçû, bi niyeta ku pêşî Têlîzeynebê bikuje. Siyabend zû niyeta dilê wî ferq kir û Têlîzeynebê ji derban parast. Ha wisa şer di navbera herduyan de domand, yekî zora yê din nebir û çu fersend ji kuştina hevdu re nedîtin. Siyabend xwe bi xwe fikirî: Keçik li paş min e, barê hespê min giran e û ji min re keysa daweşandina Lahorê Qetlê jî xweş nayê, divê em çareyeke din bikin! Gotê:

- Misto. Bi vî hawayî dawiya şerê min û te nayê. Were em bi navê şer bikin. Ewçax kî yê din avêt erdê, bila serê wî jê bike.

- Siyabendo, tu zanî.

Siyabend û Delû Misto ji hespên xwe peya bûn. Misto hespê xwe berda rastê û yê Siyabend jî Têlîzeynebê bi gema wî girt. Li wê navrastê herdu mêrxasan bi nava hev girtin, hevdu birin û anîn.

Delû Misto peyayekî têr û tije bû, gelekî zexm û bi hêz bû, teqla wî ji ya Siyabend girantir bû. Siyabend hêj nû ji riyeke dûr hatibû û pir westa û kas bûbû. Çaxê Siyabend bala xwe dayê ku ew dê wî bavêje

Institut kurde de Paris

erdê, dîsa kela hêrsa wî rabû û nava Misto guvaşt, jê re bû mîna pirtikekî sivik bû, û wî hilda serpişt li nîvê erdê xist. Dema Siyabend şûrê xwe danî ser qirika Misto ku wî pezkî serjê bike, bala xwe dayê ku Têlîzeynebê lê dinêre. Ewçax kuştina heft bira û her şeş pismamên Xecê hatin bîra wî û niyeta xwe ji kuştina Misto guhart:

- Delû Misto. Rabe ez te nakujim, bila tu xatirê dotmama xwe bî.

Delû Misto rabû ser nigan û xwe ji toz û tebarê daweşand, şûrê xwe avêt stuyê xwe, bi gema hespê girt ew destkêş kir û berê xwe da malê çû. Ew bi qederê çend sedan ji Siyabend dûr bû, xwe bi xwe fikirî: Vî zilamî ez rezîl û riswa kirim. De her çi be, Têlîzeynebê bir bir bila li dera han bimîne, lê îcar ez ê çewa karibim serê xwe di nava xelkê de bilin bikim? Eva wele piştî vê yekê mirin ji min re hîn çêtir e! Delû Misto şûnde vegeriya, gazî kir:

- Ha Siyabendo.

- Çi ye?

- Lawo te ez rezîl kirim. Heke îro te min kuştiba, ji min re hîn çêtir bû. Erê her çiqasî doza namûsê wek fîncana jehrê ye û zûbizû nayê daqurtandin, lê pêşniyareke min ji te re heye!

- Bêje.

- Ez divêm ku ez û tu, careke din bi navê şer bikin.

- Fermo,were!

Institut kurde de Paris

Delû Misto li hespê xwe siwar bû û şûnde vegeriya hate cem Siyabend da ku peya bibe û herdû dîsa bi navê rahîjin hev. Lê bi wê beza hespê dema ew giha cem Siyabend şûr daweşandê. Êdî Siyabend çu firset nedît ku xwe ji ber şûrê wî averê bike, hema şûrê xwe kir mîna mertal û da ber şûrê wî. Bi wê derba ji nedî ve şûr ji destê Siyabend pekiya kete erdê. Siyabend xûz bû ku rahije şûrê xwe, Delû Misto lê çerixî û serê wî xiste navbera ranê xwe û zîn, hespê xwe qamçî kir ajot rast berê xwe da Xanê Lewenda û Siyabend jî pê ve çinçilî. Delû Misto çû giha nêzî malan, bala xwe dayê ku his ji Siyabend hatiye birandin, guman kir ku ew fetisî ye gewdê wî bera erdê da. Piştre Misto qederekî xweş li ser laşê Siyabend sekinî, bala xwe dayê herwekî ku ew ji xew şiyar bibe bi xwe ve hat, gotê:

- Siyabendo. Lawo rabe here mala xwe. Nanê mêra li mêra bi deyn e. Carekê te ez kuştim û tu li min bihurî. Lê niha min jî te kuşt û ez li te dibihurim. Lawo wele tu peyakî heyf î û ne yê kuştinê yî. Bila Têlîzeynebê jî li te pîroz be.

Delû Misto hespê xwe ajot çû mala xwe, Siyabend jî rabû şûnde vegeriya çû cem hespê xwe û lê siwar bû,Têlîzeynebê avêt paş xwe û berê xwe da Sîpanê Xelatê çû malê.

Roj êdî li ber avabûnê bû, zeraqiyên tavê xwe ji deşt û newalan vekişandibûn, lê serê Sîpên mîna

Institut kurde de Paris

taceke zêrîn diçirisî û ji hawîdor ve mîna zêrefşanê dihate xuyakirin. Qeregêtiran digel jina xwe û Xecê tev ketibûn heyr û tavila Siyabend û li ber kon sekinî bûn çavnêriya hatina wî dikirin. Çaxê wan dît ku Siyabend wa ji jêr ve tê û jinek jî li paş wî ye, tev ji xwe re şaş man û bi pêrgê wî ve çûn. Dema Siyabend nêz bû, ew û Têlîzeynebê peya bûn û çûn li binê kon rûniştin.

Gava Xecê wê keça delal bi mêrê xwe re dît, tirpîniyek ji serdila wê hilat û xwe bi xwe got: Hebe tune be, ev keç hêwiya min e! Ew peyva di dilê Xecê de rast derket û Têlîzeynebê bû hêwiya wê. Lê hêwîtiya herduyan ne mîna ya hêwiyan bû. Ew ji hevdu re mînabûn du xwişkan û hîç şer û qirên nedikirin. Daxwaza herduyan jî, razîkirina dilê malxweyê wan bû û timî di suxra wî de bûn.

Siyabend ji Têlîzeynebê re konekî cihê vegirt û şevekê li cem wê radiket, şevekê li cem Xecê... Wî, xwedîkirina herdu bermaliyên xwe mîna ya du zarûkan dikir û çu ferq nedixist navbera wan; kincên wan ji hev dikirrîn, zêr û zegerên wan weke hev dikirin û têkiliya bi war re jî eynî wisa...

Siyabend û birayê xwe Qeregêtiran wek berê dîsa di rojên vala de diçûne nêçîrê. Rojekê hêj sibe zû bû herdu derketin çolê, xezalek ji ber wan rabû û Siyabend bi tîrekê ew kuşt. Qeregêtiran cendekê wê anî malê, da pîrek ji firavîna wan re goşt biqelînin. Îcar dema ew hat, bala xwe dayê ku Xecê û Têlîzeynebê

Institut kurde de Paris

qirên dikin. Têlîzeynebê dibêje Xecê: Siyabend eşîra Şikakan bi carekê rûxand; bira û pismamên te hemû kuştin û te bi zorê ji wan sitend ji xwe re anî. Xecê jî dibêje Têlîzeynebê: Pa tu jî destgirtiya pismamê xwe Misto bûyî, Siyabend hat bi zorê te jê stend û ji xwe re anî. Têlîzeynebê dîsa dibêje Xecê: Pismamê min Delû Misto peyayekî hêja û gelek jî mêrxas e. Wî Siyabendê te dîl jî kir, lê gunehê wî pê hat û nekuşt. Rebenê, tu li kêlikên bira û pismamên xwe bifikire, ku heta niha jî tola wan li erdê maye!

Qeregêtiran dema wî dengê Têlîzeynebê bihîzt, hîç dengê xwe nekir. Hema ew li mihîna xwe siwar bû û çû, rast berê xwe da Xanê Lewenda. Dema ew giha nêzî şkefta Delû Misto, keleşekî ji dûr ve wî dît û çû got Misto:

- Axayê min. Wa ye siwarek rast tê vir. Eynî di şûfê Siyabend de ye.

Delû Misto rabû derket derve û nerî, got:

- Ew, birayê Siyabend e. Mîna ku hatiye navbera me û xwe çêdike. Rabin haziriya wî bikin.

Çaxê Qeregêtiran giha cem Delû Misto, bê ku jê re tiştekî bibêje yan pirsekê bike, hema şûr daweşandê û yekderb serê wî ji gewde hilfirand. Piştre ji mihîna xwe peyabû bi herdu guhên wî girt, qoqê wî xist xurcezînê û avêt paş xwe, dîsa li mihîna xwe siwar bû û şûnde vegeriya, çû malê. Li binê kon serê Delû

Institut kurde de Paris

Misto ji xurcezînê derxist û danî ber dotmama wî Têlîzeynebê, got:

- Ez bi rih û giyan ku tu dibêjî: Delû Misto ji Siyabend mêrxastir e! Binêr, ev e ez kêmê Siyabend im û ne hêja me neynûkeke wî jî. Ev e min pismamê te kuşt û serê wî ji te re diyarî anî!

GavaTêlîzeynebê serê pismamê xwe Delû Misto dît, hema rabû çû kêreke kalanî anî, bi herdu destan bi qevda wê girt û serê wê jî danî ser kevçika dilê xwe, xwe bi ser ve berda erdê. Kêr di aliyê piştê re derket û jinik di cih demir.

Piştî mirina wê bîstikekê şûnde, Siyabend ji nêçîrê hat malê. Dît ku wa serê Delû Misto li wir e û termê jina wî ya nû jî li kêlekê dirêjkirî ye. Ji birayê xwe pirsî:

- Ev çi mesele ye?

- Vê sibê dema ez hatim malê, min dît ku wa Xecê û Têlîzeynebê şer dikin. Têlîzeynebê tan û niçan dide Xecê, dibêje: "Siyabend her heft bira û şeş pismamên te kuştin. Lê pismamê min Delû Misto ji Siyabend fêristir e û dikaribû wî bikuşta jî lê nekuşt." Wele êdî min hew semax kir, hema ez rabûm çûm Xanê Lewenda, min Misto kuşt û serê wî ji Têlîzeynebê re anî vir. Îcar çaxê ew çav bi qoqê pismamê xwe ket, rahişt kêrekê û xwe bi ser ve bera erdê, di cih de xwe kuşt.

Siyabend bi wê bûyerê pir êşiya, gelek hêrs bû û ket rewşeke pir xirab, herdu çavên wî tarî bûn. Wisa

Institut kurde de Paris

lê çêbû heta ku êdê kesî nas nekir; ne birayê xwe nas kir, ne jina xwe û ne jî jinbira xwe... Piştre geh li termê jina xwe nerî, geh jî li qoqê Delû Misto nerî û wisa bêpêjn ma. Lê her ku çû ew hinbihin kete nava xewn û ramanan. Carna jî li xwe û Delû Misto fikirî, şerê xwe û wî anî bîra xwe. Xasma çaxê ku Delû Misto bi siwarî êrîşê wî kiribû û wî şûrê xwe dabû ber şûrê wî da qenim derb lê nekeve, piştre jî ku serê wî xistibû navbera ranê xwe û zîn, hê bêtir hêrseke zêde ew girt. Siyabend hema şûrê xwe bilind kir derbeke hincirî li qoqê Delû Misto xist. Bi lêxistina derbê re Siyabend dît ku keleşekî Misto ji paş ve xwe avête ser û ew hişk zevt kir. Siyabend wî di ser serê xwe re qelabt û şûr avêt situyê wî jî û termê wî li ber qoqê Misto dirêj kir. Dû re Siyabend bala xwe dayê ku wa keleşekî din jî tê ku lê bixe, hema şûr hilda û êrîşê wî kir. Lê ew keleş gelekî sivik bû û zû xwe ji ber çavên Siyabend wenda kir, qenim nehişt ku toza nigên wî jî hilde. Siyabend li pey çû, lê ew geriya negeriya keleş nedît û şûnde vegeriya çû dîsa li ser terman sekinî.

Di wê navê de qederek bihurî, hinbihin hêrsa Siyabend damiçiqî, ruhnî bi çavên wî ve hat û li xwe varqilî. Îcar çi bibîne baş e? Wey malikê tu xirav bî, çewa ku xirab jî bûbû! Wî dît ku wa birayê wî Qeregêtiran û jinbira wî Perîzadeyê herdu bê serî li rex qoqê Delû Misto dirêjkirî ne û Xecê jî ne li wir e. Ewçax hêj nû Siyabend li xwe varqilî ku ew ketibû hêrsa jihişçûnê û mala xwe xirab kiriye. Piştre xwe bi

Institut kurde de Paris

xwe got: Ev min çi kir, çi nekir, min mala xwe bi destên xwe mîrat kir û agirê kulê berda warê xwe. Hey felekê dîsa te dest bi dijminatiya min kir û mala min wêran kir, agir berdayê!..

Siyabend şûr ji destê xwe avêt erdê û rûnişt ji xwe re ponijî. Ha wisa qederek bihurî Xecê ji dûr ve dît ku wa hêrsa Siyabend daniye û şûr jî ne di destan de ye, rabû çû cem:

- Siyabendo. Hey malikxirabo! Ev te çi kir?

- Xecê hiş be, felekê dîsa mala min xirab kir. Rabe, ez û tu ji vir herin. Ev war bêyom e, li me nayê!

Siyabend ji rihê xwe pir xeyidî bû û ji felekê jî... Hema rabû û berê xwe çolebir bi jora çiyê ve da û çû, çû lê nizanibû ku diçe kur. Bevzê wî pir xirab bû, çavên wî sor bûbûn û mîna ku ew pir westiya be jî ha bi vir ve, ha bi wir ve dişewişî. Xecê jî bi gema hespê wî girt, şûrê wî avêt situyê xwe, tîr û kevanê wî hildan û da dû wî. Devera ku Siyabend tê re diçû rê nebû, ne şeverê bû, tev kevir û taht, dar û devî bûn. Cihekî wisa bêteşe bû ku bi zorê mirov dikaribûn tê re biçûna. Xecê jî li dû Siyabend çû û hespê wî li pey xwe kişand. Wisa qederek bihurî ne Siyabend pê re peyivî û ne jî çu deng ji Xecê derket. Bi zor û heft belayê xwe gihandin ser zinarekî bilind, hêj nû Siyabend li paş xwe zivirî, got:

- Xecê, xewa min pir tê. Ez ê li vir bîstikekê ji xwe re rakevim. Lê tu hay ji Deybilqiran hebe.

Institut kurde de Paris

- Siyabendê min. Rakeve. Mîna ku tu bêxew mayî, reng û rû li te nemane.

Siyabend di şûna xwe de kumişî erdê û xwe li ser tahtê hişk vezeland, serê xwe danî ser milekî xwe û di xew re çû. Xecê jî hespê wî bi darekê ve girêda û çû li kêleka wî rûnişt, serê wî rakir danî ser çoka xwe.

Ewçax Siyabend di xew re çûbû, yan jî xirmaş bûbû û hîç hay ji xwe nebû, dema ku Xecê serê wî datanî ser çoka xwe. Ha wilo wî li xewa xwe domand, Xecê jî li serçavê wî nerî û ji xwe re sêwirî...

Xecê dakete nava dinyake din, ew dinya ku ji xeyal û ramanan mişt bûbû û li demçûya xwe fikirî. Îcar wê hingê ew roja pêşî ku Siyabend û birayê xwe çûbûn mala birayên wê, hat bîra Xecê. Hinbihin ramanên wê li pey hev çûn û ji hevdu tîştîşî bûn û qelişîn, geh berjêr çûn û hevraz daketin, geh jî berjor çûn û li hevdu bagirrîn. Carek ji nedî ve kuştina birayên Xecê û ya her şeş pismamên wê hatin bîrê û li wan fikirî. Jixwe dema wê ew zinarên bilind yên li jora Sîpên dîtin, her yekê jê re bû mîna kêlika gora yek ji wan miriyan û berê xwe da wan temaşe kir. Ewçax du êşan Xecê teyişandin. Yek, êşa evîna wê û Siyabend. Ya din, êşa kuştina bira û bismamên wê. Zêdetir tîna agirê qolinca derdan kete hinavê Xecê. Hinbihin kezeba wê ariya, dilê wê êşiya û ji herdu çavên kesper hêsirên şor bi ser hinarokên gulgûnî ve

Institut kurde de Paris

daweribîn.

Xecê hêj di nava wan êş û kederan de li zinaran temaşe dikir, dît ku heft beranên kûvî li dû mihekê digerin. Lê di nava wan de beranekî kose yê sûsik hebû, bi qiloçan li wan şeşên din dixist heta ku ew ji mihê dûr dikirin û vedigeriya cem, mîna ku wê hemêz bike xwe lê dialifand. Wisa bala Xecê kete ser wî beranê kose û hema ziloq bû lê nerî, geh li serçavê Siyabend nerî û li xwe nerî, dîsa li mala bavê xwe fikirîli û xwe bi xwe got: Ha Xwedê wekîl e ew beranê pesik î kose eynî mînaye Siyabend û ew şeş beranên ku ji berê direvin jî mînane wan şeş pismamên min... Binêr, ewê kose çi tîne serê wan! Kela dilê Xecê hîn zêdetir rabû û lehiya fûrê lê xist, hûrik-hûrik di ber xwe de giriya. Ewçax dilopek ji hêsirên çavên wê riya xwe şaş kir û kete ser ruyê Siyabend. Bi wê dilopê Siyabend ji xew veciniqî û çengê ser xwe bû, dît ku wa Xecê digirî. Jê pirsî:

- Xecê, çima tu digrî?

- Hîç!

- Xecê, ez bi Xwedanê şev û rojan dikim heke tu sedemê girîna xwe nebêjî ez ê Lahor li te jî bikişînim!

Xecê nediviya şerê beranê kose û yê wan şeş beranên revoke bigota Siyabend. Lê tirsa Lahor ew bêgav hişt ku bibêje, bi devekî devliken:

- Ka li wê miha bi fahl û her heft beranên li dû binêre! Beranekî kose yê qiloçên wî dozdeşax di nava

Institut kurde de Paris

wan de ye, nahêle ku ew şeş beranên din bigîjin mîyê.

Siyabend xwe bi xwe fikirî, gelek tişt ji girîna Xecê derxistin û di dilê xwe de sêwirand ku: Dêmek ew şeş beran pismamên Xecê ne û yê kose jî ez im! Hema Siyabend rabû ser nigan, tîr û kevanê xwe hildan û berê xwe da Xecê:

- Ez ê herim wî beranê kose bikujim û cendekê wî ji te re bînim vir.

- Siyabend. Neçe, kuro neçe. Ez hêvî dikim tu neçî. Bila ew jî evîna xwe li vê bilindahiya Sîpên bike.

Siyabend guh li Xecê nekir û da pey pezkûviyan. Lê dema kûviyan ew dît, jê tirsiyan û hevraz reviyan, çûn bi zinaran ve hilkişiyane jor. Siyabend jî li dû wan çû, çû heta xwe gihande nêzê wî beranê kose û tîrek avêtê, ew birîndar kir. Berên bi wê birîndariya xwe da nîvê zinarekî bilindû pê ve hilkişiya, Siyabend jî da dû wî û bi zinêr ve hilkişiya, çû giha ser fîrîneka herî bilind, dît ku wa beranê wî li erdê dirêj bûye. Siyabend kêra xwe derxist û danî ser qirikê ku serjê bike, beranê malikmîrat her çar nigên xwe kirin gilok û bi zirp li textikê singa wî xistin. Siyabend ji ber wê derbê pekiya û çend caran qotlanî bû, teqle avêtin û çû, çû di zinêr de werbû, li ser deviyeke benikan ket erdê û kelemekî tûj li aliyê pişta wî ket di singa wî re

Institut kurde de Paris

avêt der.

Siyabend ma di wî halê xwe yê xirab de; ne hewar hebû ne gazî... Ne jî dikaribû wê kelemê ji pişta xwe derxine. Wê hingê ew zilamê nîvê şevê hat bîra Siyabend, ku gotibû "Tu bi destên mirovan nayê kuştin!" Ew xwe bi xwe fikirî, got: Nexwe madem ez bi destên mirovan nayême kuştin, hebe tune be mirina min bi vê kelemê ye.

Siyabend ha wisa ma di wî halê xwe de û Xecê jî çavrêniya hatina wî kir. Lê ne Siyabend vegeriya bi ser Xecê ve hat, ne jî pêjna wî... Xecê li pawuka wî ma nema ku çu deng jê derneket, hew tebat kir û rabû da ser şopê bi telbe ve çû. Hema carekê ew li wan dilopên xwîna beranê kûvî ku ketibûne ser tahtan rast hat û da ser bi jor ve çû, çû li zinarekî bilind ma asê. Lê êdî hesp nikaribû li dû wê biçûna. Xecê ew bi darekê ve girêda û bi zinêr ve hilkişa bi zor û heft belan çû xwe gihande jor, dît ku wa beran li erdê serjêkirî ye û Siyabend ne li cem e. Xecê li wan deran geriya vir de çû geriya û wir de çû, lê Siyabendê xwe nedît. Piştre qêriya û gazî kir. Carekê bala xwe dayê ku wa dengê nûzîna nalînekê ji kûr ve tê. Xecê hinekî xwe berjêr berda, çû ew der seh kirin. Dît ku Siyabend li biniya zinêr ketiye ser deviyekê û kelemek li pişta wî ketiye di singa wî re avêtiye der. Wê hingê pêre pêre diyan Xecê hilweşiya, Sipanê Xelatê li dora serê wê çû-hat, çokquraftî bû, hema di şûna xwe de kumişî û ji devgerê ket.

Kalê Pîr ê şahidê dîrokê li jora sertara Sîpanê Xelatê rûniştibû û temaşe li bûyera Siyabend dikir, carna jî li Xecê dinerî. Ew li wê bilindayiyê notirvaniya wan dikir û li pawuka encama bûyerê sekinî bû, ka dê çi jê derkeve? Yezdano bêlome bî! Li herêmeke xerîb û piştî hewqas teşqele û serpêhatiyên bi sosret ku herdu canikan xêrê ne ji xwe dîtin ne jî ji jiyana li Sîpên dîtin. Piştre jî Siyabend bû goriya beranekî kose û çû heta ku di zinêr de werbû. Hem jî çi terabûn! Kelemek li nîvê pişta wî ket û di singa wî re avête der.

Piştî demeke dirê ew nazika ciwan a nazenîn bêdengiya xwe şikand, devê xwe vekir û dîsa kir hewar û gazî, li Siyabend nerî. Lê riyeke ku wê xwe bigehanda cem Siyabend nebû. Wî zinarê bilind mîna ku bi Nemrûd û Brahîm Xelîl sond xwaribe, riyeke hêsan ramî Xecê nedida. Çara Xecê hew tenê nihêrtina li Siyabend mabû. Ew li ser zinêr û Siyabend li binê zinêr, herdu li hev nerîn, mîna ku hêj nû hev dîtibin çavên xwe ji êkdu neniqandin. Lê mixabin zinarê xopan gelekî bilind, şayîk û mîna taqê asîman hilû bû. Xecê rabû xwe bi ser zinêr ve kûz kir û heta ku deng jê derket qêriya, gazî Siyabend kir:

*Aaay ay yayayaaay*
*Siyabendooo, looo!*
*Way Xecê digo:*
*Lo lo Siyabendo*
*De min dewran bi dû tê*
*Hooo yoyoyo yoy!*

Institut kurde de Paris

*Aaay yay yay*
*Siyabendooo, looo!*
*Lo lo Siyabendo*
*W`ez ê bi serê Sîpanê Xelatê*
*Bi Xanê Leterê*
*Bi raserî behra Wanê ketim*
*Lo lo Siyabendo*
*Xwezî vê êvarê min tu nedîta di wî halîîî, lo*
*Lo lo Siyabendo*
*Feleka malikxerab derewîn e*
*Li serê tu kesî nadomîne*
*Û mi go: qey çend sala wê Siyabendê Silîvî*
*siwarê Deybilqiran*
*nêçîrvanê Soxandaxiyê*
*ji mi ra biba malxwe*
*w`ez ê ji ter bibama bermalî.*
*W`ez iiim, lo*
*Weyla li min cîrana gur û hirça!*
*Bê, taliya talî bêsebeba...*
*siwarê Deybilqiran...*
*yoyoyooo, yooo.*

Laşê Siyabend hêj germ bû û giyan tê de hebû, hilma wî hêdîka diçû û dihat, dengê Xecê xweş dibihîzt, lê ew ji ber birîna xwe dinaliya, xwîn û xirar di devê wî re avêtibûn. Xecê nalenala wî dibihîzt, lê nikaribû xwe bigehînê û birîna wî bikewîne.

Birîna Siyabend kûr bû, gelek xedar bû, tenê wî bi

Institut kurde de Paris

birîna xwe dizanibû ku çiqas giran e û derbeke pir dijwar e. Xecê hewqasî pê nizanibû ku bi qîmê derba kelemê cihê xwe girtiye. Lê wê xwe bêhêvî nedikir û umîda rihetkirina birîna Siyabendê xwe dikir. De lê belê Siyabend çaxê têgiha ku Xecê wê gumana pûç dike, xwest ku li ber dilê wê bide û hindik be jî kêfa wê bîne.

Êdî dawiya jiyana Siyabend nêz bû, hinbihin ber bi mirinê ve diçû. Heke ew ji kelemê derbiketa jî, felekê hîç bo jiyandina wî şans nedida.

Siyabend û melkemot li ber hev didan, bi hev re şer dikirin û cirîd diavêtin. Ew dever ne qada şûr û Lahor bû, ne ya rim û mertal bû. Lewra rihistîn bi çek bû û lawikê Silîvî destevala bû. Aliyekî dergeyê gorê li ber Siyabend hatibû vekirin û nikaribû şûnde vegere. Dîsa ew li xewna nîvê şevê fikirî û Xocê Xizir anî bîra xwe. Dû re mîna ku xatirê dawîn ji Xecê bixwaze, gazî kir:

*Aaay ay yayayaaay*
*Û Siyabend ba dikir:*
*Lê lê Xecê, tu yê bes bigirî vê êvarê*
*Xwedê hebîna li halê min û xwe herduya*
*îro bi delalî, bi delalîîî, lê.*
*Û lê lê keleşa min ê*
*tu yê hêsira ji qawarê çavê reş î belek bike xalîîî.*
*Qadirê zilcelal*
*Wehd-el emînê bi tenê*
*îro emrê min kiriye bi vî halîîî...*

Institut kurde de Paris

Piştî wê gotina Siyabend êdî çiqas umîn û guman ku bi Xecê re hebûn hemû tefiyan, pûç bûn û bi avê ve çûn. Hinga wê kezîzerê rind fam kir ku birîna Siyabend pir xedar e û ew hîç nikare xwe ji kelemê derxîne. Xecê dîsa dev pê kir û qêriya, hewar kir, kaliya û alîkarî xwest. Lê mixabin li wê bilindayiya Sîpên ne kes hebûn ku bi hewara wê ve werin, ne jî li nêz avecî hebûn ku hinek dengê wê seh bikin. Îcar pêtiya agirê dilê Xecê geh bilind bû geh daket, carna nizm dibû û hevraz çû. Di wê naçariyê de Xecê her tişê xwe wenda kir û dîsa qêriya, gazî Siyabend kir:

- Lo lo Siyabendo... Xewn û ramana mino... Nişa rihê mino... Giyana dilê mino!.. Evîna me hêj nû gihabû xweşiyê û em ji hev têr nebûn. Lê feleka malikxirab ez tenê hiştim li ser vî çiyayê xir û xalî. Siyabend, ez ê bi tena serê xwe li vir çi bikim, ku tu ne bi min re bî? Ma ez ê cîrantî bi gur û hirçan re bikim?

Xecê bîstikek sekinî û herdu guhên xwe berjêr ttapêl kirin, li pawuka bersîva Siyabend ma. Lê ew ma nema çu deng ji Siyabend derneket. Carekê nerî ku wa serê Siyabend leq bûye û ji rih ve jî çûye. Hema ew rabû çû ser pozê zinar ê herî bilind, şerpa xwe li çavên xwe girêda û xwe avête ser wê deviya kambax. Bi avêtinê re dengvedêriya Xecê weha dilorand:

- Siyabeeend! Ez divên li gorê jî bi te re bim...

Institut kurde de Paris

Berî ku dawî li pirtûkê bê, pêwîstiya vê agahdariya han jî dibînim ku ji xwendevanan re bidim zanîn: Li ser riya ku ji Sêrtê diçe Dihê, berî ku meriv bigîje pira li ser Çemê Botan, li kêleka rastê û di kutaneka Çiyayê Reşan de zinarekî pir bilind heye, jê re *Lata Mendik* herweha *Tahtê Mendik* jî tê gotin. Îcar li gor hin riwayetan; Siyabendê Silîvî, ne li Çiyayê Sîpên lê li wir tera bûye û mirye.

Li wê Herêmê navê Siyabend *Mendo*yê Silîvî ye. Gava ku Mendo tîr li pezeke kûvî xistiye, pez ji ber wî reviyaye û çûye wê Latê ketiye beltekê* û tê de xwe veşartiye, Mendo jî li pey çûye wir. Îcar gava ku wî peza xwe serjê kiriye, pezê xwe veweşandiye û Mendo ji berê ferqiziye û tera bûye li ser pîjekî benikan** ketiye. Piştî ku Xecê hatiye ser Latê û li jêr Mendo dîtiye ku wa tera bûye, wê jî xwe tê re werkiirye û miriye.

Li binê wê Beltê du tilmên axê hene ku her yekê mîna girkokekî piçûk bilind in, lê yek ji yekî bilindtir e. Îcar li gorî gotinan; berî terabûna Mendo û Xecê, ew herdu tilm ji kinarê Xwedê ve û ji axa nerm hatine bilindkirin, da ew tera bibin jî qenebe li ser wan bikevin û tişt bi wan nebe.

Li nîzî Lata Mendik xaneke kevn bi navê Xana Reş heye. Ew Xan, şkefteke pir kevn e û du beş in; yek cihê raketina mirovan e û yek jî cihê hewya heywanan e. Li gorî gotinan; gava ku Mendo Xecê revandiye, wê aniye xistiye wê Xanê.

---

** Belt, di lat û zinaran de zêdayiya jê bi der ve ku dirêj dibe. Herweha jê re dik jî tê gotin.*
*** Ben, dara benî ku jê re bitim jî tê gotin.*

Institut kurde de Paris

Pirtûkên Çapbûyî:




Institut kurde de Paris

1) Xwençe Cild I, 2) Xwençe Cild II, 3) Xwençe Cild III, 4) Xwençe Cild IV, 5) Xwençe Cild V, 6) Nimûne Ji Gencîneya Çanda Qedexekirî, 7) Işkencede 178 Gün,

Pirtûkên klasîk ên wergera ji tîpên erebî bi latênî û çapbûyî:




Institut kurde de Paris

1) Dîwana Melayê Cizîrî, 2) Nûbihara Ehmedê Xanî, 3) Mewlûda Kurmancî ya Melê Bateyî, 4) Şerha Eqîdeya Ehmedê Xanî ya Mele Ehmedê Qoxî, 5) Sirmehşera Feqe Reşîdê Hekarî, 6) Nehc-ul Enama Mele Xelîlê Sêrtî, 7) Dîwana Pertew Begê Hekarî, 8) Rewdneîma Şêx Evdirehmanê Axtepî, 9) Dîwana Şêx Evdirehmanê Axtepî, 10) Mîrsad-ul Etfala Şêx Mihemed Kerbela, 11) Iqdê Durfama Şêx Eskerî, 12) Herdubat, Mewlûda Mele Zahidê Diyarbekrî, 13) Leyl û Mecnûna Şêx Mihemed Can.

Institut kurde de Paris

**Xecê:**

...

*Siyabendooo, looo, lo lo Siyabendo*
*W`ez ê bi serê Sîpanê Xelatê*
*Bi Xanê Leterê*
*Bi raserî Behra Wanê ketim*
*Lo lo Siyabendo*
*Xwezî vê êvarê min tu nedîta di wî halîîî, lo.*
*Lo lo Siyabendo*
*Feleka malikxerab derewîn e*
*Li serê tu kesî nadomîne*
*Û mi go: qey çend sala wê Siyabendê Silîvî*
*siwarê Deybilqiran*
*nêçîrvanê Soxandaxiyê*
*ji mi ra biba malxwe, w`ez ê ji ter bibama bermalî.*
*W`ez iiim, lo*
*Weyla li min cîrana gur û hirça!*

....

**Siyabend:**

*Lê lê Xecê, tu yê bes bigirî vê êvarê*
*Xwedê hebîna li halê min û xwe herduya*
*îro bi delalî, bi delalîî, lê.*
*Û lê lê keleşa min ê*
*tu yê hêsira ji qawarê çavê reş î belek bike xalîîî.*
*Qadirê zilcelal*
*Wehd-el emînê bi tenê*
*îro emrê min kiriye bi vî halîîî...*

Institut kurde de Paris

BIBLIOTHEQUE INSTITUT KURDE de PARIS

**PENCÎNAR**

**WEŞANXANEYA ÇANDA KURDÎ**

**Stockholm 1992**

**ISBN 91 630 1222 7**